

K.T.

Zanîngeha Mardîn Artuklûyê

Enstîtuya Zimanên Zindî yê li Tîrkiyeyê

Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî

Teza Lîsansa Bilind

MEWLÛDA MELA HUSEYNÊ BATEYÎ

(Metn û Lêkolîn)

ZÎVER ÎLHAN

10711010

Şêwirmend

DOÇ DR. ABDURRAHMAN ADAK

Mêrdîn 2013

K.T.

Zanîngeha Mardîn Artuklûyê

Enstîtuya Zimanên Zindî yê li Tîrkiyeyê

Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî

Teza Lîsansa Bilind

MEWLÛDA MELA HUSEYNÊ BATEYÎ

(Metn û Lêkolîn)

ZÎVER ÎLHAN

10711010

Şêwirmend

DOÇ DR. ABDURRAHMAN ADAK

Mêrdîn 2013

JI GERÎNENDEYA ENSTÎTÛYA ZIMANÊN ZINDÎ YÊN LI TIRKIYEYÊ RE

Ev xebat ji aliyê jûriya me ve di beşa Beşezanista Bingehîna Ziman û Çanda Kurdî de weke teza lîsansa bilind hatiye pejirandin.

(îmze)

Serok :.....

(Unvana Akademîk, Nav- Paşnav)

(îmze)

Endam :.....

(Unvana Akademîk, Nav- Paşnav)

(îmze)

Endam :.....

(Unvana Akademîk, Nav- Paşnav)

(îmze)

Endam :.....

(Unvana Akademîk, Nav- Paşnav)

(îmze)

Endam :.....

(Unvana Akademîk, Nav- Paşnav)

Pesendkirin

Ez pesend dikim ku îmzeyên jorîn yê endamên perwerdeyê yê navborî ne.

Îmze

.....

Unvana Akademîk, Nav- Paşnav

Gerîndeyê Enstîtûyê

(MOR)

KURTE
MEWLÛDA MELA HUSEYNÊ BATEYÎ
Ziver ÎLHAN

Mela Huseynê Bateyî, bi eslê xwe ji gundê Bateyê ye ku nasnava xwe ya edebî jî ji vir stendiye. Bate îro ji aliyê îdarî ve li ser navçeya Elkê ye, Elkê jî li ser wîlayeta Şîrnexê ye. Bateyî, ji helbestvanên herî girîng ê Edebiyata Kurdî ya Klasîk e. Li ser navê wî yê birastî, li ser jidayikbûna wî û sedsala ku tê de jiyaye, lêkolînan gihîştine encamên ji hev cûda. Li gorî vê xebatê, navê wî Mela Huseynê Bateyî ye û di sedsalên XVII û XVIIIan de jiyaye.

Bateyî kesayetekî xwedî berhem e. Di diroka edebiyata kurdî de helbestvanê ku cara yekem mewlûd nivîsiye ew e. Mewlûda ku helbestvan nivîsiye, li gorî kevneşopiya nivîsîna mewlûdan bi şîklê nezma mesnewiyê hatiye nivîsandin. Di berhemê de risteyên ku pesnê Xwedê û Hz Muhemed didin hene û jidayikbûna Muhemed (saw), zarokatiya wî bi awayekî mucîzewî tê vegotin. Berhema wî ya bi navê “Hemaîl” bêtir ji dua, ayetên Qurana pîroz û peyvên parastina sihrê pêk tê. Di derkenarên vê berhema ku bi erebî û farisî hatiye nivîsandin de, bi kurdî jî hinek agahî hene. Di kitêbên dîroka edebiyatê de menzûmeya gelerî ya bi navê “Zembîlfiroş”ê bi bal Bateyî ve tê nîsbetkirin; lê heta niha nusxeyeke vê menzûmeyê ku mexlasa Bateyî li ser be, ji aliyê me ve nehatiye dîtin. Helbestên wî yên belawela ku li deverên cuda bûn, di salên dawîn de hatine civandin. Ji aliyê naverok û temayê ve hin ji wan helbestan di çarçoveya munacaat hin ji wana di çarçoveya ne‘et û hin ji wana jî di çarçoveya evîna beşerî de hatine nivîsandin.

Di vê tezê de bi taybetî li pey şopa vê pirsê lêgerîn çêbû: Gelo cudahiya çap û nusxeyên mewlûda Bateyî ji kîjan aliyên ve ye? Ji bo bersiva vê pirsê jî edîsyon krîtîka metnê Mewlûdê hat kirin. Di vê “edîsyon krîtîk” a mewlûda Bateyî de di derheqê 22 nusxeyên mewlûda Bateyî de agahî hat dayîn û ji van nusxeyan bi taybetî yên guncan hatin berawirdkirin. Herweha peyvên ku xweş nayên xwendin û tu wateya wan nîne di çarçoveya restorasyona metnê de hatin serastkirin. Di encamê de derket meydanê ku çap û nusxeyên Mewlûdê ji aliyê hejmara rûpelan, nivîsandina peyvan, sernivîs, xaneya selewatan, beşa “eş-şelatu ‘aleyk es-selamu ‘aleyk” û beşa ku xaneyên “Merheba” yê ve ji hev cûda ne; lê ji aliyê naverokê ve ji bilî nusxeyên ku rûpelên wan kêr in, hemû nusxe weke hev in.

Di mewlûda Bateyî de gelek peyvên biyanî û herêmî hene ku ji bo ku wateya wan derkeve meydanê di dawiya tezê de beşek bi navê “Ferhenga Mewlûdê” hat amadekirin.

**Peyvên Sereke: Mela Huseynê Bateyî, Mewlûd, Nusxe, Destxet, Edîsyon
Kritîk**

ÖZET
MOLLA HÜSEYİN BATEYÎ'NİN MEVLİDİ
Ziver İLHAN

Molla Hüseyin Bateyî, aslen Bate köyünden olup edebî mahlasını da buradan almıştır. Bugün Bate köyü idari olarak Şırnak'ın Beytüşşebab ilçesine bağlıdır. Bateyî, Klasik Kürt Edebiyatının en önemli şairlerindendir. Gerçek adı, doğumu ve yaşadığı yüzyıl hakkında araştırmacılar farklı sonuçlara varmışlardır. Bu çalışmaya göre; gerçek adı Molla Hüseyin Bateyî olup XVII. ve XVIII. yüzyıllarda yaşamıştır.

Bateyî, eser sahibi bir şahsiyettir. Kürt edebiyatında mevlit yazan ilk şairdir. Şairin yazdığı mevlit, mevlit yazma geleneğine uygun olarak mesnevi nazım şekliyle yazılmıştır. Eserde Allah'ı ve Hz. Muhammed'i öven mısralar olmakla beraber Hz. Muhammed'in doğumu, çocukluğu mucizevî bir şekilde anlatılmıştır. “Hemaîl” adlı kitabı daha çok dua, Kuran-ı Kerim ayetleri ve büyüye karşı korunma ile ilgili sözlerden oluşur. Arapça ve Farsça yazılan bu eserin derkenarlarında Kürtçe açıklamalar vardır. Edebiyat tarihi kitaplarında her ne kadar “Zembîlfiroş” adlı manzume Bateyî'ye nispet edilse de şimdiye kadar üzerinde Bateyî mahlası olan bu manzumenin bir nüshası bizim tarafımızdan tespit edilmedi. Dağınık olarak değişik yerlerde bulunan şiirleri, son yıllarda toplanmıştır. İçerik ve tema açısından bu şiirlerin bazıları münacat bazıları naat türünden olup bazıları da beşeri aşk temalı şiirlerdir.

Bu tezde özellikle şu sorunun izinde araştırma yapıldı : Acaba Molla Bateyi'nin mevlidinin nüsha ve baskıları arasında hangi açılardan fark vardır? Bu sorunun cevabı için mevlid metninin edisyon kritiği yapıldı. Bu “Edisyon Kritik” çalışmasında Bateyî mevlidinin 22 nüshası hakkında bilgi verildi ve bunlardan özellikle uygun olanlar karşılaştırıldı. Bu şekilde hiçbir anlamı olmayan ve iyi okunmayan sözcükler metin restorasyonu çerçevesinde düzeltildi. Sonuçta ortaya çıktı ki Mevlidin baskı ve nüshaları; sayfa sayıları, sözcüklerin yazımı, başlıklar, salavat beyitleri, “Eş-şelatu ‘aleyk es-selamu ‘aleyk” bölümü ve içinde “Merheba” beyitleri bulunan bölüm açısından birbirinden farklıdır. Fakat eksik sayfaları olan nüshalar hariç, içerik bakımından tüm nüshalar birbirlerine benzemektedirler.

Bateyî'nin mevlidinde birçok yabancı ve bölgesel sözcükler olup bunların anlamının ortaya çıkması için tezin sonunda “Mevlid Sözlüğü” adlı bir bölüm hazırlandı.

Anahtar Sözcükler: Molla Hüseyin Bateyî, Mevlid, Nüsha, El Yazması, Edisyon Kritik

SUMMARY
THE MEWLÛD OF MOLLAH HUSEYN BATEYÎ
Ziver İLHAN

Mollah Huseyn Bateyî originally from the village of Batê and he has taken his pen name from there. Today Batê village, administratively Beytüşşebab depends on the town of Sirnak. Bateyî is one of the most important poet of Classical Kurdish Literature. Researchers have different recults about his real name, birth and lived a century. According to this work; his real name is Molla Huseyin Bateyî, he lived in 17th and 18th centuries.

Bateyî, is the owner of the literary works personality. He is the first mawlûd writer poet in Kurdish literature. The Mawlûd which written by poet, in accordance with mawlûd writting tradition, it has written with shape of poetry masnavî. Although there are verses praising about Allah and Muhammed in this work, Muhammad's birth, his childhood, has been explained in a miraculous way. His book, "Hemaîl" consists of the words of more prayers, Qur'an verses and words which sayings regarding protection against magic trick. This work written in Arabic and Persian and it has Kurdish description on the edges of the page. Although "Zembîlfiroş" poem belongs of Bateyî in the some history of literature, so far a copy of this poem which is with pen name of the Bateyî not detected by us. His poems which as the scattered in various places, concentrated in recent years. Some of these poems in terms of content and theme, are munacaat some of these naat some of them are also human love themed poems.

In this thesis, especially following in the footsteps of the problem, research was done : I wonder what ways there is a difference between copies and prints of Mollah Bateyî's Mawlûd. In this "Critical Edition" was given information about the 22 copies of the Mawlûd of Bateyî. One of them, especially compared to the appropriate ones. In this way, word which doesn't mean anything and doesn't good read, were corrected within the framework of the restoration of the text. As a result appeared, that Mevlid prints and copies; are different in page numbers, spelling of words, titles, Salavat

couplets, section of “Eşşelatü ‘aleyk esselamu ‘aleyk” and “Merheba” But outside pages missing copies of the mewlud, in terms of content of all copies are similar to each other.

There are many foreign and regional words in Mewlûd of Bateyî. A section has been prepared called “Mewlûd Dictionary” at the end of the thesis for their meaning emergence of.

Keywords: Mollah Huseyn Bateyî, Mewlûd, Copy, Manuscript, Edition Critical

NAVEROK

KURTE.....	III
ÖZET.....	V
SUMMARY.....	VII
NAVEROK.....	IX
PÊŞGOTIN.....	XII
KURTEBÊJE.....	XIV
DESTPÊK.....	1
1. Wateya Peyva “Mewlûd” ê.....	1
2. Kurtedîroka Kevneşopiya Mewlûdê....	1
3. Mijarên Naveroka Mewlûdan	2
4. Di Zimanên Curbecur de Mewlûd	2
5. MEWLÛDÊN KURDÎ	
5.1. Mewlûdên Kurmancî	3
5.2. Mewlûdên Kirdkî (Zazakî-Dimilkî)	4
5.3. Mewlûdên Soranî	4

BEŞA YEKEM

JIYAN Ê BERHEMÊN MELA HUSEYNÊ BATEYÎ

1. Jiyana wî	5
1.1. Navê wî.....	5
1.2. Serdema wî	5
1.3. Xwendina wî	8
1.4. Nasnavên wî.....	9
2. Berhemên wî	10
2.1. Mewlûd.....	10
2.2. Hemaîl	11
2.3. Helbestên wî	14
2.4. Zembîlfiroş	16

BEŞA DUYEM

MEWLÛDA MELAYÊ BATEYÎ

1. JI ALIYÊ RUXSARÊ VE MEWLÛDA MELA HUSEYNÊ BATEYÎ

1.1. Tertîba Mewlûdê.....	17
1.2. Kêşa Mewlûdê	17
1.3. Şemaya Qafiyeyên Mewlûdê	19
1.4. Redîf Mewlûdê	20
1.5. Qafiyeyên Mewlûdê	20
1.6. Hunerên Edebî	22
1.7. Zimanê Mewlûdê.....	26
1.7.1. Bandora erebî	26
1.7.2. Bandora farisî	29
1.7.3. Bandora tirkî.....	30

2. DANASÎNA NUSXE Î ÇAPÊN MEWLÛDÊ

2.1. Nusxeyên Destxet

2.1.1. Nusxeya Muhemedê Muksî	31
2.1.2. Nusxeya Millî Kutûpxaneyê	32
2.1.3. Nusxeya Dihokê	34
2.1.4. Nusxeya Mahmud Efendî	35
2.1.5. Nusxeya Diyarbekirê	37
2.1.6. Nusxeya Ortahîsarê	38
2.1.7. Nusxeya Gundê Batê	39

2.2. Çapên Mewlûdê

2.2.1 Çapa Haziq.....	41
2.2.2. Çapa Berlînê	42
2.2.3. Çapa Misrê	44
2.2.4. Çapa Dersaadetê	45
2.2.5. Çapa Xulûsî	46
2.2.6. Çapa Osman Beg	46
2.2.7. Çapa Muhemmed Şakir	46

2.2.8. Çapa Şêx Muşerref	47
2.2.9. Çapa Zeynelabidînê Amîdî	47
2.2.10. Çapa Sadiq Behadîn Amedî	48
2.2.11. Çapa Zeynelabidîn Zinar	48
2.2.12. Çapa Ebdulbasid Mihemed Ebdulsamed	48
2.2.13. Çapa Tehsîn Îbrahîm Doskî û Muhsîn Îbrahîm Doskî	49
2.2.14. Çapa Mela Musa Celalî Bayezîdî	49
2.2.15. Çapa M. Xalid Sadinî	50
2.2.16. Çapa Huseyn Şemrexî.....	50
2.3. Tabloya Nusxeyên Mewlûdê.....	51

BEŞA SÊYEM

METNÊ BI KRÎTÎK

1. Rêbaza Amadekirina Metnê	52
2. Metnê Mewlûda Bateyî	59
ENCAM	129
ÇAVKANÎ	132

PÊVEK

FERHENG A MEWLÛDÊ	135
SÛRETÊN NUSXEYÊN MEWLÛDA BATEYÎ	150

PÊŞGOTIN

Edebiyata Kurd a Klasîk, li medrese, mizgeft û di nav tarîqatan de şîn hatiye û bandora xwe li ser gelê Kurd kiriye. Xwîna wê ya cawîdan ji rengê Îslamê ye û hê jî dije. Edebiyat ji hewcetiyekê derdikeve holê û li gorî wê hewcetiye dije. Ev edebiyat; ji pêwistiya edet û tevgerên gelê me û ecibandina estetîka ronakbîrên Kurdan ve yên mela, berdewam dike. Cureyên şiklên nazim weke xezel, qesîde, mesnewî, çarîn hwd. îro jî têne bestekirin, di şewbêrkan de têne xwendin. Mewlûd, bi şiklê mesnewiyan tê nivîsandin û mijara wê jî çêbûn, zarokatî û pesndana cenabê Muhammed aleyhîselam e. Ji bilî vê pesndana Xwedê û pêxemberên din jî tê de heye. Lê hemû mewlûd ji aliyê naverokê ve neweke hev in.

Mewlûdên Kurdî jî di nav gelê Kurd de hê jî tên nivîsandin û tên xwendin. Çanda mewlûdê di nav civakê de ewqas zindiye ku kengî zarokek çêbibe, kengî kurek bê sinetkîrin, ku yek ji leşkeriyê hat, roja dawetê, kengî kesek bimre di te'ziya wî kesî de, çaxê xêrekê, di ber bela û musîbetekê de mewlûd tê xwendin û paşê jî xwarin tê xwarin. Ev çand, uslûba şahî, kêfîkirin an şîngirtina Îslamî ye. Lewra di mewlûdê de mijar Muhammed aleyhîselam e. Ev bîranîn îmanê bêtir dike, pêşiya îsraf û fahşîtiyê digire.

Di nav gelê Kurd de, kevneşopîya nivîsîn û xwendina mewlûdê li gorî delîlên heta niha, bi Melayê Bateyî dest pê kiriye. Mewlûda Mela Huseynê Bateyî (ss 17-18an) di nav kevneşopiyên Kurdan de cihekî girîng digire. Qasî girîngiya xwe lêkolînek girîng jî heq dîkir. Ji ber vê yekê jî pêwistbû ku metneke têkûz ya vê mewlûdê derketa holê. Ji ber ku her lêkolîner li gorî nusxeyekê an 3-4 nusxeyan metnekî latînî nivîsandibû, ev mewlûd ji aliyê hin beş û peyvan ve ji hev cûda bû. Peyvên bêwate an nayêne fêmkirin jî di çapên nûjen de hebûn. Li dawîya çapan de ferhengokê ku hebûn jî ne berfirehbûn.

Mebesta vê tezê berawirdkirina nusxeyên mewlûda Melayê Bateyî, serastkirina çewtiyên peyvan û li gorî vê jî nivîsîna bitûpên latînî metneke têkûz e. Ji ber ku metnê resen ne di destê me de ye, ev kar pêwist e weke “Restorasyona Metnê” bê qebûlkirin. Newekheviya çapên Mewlûda Mela Huseynê Bateyî, me bire nusxeyên kevin ên Mewlûdê. Piştî ku me nusxe peyde kirin me dît ku nusxe jî ji hin aliyan ve cûda ne. Îcar du karên bi zehmet li pêşiya me bûn: Berawirdkirina nusxeyan û transkripsiyona metnê. Di van her du karan de jî hîlbijartina peyvan serêşiyek bû. Beriya her tiştî pêwistbû ku metnê ji serî heta binî hatibana xwendin. Vê xwendinê hîlbijartina peyvan hêsan dîkir. Di

xwendina nusxeyan de, dema ku cudayî derdiket, me li gorî wezna mewlûdê û wateya peywendê hin peyv dineqandin û hin jê jî dihilbijartin.

Di xebata peydekirina nusxeyan de gelek astengî derketin. Em pêşî çûne Gundê Batê û me wêneyên nusxeya Gundê Batê kişand. Nusxeyên din an cihê wan jî me ji lêkolînerên ku beriya me xebitûne sitend. Ji ber ku di kutupxaneyan de qeyda zimanê Mewlûdê ne bi Kurdî bû, me hin nusxe zû nedîtîn. Ji ber hin sedeman 3 nusxeyên St. Petersburgê hê jî neketine destê me.

Girîngiya vê tezê ji vê tê ku heta niha tu kesî ev qas nusxe û çap berawird nekirine, ferhengê Mewlûdê evqasî berfireh amade nekirîye.

Di destpêkê de li ser Mewlûdên Kurdî lêkolînek berfireh hatiye kirin û sernivîsên hin mewlûdan li gorî rastnivîsê hate serastkirin.

Beşa yekem di derheqê jiyan û berhemên Mela Huseynê Bateyî de ye. Ji ber ku li ser navê wî û jidayîkbûna wî hin agahiyên cuda hebûn me ev agahî xistin tezê û me hin delîl jî pûç kirin. Me dîsa di vê beşê de agahiyên di derheqê berhemên wî de dan ser hev û ji aliyê naverokê ve ew binaskirin dan.

Beşa duyem di derheqê mewlûda Melayê Bateyî de ye. Di vê beşê de ji aliyê ruxsarî û naverokê ve mewlûda Bateyî hatiye vekolîn. Di vê beşê de danasîna nusxeyên Mewlûda Bateyî cihê girîng digre. Me di vir de ji bo her nusxeyê; sernivîs, destpêk û dawîya beşan, kêmbûn û zêdebûna xaneyan, hejmarên xaneyan, hejmarên beşan tespît kirin.

Beşa sêyem ji metnê Mewlûda Bateyî ya berawirdkirî pêk tê. Di vê xebata “Edîsyon Kritisîk” ê de me 12 nusxeyên mewlûdê berawird kirin. Ev nusxe, beş bi beş, xane bi xane, herf bi herf hatin xwendin û hatin berawirdkirin. Di jêrenotan de çewtî, kêmanî, zêdeyî cudatî hatin nîşandan.

Di pêvajoya amadekirina vê xebatê de gelek kesan alîkarîya me kirin. Berî her tiştî pêwist e ez spasîyên xwe pêşkeşî şewirmendê xwe Doç. Dr. Abdurrahman Adak bikim ku di hemû merhaleyên tezê de rê û rêbaz pêş me kir. Bi tewsiye û temînkirina çavkaniyan piştgirî da me û bi pêşniyazên xwe kir ku em dirûvê herî dawî bidin tezê. Her weha ji bo pişgiriya wan ên di warên curbicur de ez spasîyên xwe pêşkeşî Prof. Dr. Kadri Yıldırım, Dr. Hayrullah Acar, Zeynelabidin Zinar, M. Xalid Sadinî, Huseyn Şemrexî, Tehsîn İbrahîm Doskî, Muzaffer Engin, Mela Nurî, Mela Salih Kawil, Mela Muhyeddin Alpergin, Mela Mehmet Bakır Çetin, Mela Abdullah Ekici, Suleyman Çevik û Rıdwan Turgut dikim.

Ziver İlhan-Mêrdîn 2013

KURTEBÊJE

AG	Nusxeya Abdullah Golî
amd.	Amedekar
B	Nusxeya Berlînê
ber.	Berawird bikin
D	Nusxeya Dihokê
DB	Nusxeya Diyarbekirê
E	Nusxeya Ehmed
EB	Çapa Ebdulbasid Ebdulsamed
GB	Nusxeya Gundê Batê
H	Nusxeya Hewlêrê
h.	hejmar
h.b	heman berhem
HDN	Nusxeya Haziq
hwd.	her wekî din
M	Nusxeya Misrê
m.	mirin
MA	Nusxeya Muhemmed Abdullah
ME	Nusxeya Mahmud Efendî
MK	Nusxeya Millî Kutupxane
MM	Nusxeya Muhemedê Muksî
OH	Nusxeya Orta Hisar
r.	rûpel
saw.	Sallallahu ‘aleyhî wesellem
ŞM	Çapa Şêx Muşerref
t.b.b.	Li tevahiya berhemê binêrin
wer.	werger

DESTPÊK

Di nav gelên Misilmanan de hezkirina Cenabê Pêxember, kevneşopiya mewlûdê derxistiye holê. Di destpêkê de emê li ser wateya peyva “mewlûd”ê, kurtedîroka kevneşopiya mewlûdê, mijarên naveroka mewlûdan û mewlûdên kurdî bisekinin.

1. Wateya Peyva “Mewlûd” ê

Mewlûd, peyveke erebî ye û ji peyva “Wîladet” ê hatiye çêkirin. Peyva mewlûdê ji aliyê wateya ferhengî ve tê wateya jidayikbûnê û dem, dîrok û cihê jidayikbûnê. Herweha tê wateya rojbûyîna kesekî jî.¹

Peyva mewlûdê weke terîm tê du wateyan:

- a) Merasîmên ku ji bo bîranîna dem û dîroka ku Muhemmed (saw.) hatiye dinyayê têne çêkirin.
- b) Berhemên ku behsa bûyerên berî jidayikbûna Muhemmed (saw.) û piştî wê qewimîne dikin.²

Çawa ku tê dîtin çî merasîm bin, çî behrem bin wateya termînolojîk a mewlûdê bi Cenabê Pêxember ve girêdayî ye. Din ava Kurdên Kurmanc de “Mewlûd” bi forma “Mewlûd”ê tê bikaranîn di ferhengê de “Mewlûd” ji wî kesê ku nû çêbûye re tê gotin.³ Lê digel vê jî Kurd peyva Mewlûdê bi wateya Mewlûdê ya ferhengî bi kar tînin.

2. Kurtedîroka Kevneşopiya Mewlûdê

Pîrozbahiyên mewlûdê cara pêşî, bi awayekî fermî di serdema Fatimiyan de di serdema Muiz Lillah (972-975) de dest pê kiriye. Paşê di serdema bûrayê Selahaddînê Eyûbî atabegê Hewlêrê Muzaferuddîn Gökbörü (1190-1233) de di nav gel de belav bûye. Beriya Gökbörü, Sibî Ibnu’l-Cewzî (m. 1201) behsa mewlûdên derdora Bexdayê û xelatên ku mewlûdxanan distendin kiriye.⁴ Ji ber ku di serdema Selçûkiyan, Eyyûbiyan, Memlûkiyan û Osmaniyan de vê kevneşopiyê berdewam kiriye, di nav Misilmanan de rûniştîye û hê jî di nav gelek cîvakên Misilmanan de tê pîrozkirin.⁵ Li

¹ Ferit Devellioğlu, Osmanlıca-Türkçe Ansiklopedik Sözlük, Aydın Kitabevi Yayınları, Ankara, 1996, r.636

² M. Edip Çağmar, Edebî Açından Arapça Mevlitler, İlahîyat, Ankara, 2004, r.13

³ Mehmet Yanmış, Diyarbakır’da Mevlid Gelenegi ve Bazı İller ile Karşılaştırmalı Bir Analiz, Uludağ Üniversitesi İlahiyat Fakültesi Dergisi, h.1, r.116-117, Bursa, 2012

⁴ Ahmet Özel, İslam Ansiklopedisi, Diyanet Vakfı, cilt29, r. 475-479, Ankara, 2004

⁵ Çağmar, hb. r.17-18

Bakurê Afrîqayê (Mexrîb) di serdema Ebu'l-Ebbas Ehmed b. Muhemmed b. Huseyin es-Sebtî el-Azefî (m. 633/1236) de merasîmên mewlûdê destpê kirine û paşê li Endulusê belav bûye.⁶

Mebesta merasîmên pêşî sîyasî bûye, bêtir li seray û qesran, bi awayeki fermî û ji gel dûr dihatin sazkin. Wê serdemê hîna helbest nederketibû pêş û merasîmên mewlûdê ne tenê ji bo Muhemmed (saw.) lê belê ji bo Îmamê Elî, keça Pêxember Fatîma, Îmam Hesen, Îmam Huseyn û ji bo çar xelîfeyan jî dihatin sazkin.⁷

Mewlûdnameya herî kevin “Mewlûdu'l-Erûs” e. Ji bilî vê di serdema atabegê Hewlêrê Gökbörü de, ji aliyê zanyarê hedîsê Îbn Dîhye ve mewlûdnameyek hatiye nivîsandin ku ev berhem jî di nav berhemên kevin ên mewlûdan de derbas dibe.⁸

3. Mijarên Naveroka Mewlûdan

Naveroka hemû mewlûdan ne weke hev e; lê di mewlûdan de bi tevayî, nûra Muhemmedî, bûyîna pêxember (saw.), bûyerên ku ji ber bûyîna wî qewîmîne, jiyana pêxember (saw.), exlaq û şemaîla pêxember (saw.), mesaja îlahî ya ku Cenabê Pêxember (saw.) aniye, hezkirina pêxember (saw.) û pesindana pêxember (saw.)⁹ û di hin mewlûdan de jî beşên weke mîracê û wefata Cenabê Muhemmed (saw.) jî hene.

4. Di Zimanên Curbecur de Mewlûd

Mewlûd, heta niha bi gelek zimanên xelkên Misilman hatiye nivîsandin. Mewlûd pêşî bi erebî hatiye nivîsandin û hê di sedsala XVan de li dora 500 mewlûdên erebî hatine tespît kirin. Navên mewlûdên erebî bi tevayî “Mewlûdu'n-Nebî” an jî “Mewlûdu Resûlîllah” e.¹⁰

Di edebiyata tirkî de jî mewlûd cî girtiye û heta niha 63 berhemên mewlûdê hatine tespît kirin.¹¹ Li gorî lêkolîna Hasibe Mazioğlu, ji bilî 63yê ku Ayşe Necla Pekolcay tespît kirine 12 mewlûdên din jî hene.¹² Ji nav van mewlûdan a herî zêde bi nav û deng “Vesîletu'n-Necat” e ku ji aliyê Suleyman Çelebî ve di sedsala XVan de

⁶ Ahmet Kavas, “Afrikada Mevlid Uygulamaları”, Diyanet İlmi Dergi, (hejmara taybet) Ankara, 2000, r.561

⁷ Yanmış, r.118

⁸ Yanmış, r.119

⁹ Çağmar, r.24

¹⁰ hb. r.17-18

¹¹ Ayşe Necla Pekolcay, Mevlid, Diyanet Vakfı Yayınları, Ankara, 1993, r.40-43

¹² Hasibe Mazioğlu, Türk Edebiyatında Mevlid yazan Şairler, Ankara Üniv. DTCF Türkoloji Dergisi, c.6., h.1, r.32

hatiye nivîsandin. Irmgard Engelke, ew wergerandiye almanî û F.Lyman Mac-Callum jî wergerandiye Ingilîzî.¹³

Di kutupxaneyên Tirkiyeyê de ji bilî yê erebî û tirkî; mewlûdên farisî, kurdî, arnawûdkî, çerkezî, boşnakî û rûmkî jî hene.¹⁴

5. Mewlûdên Kurdî

Di Edebiyata Kurdî de nivîsandina mewlûdê di bin bandora Melayê Bateyî de ye û kevneşopiya mewlûdê di hemû zaravayên kurdî de hê jî dewam dike. Emê li jêrîn tenê navên wan û nivîskarên wan bidin.

5.1. Mewlûdên Kurmancî

5.1.1. **Mewlûda Bateyî** : Mela Huseynê Bateyî

5.1.2. **Mewlîdî Nebî** : Şêx Muhemmed Emînê Heyderî¹⁵

5.1.3. **Kitêba Dura Birincî Mewlûda Kurmancî** : Mela Muhemmed Siraceddînê kurê Ebdilhekîmê Xelîlî¹⁶

5.1.4. **Mewlûda Şerîf** : M. Zahit Kardeşlik¹⁷

5.1.5. **Fêkiyê Narencî Mewlûda Kurmancî** : Ehmed Nas¹⁸

5.1.6. **Mewlûda Şerîf Hate Safa Di Mewlûda Mustafa**: Seyîd Feyzullahê Findikî.¹⁹

5.1.7. **Mewlûda Şerîf** : Mela Muhemmed ‘Elî Fudeylî²⁰

5.1.8. **Mewlûda Kurdî Bi Zimanê Gundî** : Seyyîd Bedreddîn Ibn Mela Salih El-Hesenê Şefî‘î El-Kefsûrî²¹

5.1.9. **Mewlûda Şerîf Ji Ewwel Heta Axir Rêberê Xelasê** : M.Mustafa yê Mela ‘Aliyê Ezdarî (Mustafa Turan)²²

¹³ M. Tayyib Okiç, Çeşitli Dillerde Mevlitler ve Süleyman Çelebi Mevlidinin Tercemeleri, İslamî İlimler Fakültesi Dergisi, h.1. r.31-33, Erzurum, 1975

¹⁴ Pekolcay, r.28-29

¹⁵ Şêx Muhemmed Emîn Heyderî, Mewlûda Nebî, Lîs, İstanbul, 2007

¹⁶ Mela Muhemmed Siraceddîn Kurê Ebdilhekîmê Xelîlî, Kitêba Dura Birincî Mewlûda Kurmancî Mewlîd-î Şerîf, amd. M.Siddik Ataç, Doğuş, Nusaybin, 2001

¹⁷ Ev berhem, di 1989an de ji aliyê M. Zahit Kardeşlik ve weke destxetê hatiye çapkirin. Çapxaneya berhemê neşkerê ye.

¹⁸ Ehmed Nas, ev Mewlûd di 1990î de li Cizîrê nivîsiye. Ev mewlûd heta niha çap nebûye; lê fotoqopiya wê hatiye belavkirin.

¹⁹ Seyîd Feyzullahê Findikî, Mewlûda Şerîf Hate Safa Di Mewlûda Mustafa, Halk matbaacılık, Cizre, 2004.

²⁰ Hayrettin Kızıl, Diyarbakır ve Çevresinde Yazılmış Mevlitlerin Konularına Göre Tasnifi Denemesi, Şarkiyat İlmi Araştırmalar Dergisi, sayı VII, Nisan 2012, r.124

²¹ Seyyîd Bedreddîn Ibn Mela Salih El-Hesenê Şefî‘î El-Kefsûrî, Mewlûda Kurdî Bi Zimanê Gundî. dîrok û cihê ku lê çap bûye nediya e.

²² Mustafa Turan, Mewlûda Şerîf Ji Ewwel Heta Axir Rêberê Xelasî, Dua yayıncılık, İstanbul, 2011.

5.1.10 **Mewlûda Nebî** : Mela Şewqî Xak²³

5.1.11. **Nezma Şêrîn Der Mewlîd û Sîreta Resûlê Emîn** : Mela Muhemmed kurê
Mela Ehmedê Xursî²⁴

5.1.12. **Mewlûda Pêxember** : Mela Silêman Kurşun²⁵

5.1.13. **Mewlûda Kurdî Bi Şêwaza Hedbî** : M. Burhan el-Hedbî²⁶

5.1.14. **Mewlûda Fexrê 'Âlemê Muhemmed**: Seyîd Mela Ebdurrehman Kurê Mela
Hemze²⁷

5.1.15. **Ava Heyat** : Mela Elî bin es-Seyid 'Evdirrehman²⁸

5.2. **Mewlûdên Kirdkî (Zazakî-Dimilkî)**

5.2.1. **Mewlidê Nebîyê Qûreyşî** : Ehmedê Xasî.²⁹

5.2.2. **Biyîşe Pexemberî**: Osman Efendiyo Babij³⁰

5.2.3. **Mewlidî Peyxemberî**: Mela Mehemed Elî Hûnî³¹

5.2.4. **Mewlidî Nebî** : Mela Kamilê Puexî³²

5.2.5. **Mewlidî Zazakî** : Mela Mehemedê Muradan³³

5.3. **Mewlûdên Soranî**

5.3.1. **Mewlûdname**

Ev mewlûd, ji aliyê Şêx Huseyn Qazî (1790-1869) ve hatiye nivîsandin. Bereksê mewlûdên din ev mewlûd pexşan e. Nivîskar di naverokê de cih daye jidayikbûna Cenabê Pêxember, jiyana wî û şerên ku kirine. Berhem li Kurdistanê weke kitêba dersê hetîye xwendin. Cara yekem, di sala 1935an li Bexdayê hatiye çapkirin.³⁴

²³ Mela Şewqî Xak, *Mewlûda Nebî*, amd. Şêxmûsê Talatî, Elele Birlik, Nusaybin, 2003.

²⁴ Mela Muhemmed Kurê Mela Ehmedê Xarsî, *Nezma Şêrîn Der Mewlîd û Sîreta Resûlê Emîn*, Kızıltepe, 2008.

²⁵ Mela Silêman Kurşun, *Mewlûda Pêxember*, Beroj, İstanbul, 2010.

²⁶ Kızıl, hb, r.144-145

²⁷ Seyid Mela Evdirrehman Weledê Hemze, *Mewlûda Fexrê Âlemê*, Mekteba Seyda, Diyarbekir, 2013.

²⁸ Kızıl, h.b. r.123

²⁹ Ehmedê Xasî; *Mewlidê Kirdî*, amd. Roşan Lezgîn, Nûbihar, Stenbol, 2013

³⁰ Malmîsanij, *Kovara Hêvî*, Parîs, Gulan h.2, 1984, r: 77-85

³¹ Mela Mehemed Elî Hûnî, *Mewlid*, Weşanxaneyê Vateyî, İstanbul, 2004.

³² Mela Kamilê Puexî, *Mewlidî Nebî*, Transkriberdox, W. K. Merdimîn, Vate, h.19., zimistan-wisar, 2003

³³ Mela Mehemedê Muradan; 'Ez lna ze yew Mûsîbetek Vinena' ; Roportajkerdoxs: W.K Merdimin-N. Celalî, *Kovara Vateyî* Eistanbul, 2003, h.1, r.4-17

³⁴ Shakely, Ferhad: *Modern Kürt Öykü Sanatı*, wer. Rohat Alakom, Avesta, İstanbul, 1998. r.22

JIYAN Ê BERHEMÊN MELA HUSEYNÊ BATEYÎ

1. Jiyana wî

1.1. Navê wî

Derheqê navê Melayê Bateyî de lêkolîner ne hemfikir in. Hin ji wan dibêjin navê wî “Ehmed” e hin dibêjin “Huseyn” e û hin jî dibêjin “Mihemed”e. Li gorî Babê Zêrevanî navê wî “Huseyn”e.³⁵ Ji ber 4 delîlan, M. Xalid Sadinî dibêje navê wî: “Mela Huseynê Bateyî” ye³⁶:

1) Li ser “Hemaîl”a wî bi xwe ya ku neviyên keça wî Zulfê, parastine -ku niha li cem Mela Hecî Mihemedê Şembî ye- wisa hatiye nivîsandin: Sahîbûhû we mālîkuhû Huseyîn bîn Mustefa” Babê Zêrevanî jî vê delîlê destek dike.³⁷ Li gorî vê, em karin bibêjin, Mela Huseynê Bateyî, kurê Sofî Mistefa ye.

2) Mela Dirbaz, neviyê Mela Huseyn e û li ser “Hemaîl”a ku li cem Mela Cemîl Axayê Giravî ye, wisa nivîsiye: “Sewwedeşû Mela Dirbaz bin Mela Tahir bin Huseyn”

3) Xelkê gundê Bateyê û yên deverê, “Bateyî” bi navê “Mela Huseynê Bateyî” dizanin û dinasin.

4) Melayê Bateyî, ne ji eşîra Ertûşîyan e. Lewra devoka Gundê Batê û ya Ertûşîyan ne weke hev e û mirovên wî gundî xwe ji vê eşîrê nahesibînin.³⁸

Lê dema em li çapê Mewlûda Bateyî dinêrin, em dibînin ku li ser kitêban weke paşnavêkê “Ertûşî” hatiye nivîsandin. Ji bilî vê, li gorî hin lêkolînerên weke Marûf Xeznedar³⁹ Bateyî ji eşîra Ertûşîyan e.

Li ser navê wî, hin lêkolînerên weke Mele Mahmûdê Bazîdî⁴⁰ û Mehmed Emin Zeki Bey⁴¹ gotine navê wî Ehmed e. Lê Marûf Xeznedar ne di wê fikrê de ye û gotiye navê wî “Mela Huseynê Bateyî” ye.⁴²

1.2 Serdema wî

Li ser dîroka jidayikbûna wî dîtînin lêkolîneran ji êkdu cuda ne. Li gorî hin lêkolînerên weke Sadiq Behaeddin Amêdî⁴³, Qanatê Kurdo⁴⁴, Muhemmed Emîn Zekî⁴⁵,

³⁵ Babê Zêrevanî, “Mela Hisênê Bateyî-1”, *Nûbihar*, h. 87, Zivistan, 2002, r.63

³⁶ M. Xalid Sadinî, *Mela Huseynê Bateyî*, Nûbihar, Stenbol, 2011, r.19-20

³⁷ Zêrevanî, “Mela Hisênê Bateyî-1”, r.63

³⁸ Sadinî, “Mela Huseynê Bateyî”, r.33-34

³⁹ Marûf Xeznedar, *Mêjûy Edebî Kurdî*, Aras, Erbil, 2010, r.453

⁴⁰ Mela Mahmûdê Bazîdî, *Camieya Risaleyan û Hikayetan Bi Zimanê Kurmancî*, amd. Ziya Avci, İstanbul, 2010, r.53

⁴¹ Mehmed Emin Zeki Bey, *Kürd ve Kürdistan Ünlüleri*, Apec& Öz-ge yayınları, Sweden, 1998, r.364

⁴² Xeznedar, *Mêjûy Edebî Kurdî*, r.453

⁴³ Sadiq Bahaeddin Amedî, *Hozanvanê Kurd*, Kurî Zanyariy Iraq, Baxdat, 1980.

Bazil Nikitin⁴⁶, Minorsky⁴⁷, Elaeddîn Seccadî⁴⁸; ew di sala 1414 an di 1417an de hatiye dinyayê û di 1491an an jî di 1495an de wefat kiriye.⁴⁹

Li gorî hin lêkolînerên weke Marûf Xeznedar⁵⁰, Feqî Huseyîn Sağniç⁵¹, Amir Hassanpour⁵², Ebdurreqîb Yûsif⁵³; ew, di sedsala XVIIan de hatiye dinyayê û di sedsala XVIIIan de çûye ber dilovaniya Xwedê.

Li gorî M. Xalid Sadinî, ji ber çend delîlên jêrîn koma duyem rastir xuya dike:

1) Ji ber ku di helbesta bi navê “Bi Dil Îro Xedeng im” de bêjeya “tiveng”ê bi kar aniye:

“Du eslanan wereng hatin

Bi tabûr û **tiveng** hatin

Bi şimşîr û xedeng hatin

Qîrên îna Musilmanan”⁵⁴

Lê bikaranîna tifingê ne delîla sedsala 16 û 17an e. Lewra li gorî “Tevârîh-i Cedîd-i Mir’ât-ı Cihân”⁵⁵, “Tevârîh-i Âl-i Osmân”⁵⁶, tifing ne li Ewrûpa îcad bûye; li Asyayê di sedsala 14an de îcad bûye. Artêşa Osmaniyan jî beriya artêşên Ewrûpayê tifing bi kar aniye.

2) Ji 1690î paşvetir, di navbera Mîrê Hekarî û Osmaniyan de serdemeke baş peyda bûye. Di wê serdemê de Mîrê Hekkarî û Osmaniyan pevra li hemberî Îranê şer kirine. Wê serdemê Melayê Bateyî jî li medreseya Colemêrgê de mamoste bûye. Ji ber wan têkiliyên Tirkan, di helbestên Bateyî de bêjeyên tirkî zehf hatine bikaranîn.

3) Di helbesteke danberheva Bateyî û Girgaşî de Bateyî gotiye:

⁴⁴ Qanatê Kurdo, Tarîxa Edebiyata Kurdî, Özge Yayınları, Ankara, 1992.

⁴⁵ Mehmed Emin Zeki Beg, Tarîxa Kurd û Kurdîstan, wer. Ziya Avcı, Avesta, İstanbul, 2012

⁴⁶ Bazil Nikitine, Kürtler, Deng, Diyarbakır, 2013.

⁴⁷ V.F. Minorsky, Kürtler ve Kürdistan, wer. Kamuran Fıratlı, Doz, İstanbul, 2004

⁴⁸ Elaeddîn Seccadî, Mêjûy Edebî Kurdî, Çapxaney Marûf, Baxda, 1952

⁴⁹ Sadinî, Mela Huseynê Bateyî, r.22-23

⁵⁰ Marûf Xeznedar, Mêjûy Edebî Kurdî, Aras, Erbil, 2010.

⁵¹ Feqî Huseyîn Sağniç, Dîroka Wêjeya Kurdî, İstanbul Kürt Enstitüsü, İstanbul, 2002

⁵² Amir Hassanpour, Kürdistanda Milliyetçilik ve Dil, Avesta, İstanbul, 2005

⁵³ Avdîreqîb Yûsuf, Şairên Klasîk ên Kurd, wer. Elî Şêr, Weşanên Jîna Nû, Uppsala, 1988.

⁵⁴ h.b. r25

⁵⁵ Bayburtlu Osmân, “Tevârîh-i Cedîd-i Mir’ât-ı Cihân”, Süleymâniye Ktp. Mikrofilm Arş., nr. 478, vr. 250.

⁵⁶ Kemâl Paşa-zâde, “Tevârîh-i Âl-i Osmân”, I. Defter, Millet Ktp. Ali Emîrî, Tarih, nr.: 30, vr. 9^a.

Bateyî:

“Ji sirra neqşê subbûhî
Mu’eyyen tête te’lîmê
Ji şeklê Adem û Nûhî
Çi bêjim husnê teqwîmê
“Nefextu fîhî mîn rûhî”⁵⁷
Be’îd e bête tefhîmê”

Li gorî nêrîna Sadînî, eger ku di risteya **“Nefextu fîhî mîn rûhî”**(min ruhê xwe pîf kirê) de **“Nefextu”** li gorî hesabê ebced bê hesibandin sala 1717 derdikeve holê: N,F,X,T: 50(N)+ 80(F)+ 400(X)+ 600(T) =1130 H ye. Ew jî 1717ê mîladî dike.⁵⁸

Ji xeynî van delîlan, çîrokek li Çolemergê tê gotin ku Mîr Êzdînşêr, Melayê Bateyî hêj biçûk dîtiye û alîkariya wî kiriye ku bixwîne. Ew mîr jî Êzdînşêrê çaremîn e û 1696 an de mîrîtiya Çolemergê kiriye. Ev Ezdîn Şer kurê Şerefxan Begê mîrê Hekkariya ye û nêviyê Zekeriya Begê hevçerxê Şerefxanê Bedlîsî ye. Em ji dîroka nivîsandina “Şerefname” ya Şerefxan Bedlîsî hîn dibin ku Zekeriya Beg, di 1596an de li ser hikum bûye. Piştî wî, kurê wî hukim kiriye û paşê jî nêviyê wî Êzdîn Şer bûye mîr. Ev jî dide nîşandan ku dema Êzdîn Şer, Bateyî dîtiye û wî bi xwe re biriye xwendinê, dawiya sedsala 17an e.

Di derheqê sedsala ku Bateyî tê de jiyaye, delîlek din jî ev e ku di nusxeya “Hemaîl”a li Gundê Batê de serdema nivîsîna berhemê askere kiriye û em ji wir dixwînin ku ev berhem di serdema Îbrahîmxanê Hekariyê de hatiye nivîsandin. Tê zanîn ku Îbrahîmxan di navbera salên 1700-1742 hikum kiriye.

Delîlek din jî ev e ku Mela Mensurê Girgaşî di sedsala 18an de jiyaye. Lewra helbesteke wî di mecmueyeke ku di sala 1768an derketiye qeydkiriye.⁵⁹ Ji ber ku Bateyî û Mela Mensurê Girgaşî jî daneber hev û helbest pevne nivîsîne û jidayikbûna Girgaşî 1678 e, dîroka jiyîna Bateyî bi texmînî zelal dibe.⁶⁰ Lê gelo dema ku Bateyî û Girgaşî pevne helbest nivîsîne, Bateyî çend salî bû ? Ji bo vê pirsgirêkê du bend weke delîl di destê me de hene:

⁵⁷ Mîn ruhê xwe pîf kirê.

⁵⁸ M. Xalid Sadînî, Mela Huseynê Bateyî, Nûbihar, Stenbol, 2011, r.27

⁵⁹ Abdulreşîb Yusuf, Şairên Klasîk ên Kurd, wer. Elî Şêr, Weşanên Jîna Nû, Uppsala, 1988, r.67

⁶⁰ Sadînî, Mela Huseynê Bateyî, r.26-28

4) Dîsa di heman danberhevê (hevdûbêj) de

Girgaşî:

“Be‘îd e bête îmkanê
Ji Îsa bê heta Ehmed
Mu‘erref xetê seywanê
Bixûnin nuqteya **eswed**
Reqem kêş di dîwanê
Hisaba cezmeya ebced”

Eswed: elif= 1, sîn= 60, waw= 7, dal= 4= 72. Li gorî vî hesabî dema ev helbest hatiye nivîsandin dibe ku Girgaşî 72 salî be. Ji ber ku herdu helbestvan hevalê hev in, temrenê wan jî nêzîkî hev e.

5) Di helbesta xwe ya bi navê “Beyta Biharê” de Girgaşî gotiye:

“Şehbazê emrê ehed
Felek kirin nîlgûn
Dinya ferşê zumerred
Reqem kirin “**qaf**” û “**nûn**”
Nuqteyê mala eded
Bi nexmê mayeştêhûn”

Li gorî hesabê ebcedê $Q: 20 + N: 50 = 70$ dike. Li gorî vî hesabî emkarin bibêjin, temenê Girgaşî wê demê 70 bûye.

Ji ber van delîlan li gorî dîrokên ku nivîskaran jî dane, bi texmînekê, em karin bibêjin ku Mela Huseynê Bateyî di sedsala XVIIan û XVIIIan de jiyaye û 65-75 sal kirine.

1.3. Xwendina wî

Mela Huseynê Bateyî, pêşî li cem birayê xwe Mela Ehmed, dest bi xwendinê kiriye. Piştî bûye panzdeh salî, li medreseya Mîr Zeynel Begê Hekkarî, xwendina xwe domandiye. Ji berhemên wî hatiye fêmkirin ku wî ji xeynê kurdî, farisî, erebî û tirkîya osmanî jî dizanîbû. Li gorî peyv, têgeh û biwêjên ku di helbestên xwe de bi kar aniye, diyar e ku ew di edebîyat, dîrok, belaxet, hedîs, tefsîr, fiqih û kelamê de mahîr bûye. Li gorî Ebdureqîb Yûsif û Tehsîn Îbrahîm Doskî jî ku destnîşan kirine: dibe ku Bateyî, li

medreseya Miksê jî xwendibe û icazet ji wirê sitendibe.⁶¹ Mela Huseynê Bateyî, li Miksê, li medreseya Mîr Hesana Welî dest bi perwerdeyê kiriye. Ji wirê jî îcazet sitendiye. Seydayê wî, ew şandîye Çolemergê. Li medreseya Çolemergê çend sala derz daye. Hinekan gilîyê wî li bal mîrê Çolemergê kirine. Çend sala bi dadgehan ve daketiye. Paşê berat bûye. Mela Huseynê Bateyî, vegeryaye Miksê. Ji mîrê Miksê mizgefteke ku xwendin tê de bêkirin xwestiye û biçêkirin daye. Heta şerê 2. yê Cihanê jî ev mizgeft li ser xwe ye û şagirtên ku li wirê ilm dîtine, li rojhilata Anadolê kar kirine. Paşê mizgeft hatiye xerabkirin û kitêbên ku ji Mela Huseyn mane jî hatine şewitandin.

Mela zewiciye û sê zarokên wî hebûne.⁶² Di helbestên wî de navên keçên wî û jina wî hene; lê navê kurê wî nîne. Li ser hebûna kurê wî jî lêkolîneran li hev nekirine. Li gorî Babê Zêrevanî, ew bêkur e⁶³; lê li gorî M. Xalid Sadînî, kurekî wî bi navê Mela Tahir hebûye û ew jî bavê du zarokan bûye. Ji wana Mela Huseynî koçî Qewalê kiriye û li wir bûye xwedî milk. Niha jî ew milk aşkere ye ku yên nêviyên wî ne.⁶⁴

Mela Huseynê Bateyî, çûye Hecê. Li wirê helbesta xwe ya bi navê: “**Hilo Rabe Ebul Qasim**” xwendîye.

*“Hilo rabe Ebu’l-Qasim
Hilo ey qasidê ekber
Hilo fexra Benî Haşim
Hilo rabe tu wî rehber”*

Pişî vegera Hecê bi salekê wefat kiriye. Rîwayetek heye ku çûye Bexdê û li wir bi şêxekî re li ser ilmê peyiviye. Li gorî rîwayetên nêviyên wî, Batê mirovekî dîndar, bisebir, zanyar, eşqî ilm û nefis piçûk bû. Weke ku wî jî gotiye: “Feqîrê Batê” bû.

1.4. Nasnavên wî

Melayê Bateyî, di helbestên xwe de wekî nasnav, formên “Bateyî, Batê û Batey” bi kar anîne. Di nav helbestên wî yê bîmexles de Bateyî 8 caran, Batê 2 caran û Batey 15 caran hatiye bikaranîn. Li cihekî mexlesa xwe wekî “Melayê Bateyî” jî bi kar aniye. Weke mînak li dawîya Mewlûda Bateyî de “**Bateyî**” derbas dibe :

“Bo cemî’ê Mu’minînê şalihe
Bo feqîrê **Bateyî** el-Fatihe”⁶⁵

⁶¹ h.b, r.29-30

⁶² h.b, r.22-26

⁶³ Zêrevanî, “Mela Hisênê Bateyî-1”, r.63

⁶⁴ Sadînî, Mela Huseynê Bateyî, 2011, r.30-32

⁶⁵ Huseyn Şemrexî, Mewlûd, Melayê Bateyî, Nûbihar, İstanbul, 2011, r.67

Di helbesta “Ji Bextê Min Reşî Rabû” de mexlesa xwe bi şîklê “**Batê**” bi kar aniye:

“Çi gul bû ew çî bilbil bû
Mirad û metleba dil bû
Eger çî ew j imin sil bû
Ji bo **Batê** Hemail hat”

Di helbesta “Çiriya Paşî û Pêda” de nasnavê wî “**Melayê Bateyî**” derbas dibe.

“Ji çiriya paşî û pêda
“**Melayê Bateyî**” kanê
Sefer kêşa bi Miksê da
Li ser wextê zivistanê”⁶⁶

Di helbesta “Ya Îlahî Ez Xerîb im.” de ji ber kêşeyê nasnavê wî bi şîklê “**Batey**” derbas dibe.

“Av û xwîn barîn peyapey
Daîma bedhal e “**Batey**”
Saîl im rehmê fîza key
Mam di nav qewmê xerîb”⁶⁷

2. Berhemên wî

2.1. Mewlûd

Di edebiyata Kurdî de mewlûdnameya yekem ev berhem e.. Gelek nusxe û çapên wê hene. Bi Kurdî ye. Ji aliyê terkîban di bin bandora erebî, ji aliyê sernivîsan di bin bandora farisî de ye. Manzûm e û di şîklê mesnewiyê de hatiye nivîsandin. Di serê berhemê de pesndana Xwedê û Pêxember heye. Paşê; di naveroka vê berhemê de xêra xwendina mewlûdê, afirandina nûra Muhemmed (saw.) û afirandina Adem (as), întîqala nûra Muhemmed (saw.), ji dayikbûna ‘Ebdullah bavê Muhemmed (saw.), peymanbestina Cihûyan ji bo kuştina ‘Ebdullah, zewaca ‘Ebdullah û Amîne, mizgîniya pêxemberan li Amîneyê ji bo hemla wê û wefata ‘Ebdullah, ji dayikbûna Muhemmed (saw.), bûyerên şeva çêbûnê, nîşanên ku ‘Ebdulmutilib di wê şeva çêbûnê de dîtine,

⁶⁶ h.b. r.20

⁶⁷ h.b r.20

hatina Helîme bi bal Mekke ji bo şîrdana Muhemmed û birina wî, vegera kerwana Sadiyan ji Mekke, di nav qabîleya Sadiyan de bûyerên ku ji pêxember çêbûne, vegera Helîme bi bal Mekke'yê ji bo teslîmkirina Pêxember li Amîne, dua û paşgotin heye.

Ji ber ku di vê teza xwe de emê bi berfirehî li ser mewlûdê rawestin em niha li ser narawestin.

2.2.Hemaîl

Berhema sêyem ya Bateyî “Hemaîl” e. Nusxeya destxetî ku di destê me de ye, ya Gundê Batê ye. Hemaîl, hê latînîze nebûye û nehatiye çapkirin. Bi erebî hatiye nivîsandin. Di derkenarên wê de bê kîjan beş di derheqê çî de ye bi Kurdî hatiye nivîsandin. Di hin beşan de bi farisî jî hevokin hene. Sernivîsên vê bi hibra sor in. Di bin her sernivîsê de “Bismillahîrrahmanirrahîm” heye. Ayet, navên Xwedê, navên hebûnên ku em nizanin, dua, navê hin derman û gîhayan, herf û reqemên tilsimê tê de ne.⁶⁸ Di her beşê de ayetên Quranê hene; lê gelek caran ayet nêvcî hiştine. Gelek caran ayet û dua tevde ne.

Beş û sernivîsên Hemaîlê ev in:

- 1) Beşa yekem ji ber rûpelên kêr bêsernivîs e.
- 2) Bi “Bismillahîrrahmanirrahîm” dest pê dike. Ev beş pir kin e.
- 3) Bi “Bismillahîrrahmanirrahîm” dest pê dike. Ev beş li ser nebaşiyê ye. Ji bo fitne, bela û nebaşiya siltanan nifir kirine.
- 4) Bi “Bismillahîrrahmanirrahîm” dest pê dike. Pêşî 2 ayet nivîsîne paşê duayên rizq û efiyetê kirine. Gazî hin navan kirine ku ne navên Xwedê ne. Piştî van pesnê Xwedê dide û ji bonî hesedê dua kiriye.
- 5) Bi “We Hidāyetu’l-” Bi ayeteke ku ji bonî zimanê wî vebe dest pê dike. Paşê jî hin ayetên din jî hene. Di derkenarê de: “Ji bona Mehbûs û Mehkema” hatiye nivîsandin.
- 6) Bi “Bismillahîrrahmanirrahîm” dest pê dike. Di serî de ayeta ku Xwedê li ser stêrkan sond dixwe heye. Gazî Xwedê dike û pesnê wî dide. Ji xeynî van gazî hin navên din jî dike.
- 7) Bi “Bismillahîrrahmanirrahîm” dest pê dike. Di serî de ayetek heye, paşê jî pesnê Xwedê dide û alîkariyê jê dixwaze.

⁶⁸ Zêrevanî, “Mela Hisênê Bateyî-1”, r.61

- 8) Bi “Bismillahîrrahmanirrahîm” dest pê dike. Ayetek di serî de heye û ew jî qut kiriye. Beşeke kin e u rêzek tenê ye.
- 9) Bi “Bismillahîrrahmanirrahîm” dest pê dike. Di serî de sureya Yasîn heye. Paşê bi farisî dewam dike.
- 10) Sernivîsa wê “Babu Newmi’s-Sibyan” e: Li ser xewa zarokan e. Di serî de ayetek heye û ew jî qut kiriye. Paşê ji sureya Rahman gelek ayet nivîsandine. Tevlî ayetan dua jî hene.
- 11) Sernivîsa wê “Babu Nesîbu’l-Weledî wel Walîdâtî” ye: hin reqem û herf tê de ne. Di derkenarê de “Ji Hez kirina dê û zarokê” hatiye nivîsandin.
- 12) Sernivîsa wê “Babu Telebu’l-Mere’ti Tezewic we lem Tu’ta” ye: Hin reqem û herf tê dene. Di derheqê xwestina jinan e.
- 13) Sernivîsa wê “Babu Aqdi’l- Cenînî” ye: Di derheqê xwe girtina zarokan e. Ji bo ku zarok ji ber pîrekan neçin hatiye nivîsandin. Tê de dua hene. Bi vê beşê dawiya berhemê hatiye û ji bo vê jî nivîsek heye lê berhem dewam dike.
- 14) Sernivîsa wê “Şemaîlu’l-Şerîf” e: Di derheqê sêwirandin û şiklê Muhemmed (saw.) de ye. 3 rêzên vê beşê bi farisî ne. Hin dua jî kirine.
- 15) Bi “Bismillahîrrahmanirrahîm” dest pê dike. Di serî de Bi erebî dibêje ez yê ku raje vê nivîsê ez hefza wan ji Xwedê dikim. Paşê Ayetu’l-Kursî, sureya Îxlas, Felaq û Nas heye.
- 16) “Bismillahîrrahmanirrahîm” dest pê dike. Di serî de dibêje ez ji nebaşiya sihêrbazan hifza xwe ji Xwedê dixwazim.
- 17) “Bismillahîrrahmanirrahîm” dest pê dike. Nivîskar di vê beşê de cih daye sureya Fatîha.
- 18) “Bismillahîrrahmanirrahîm” dest pê dike. Dibêje Ya Rebbî tu me ji Cinnan û Sihêrbazan bihefizîne.
- 19) “Bismillahîrrahmanirrahîm” dest pê dike. Pesnê Xwedê daye.
- 20) “Bismillahîrrahmanirrahîm” dest pê dike. Sureya Nas û Îxlas tê de hene û dixwaze Xwedê wî bistirîne.
- 21) “Bismillahîrrahmanirrahîm” dest pê dike. Di vê beşê de Xwe avêtiye Xwedê û pesnê wî daye.
- 22) “Bismillahîrrahmanirrahîm” dest pê dike. Sureya Fatîha tê de ye.
- 23) “Bismillahîrrahmanirrahîm” dest pê dike. Sureya Beqera tê de ye.

- 24) Sernivîsa wê “Suretu’l-Saffat” e. Paşê “Bismillahîrrahmanirrahîm” heye. Sureya Saffat tê de ye.
- 25) Sernivîsa wê “Haza Dua ...” ye. Paşê “Bismillahîrrahmanirrahîm” heye. Di derkenara wê de: “Ji bona zaroka Xweda bidit jinika” hatiye nivîsandin.
- 26) Sernivîsa wê “Haza Dua Şerîf” e. Paşê “Bismillahîrrahmanirrahîm” heye. Tê de dua hene.
- 27) Sernivîsa wê “Haza Dua ” e. Paşê “Bismillahîrrahmanirrahîm” heye. Tê de hin sure hene û serê sureyan bi hibra sor in.
- 28) Sernivîsa wê “Şerhî Dua-i Îsmi’l-Zat” e. Paşê “Bismillahîrrahmanirrahîm” heye.
- 29) Sernivîsa wê “Haza Îsmu’l-Zati” e. Paşê “Bismillahîrrahmanirrahîm” heye. Daxwazî û dua tê de hene.
- 30) Sernivîsa wê “Şerhi sifathisar ewredmaned” e. Bi farisî behsa Sultan Îbrahîm Melîk Şah Xwarezmî kiriye.
- 31) Sernivîsa wê “Şerîf Mubarek...el-Hîsar el ewwel” e. Bismillahîrrahmanirrahîm” heye. Hin ayetên Yasîne hene. Ji xeynî vê bin beşê, binbeşên din jî ev in:
- 2- El- Hisari’l-Sanî
 - 3- El- Hisari’l-Salis
 - 4- El- Hisari’l-Rabi’
 - 5- El- Hisari’l-Xamis
 - 6- El- Hisari’l-Sadis
 - 7- El- Hisari’l-Sabi’
- Ev bin beş bi “Bismillahîrrahmanirrahîm” destpê dike. Ji bonî tengasiyê hatine nivîsandin. Hin hevok bi hibra sor in. Hin navên ku em nizanin din av de hene.
- 32) Sernivîsa wê “Şerhi Duai Heft Kef” e. Bi farisî ye. Rûpelek e.
- 33) Sernivîsa wê “Kefi El- Musît” e. Ji ayetan pêk tê. Li ser serkeftinê ye. Bi farisî diyar kiriye.
- 34) Sernivîsa wê “Duai Qartîya El- Musît” e. Paşê “Bismillahîrrahmanirrahîm” heye. Hin navên xerîb tê de ne.
- 35) Sernivîsa wê “Babu’l- Caî We’l Qebuli Endi’l- Umerai” ye. Paşê “Bismillahîrrahmanirrahîm” heye. Ji bonî qeblubûyina bal mîran e. Li derkenarê “Ji bona hezkirina dijminan” hatiye nivîsandin.

- 36) Sernivîsa wê “Babu’l-Tali’ we’n-Nesibi we Dewlet” e. Li derkenarê “Ji bonî Zengîniyê” hatiye nivîsandin. Bi “Bismillahîrrahmanirrahîm” destpê dike. Ayetên li ser Yunus (as) tê ne.
- 37) Sernivîsa wê “Babu’l-Xewfi we mehebbeti’l- Xelqi” ye. Li derkenar: “Ji bona tirs û hezkirina ...” Bi “Bismillahîrrahmanirrahîm” destpê dike. Ayet û reqem tê de hene. Bi farisî diyar kiriye.
- 38) Sernivîsa wê “Mik... danesid” e. Li derkenar: “Ji bona qarişê amir û hakim”
- 39) Sernivîsa wê “Babu’l-Hifzî min şerrî Kullî Maxluqîn mine’l- cinnî we’l-însî we’ş-şeyatîn” e. Ji ayet û duayan pêk tê.
- 40) Sernivîsa wê “Babu’l-Aynî sû” ye. Li derkenar: “Ji bo nazar” hatiye nivîsandin. Bi “Bismillahîrrahmanirrahîm” destpê dike. Li ser çavên xerab e.
- 41) Sernivîsa wê “Babu’l-wece’irra’sî” ye. Li derkenar: “Ji bona serêşiyê” hatiye nivîsandin. Bi “Bismillahîrrahmanirrahîm” destpê dike. Ayeta li ser gazîkirina Zekerîya (as) e.
- 42) Sernivîsa wê “Babu’l-liweqî’sirrati’l-waqî’eti” ye. Li derkenar: “Bona navikê” hatiye nivîsandin.
- 43) Sernivîsa wê “Babu’l-mewti’l-Xenemî” ye. Ayeta di navbera nebî Musa ku behsa gopal dike.
- 44) Sernivîsa wê “Babu’l-zebanî cumle xelaîk”e. Bi “Bismillahîrrahmanirrahîm” destpê dike.
- 45) Sernivîsa wê “Babu’l-Tihâlî we’l-aniyete”ye. Ayetin li ser çiya tê de hene.
- 46) Sernivîsa wê “Babu’l-wece’irrasî”ye. Li ser serêşiyê ye.

Li dawîya kitêbê bi erebî wisa hatiye nivîsandin:

“Hemaîl, bi alîkariya Xwedayê (ku Melîk û Celîl e) li ser destê kême îbadan di meha pîroz a Remezana şerîf û di wextê eşayê de xelas bû. Ev jî di dema hakimê hukûmetê, mîre mîran Îbrahîmxan Xweda bi rehma xwe li siûd û paşeroja wî binêre û tiştên ku bixwaze jê re hêsan bike, hatiye nivîsandin.”

2.3.Helbestên wî

Helbestên Melayê Bateyî, ji aliyê wî ve nehatine komkirin. Helbestên wî di destxetên cur be cur de hatine qeytkirin. Ev helbestên wî, beriya niha di hin kitêbên dîroka edebiyata Kurdî, weke kitêba Merûf Xeznedar “Mêjûyî Edebî Kurdî” de, di kovarên weke Nûbihar de, di hin berhemên biyografîk weke kitêba Tehsîn Îbrahîm

Doskî “Melaye Bateyî Jiyan û Berhem” de jî çap bûbûn. Hin lêkolîner jî ev helbest dane ser hev û ew çap kirine.⁶⁹ Helbestên wî 7 heb jê munacaat, 6 heb jê neet, 17 heb jî helbestên curbecûr in. Di van helbestan de geh evîna xwe ya beşerî geh ya îlahî aniye ziman.

Li gorî risteya yekemîn an li gorî risteya dubarekirî û cureyên helbestan navên helbestên wî li jêrê hatine rêzêkirin.

➤ **Munacaatên wî:**

1. **Ya Îlahî tu Kerîmî:** Ji 16 çarînan pêk tê.
2. **Heqqa Tu Padîşahî:** Ji 33 bendan pêk tê.
3. **Subhan Ji Mîrê Qadirî:** Ji 15 çarînan pêk tê.
4. **Ya Îlahî Ez Xerîb im:** Ji 11 çarînan pêk tê. Li dawiya her çarînê de risteya “Mam di nav qewmê xerîb” dubare kiriye.
5. **Ya Reb Hewar Sed Car Hewar:** Ji 11 çarînan pêk tê. Li dawiya her çarînê de risteya “Ya Reb tu yî dermanê min” dubare kiriye.
6. **Ya Rebbena Qadir Tû yî:** Ji 9 çarînan pêk tê. Li dawiya her çarînê de risteya “Ez dê ji kê gazinde kem” dubare kiriye.
7. **La Hewle la Quwete:** Ji 10 çarînan pêk tê.

➤ **Ne‘etên wî:**

1. **Ey Ne ‘tî ez ‘Erşî Heta Ferşî Şehîra:** Ji 7 çarînan pêk tê û di navbera wan de xane hene.
2. **Muhemmed Seyyîdê ‘Alem :** Ji 24 çarînan pêk tê.
3. **Hilo Rabe Ebul Qasim:** Ji 15 çarînan pêk tê.
4. **Muhemmed Sahibê Tacê:** Ji 13 çarînan pêk tê.
5. **Îro Me dî Newmek Çi Xweş:** Ji 16 çarînan pêk tê.
6. **Kan Ma ‘dena Sidq û Sefa:** Ji 14 çarînan pêk tê. Li dawiya her çarînê de risteya “Kanê Muhemmed Mustefa” dubare kiriye.

➤ **Helbestên li ser Evîna Beşerî:**

1. **Subh û Êvarî Şeva Tarî Şemala Kê yî Tu:** Ji 7 bendan pêk tê. Di her bendî de 5 riste hene.

⁶⁹ M. Xalid Sadînî, “Mela Huseynê Bateyî”, Nûbihar, Stenbol, 2011

2. **El-Wefa Bêwesl û Canan Xemz û Naza min Tu yî:** Ji 5 bendan pêk tê. Di her bendî de 5 riste hene.
3. **Ji Bextê Min Reşî Rabû:** Ji 16 çarînan pêk tê.
4. **Qismet Ji Dîwana Ezel:** Ji 7 çarînan pêk tê.
5. **Aşiqê Zulfa Reş im:** Ji 12 çarînan pêk tê.
6. **Derd û Dax im:** Ji 6 çarînan pêk tê.
7. **Ji Eltafê Şahîşahê:** Ji 10 çarînan pêk tê.
8. **Mestê Şepalê Teftêş:** Ji 17 çarînan pêk tê.
9. **Ji Çir'ya Paşî û Pê Da:** Ji 16 çarînan pêk tê.
10. **Bi Dil Îro Xedeng im Ez:** Ji 14 çarînan pêk tê.
11. **Ger Tu Nazik Sorgul î:** Ji 12 çarînan pêk tê.
12. **Ey Dil Eger Bi Neqdê Can:** Ji 11 çarînan pêk tê.
13. **Ey Dilê Qelb:** Ji 10 çarînan pêk tê.
14. **Ey Dilo Mizgînya Min Hat:** Ji 6 Bendan pêk tê û di navbera van bendan de xane hene.
15. **Baziyê Hecrî:** Ji 7 Bendan pêk tê û di navbera van bendan de xane hene.
16. **Ecel Saqî Bi Dest Min Da:** Ji 19 çarînan pêk tê.
17. **Ji Rengê Dilbera Horî:** Ji 12 çarînan pêk tê.

2.4.Zembîlfiroş

Berhema duyem ya Melayê Bateyî Zembîlfiroş e. Zembîlfiroşa ku Qenatê Kurdo dibêje ya Melayê Bateyî ye, ji aliyê A. Sosin ve hatiye weşandin. Kurdo, ji destnivîsara xwe jî hin çarînen Zembîlfiroş mînak dane. Lê delîlek weke mexlesê me peyde nekir ku em bibêjin ev berhem ji aliyê Bateyî ve hatiye nivîsandin.⁷⁰

Ji xeynî van helbestan Bateyî û Girgaşî dane berhev û ji vê danberhevê helbesteke 18 bendî derketiye holê.

Babê Zêrevanî, behsa “Tecwîda Qur’ana Pîroz” û “Aqîdeya Îmanê” dike; lê ev kitêb windayîne û tu delîl li ser wan nînin.⁷¹

⁷⁰ bnr. Qanatê Kurdo, Tarîxa Edebiyata Kurdî, Özge yay., Ankara, 1992, r.66-70

⁷¹ Zêrevanî, h.b. , r.61

MEWLÛDA MELAYÊ BATEYÎ

1. Ji aliyê ruxsarî ve mewlûda Mela Huseynê Bateyî

1.1. Tertûba Mewlûdê

Di hemû nusxe û çapan de zimanê sernivîsan û hejmara xaneyan li her beşê bê guhertin jî, naverok û hûnandina bûyeran wisa ye:

- 1- Pesndana Xwedê
- 2- Pesndana Pêxember
- 3- Xêra xwendina mewlûdê
- 4- Afirandina nûra Muhemmed (saw.)
- 5- Afirandina Adem (as)
- 6- Întîqala nûra Muhemmed (saw.)
- 7- Ji dayikbûna ‘Ebdullah bavê Muhemmed (saw.)
- 8- Peymanbestina Cihûyan ji bo kuştina ‘Ebdullah
- 9- Zewaca ‘Ebdullah û Amîne
- 10- Mizgîniya pêxemberan li Amîneyê ji bo hemla wê û wefata ‘Ebdullah
- 11- Ji dayikbûna Muhemmed (saw.)
- 12- Bûyerên şeva çêbûnê
- 13- Nîşanên ku ‘Ebdulmüttelib di wê şeva ji dayikbûnê de dîtine.
- 14- Hatina Helîme bi bal Mekke ji bo şîrdana Muhemmed û birina wî
- 15- Vegera kerwana Sadiyan ji Mekke
- 16- Di nav qabîleya Sadiyan de bûyerên ku ji pêxember çêbûne
- 17- Vegera Helîme bi bal Mekke’yê ji bo teslîmkirina Pêxember li Amîne
- 18- Dua û paşgotin

1.2. Kêşa Mewlûdê

Kêşa mewlûda Bateyî, “Fâ’ilâtûn Fâ’ilâtûn Fâ’ilûn”e. Ku ji Behra Remelê qalibekî nesalim e. Li gorî kîteyên girtî û vekirî me qalibê arûzê tatbîq kir. Li ser hin xaneyên jêrîn ev tatbîqkirin wisa ye:

Zîhaf: Di arûzê de dema ku kîteyek dirêj be mirov wêna ji bo qalib, kurt bike an bixwîne navê wê zîhaf e. Di hin xaneyan de weke kêmaniyeke kêşê carinan zîhaf tên dîtin. Me zîhaf bi “ž” yê nîşan da.

- 1 Hemdê bêhed bo Xudayê ‘alemîn
 - ž - - / - + - - / - + -
 Ew Xudayê daye me dînê mubîn
 - + - - / - + ± - / - + -
 Fâ‘ilâtûn Fâ‘ilâtûn Fâ‘ilûn
- 11 Ya Reb îmanê dixwazin em mudam
 + ž - - / - + ± - / - + -
 Jê rê alaya Muħemmed we’s-selam
 - ž ± ± / ± + - - / - + -
 Fâ‘ilâtûn Fâ‘ilâtûn Fâ‘ilûn

Îmale: Di arûzê de dema ku kîteyek kin be û ji bo qalib mirov wêna dirêj bike an dirêj bixwîne navê wê îmale ye. Me îmale bi “±” nîşan da.

- 2 Em kirine ummeta Xeyru’l-Beşer
 - + ± ± / - + ± - / - + -
 Tabi‘ê wî muqtedayê nam(i)wer
 ± + - - / - + + - / + + -
 Fâ‘ilâtûn Fâ‘ilâtûn Fâ‘ilûn
- 355 Gote min: “Da biçneve bêzeħmetê”
 - + - ± / - + ± - / - + -
 Min gotê: “Nê hatî nûra reħmetê
 - ž - - / ± ž - ± / - + -
 Fâ‘ilâtûn Fâ‘ilâtûn Fâ‘ilûn

Wesl: Di arûzê de dema ku bêjeyek bi tîpeke bêdeng dawî bibe û bêjeya dû wê re bi tîpeke dengdar destpê bike li wir herdu bêje bihev re tên xwendin. Me wesl bi “=>” nîşan da.

79 Çûn îradet hatî Sulţanê refî‘
 - => + - - /- ž - - / - + -
 Çêkitin Adem bi vî şeklê bedî‘
 - + - => - / - + + - / - + -
 Fâ‘ilâtûn Fâ‘ilâtûn Fâ‘ilûn

Di hin xaneyan de kîte zêde ne û kêş xerabe ye:

315 Der duşenbe diwazdehê ewwel rebî‘
 Sala fîlê hatî ew hemla bedî‘

1.3. Şemaya Qafiyeyên Mewlûdê

Şemaya qafiyeyan, weke hemû mesnewiyan, her xane di nav xwe de biqafiye ye:

“aa, bb, cc, dd, ee” ye:

a_____ ‘alemîn

a_____ mubîn

b_____ beşer

b_____ nam(i)wer

c_____ ‘ezîm

c_____ Kerîm

d_____ tamam

d_____ selam

e_____ Celal

e_____ bêzewal

1.4.Redîfên Mewlûdê

Redîf, di helbestan di ji paşîya risteyê ber bi serê risteyê ve, wekheviya qertafên hevpeywir û hevpar e. Beriya qafiyeyê mirov li redîfê digere. Ger ku redîf hebe mirov wê dinivîsîne û derbasî qafiyeyê dibe. Ger ku tune be mirov li wekheviya dengên digere û wan li gorî navê qafiyeyan bi nav dike. Bateyî di Mewlûdê de redîf jî bi kar anîne:

28 Şerfê mewlûdame yek dirhem fer **e**

Hemberê yek kohê zêrê eḥmer **e**

e: redîf

13 Ey şefî' û daruwê her 'illetê

Dîde û bînahîya vê ummetê

ê: redîf

104 Gote "Nûra yek nebîyyê mezin **e**

Seyyid û hem mezinê nesla min **e**

e: redîf

67 Ez dizanim la îlah illa tu **yî**

Ew Muḥemmed hemberê îsmet bû **yî**

yî: redîf

90 Paşê bir avête bagê Cennetê

Ġeyrî dârê jê bixwe her nî' metê

ê: redîf

1.5. Qafiyeyên Mewlûdê

1) Qafiyeya Tam:

Qafiyeya tam, di helbestan de ji paşîya risteyê ber bi serê risteyê ve, ji xeynî redîfê, wekheviya du dengên e. Di mewlûdê de gelek caran qafiyeya tam hatiye bikaranîn:

16 Ew Hebîbê rohnîya heft asîman
Her du ‘alem qalib ew rûh û rewan
an: qafiyeya tam

20 Ma remeyte îz remeyte gûşîdar
Destê wî destê Xuda der kar û bar
ar: qafiyeya tam

26 Gote wî Peygamberê ‘alî şifet
“Mewlûda min her kesê mezin biket”
et: qafiyeya tam

38 Bête xwendin ger li yek sikke dirav
Dê mubarek bin derahîm bibne zav
av: qafiyeya tam

40 Xanîyê lê bête xwendin ev şala
Dê bibîte ba ‘işê def‘a bela
la: qafiyeya tam

2) Qafiyeya Dewlemend:

Qafiyeya dewlemend, di helbestan de ji paşîya risteyê ber bi serê risteyê ve, ji xeynî redîfê, wekheviya sê dangan û bêtir e. Di mewlûdê de ji qafiyeya tam kêmtir be jî jimara qafiyeya dewlemend pir e.

14 Destegîr û mustegâşê herdu kewn
Bo gunehkaran penah û pişt û ‘ewn
ewn: qafiyeya dewlemend

23 Ey şeff‘ û şahîbê alayê hemd
Min hene bêhed guneh nisyan û ‘emd
emd: qafiyeya dewlemend

53 Her yekî tesbîheke xaş û cuda
Daîma tesbîhi xwendin bo Xuda

uda: qafiyeya dewlemend

3) Qafiyeya Nîv

Qafiyeya nîv, di helbestan de ji paşîya risteyê ber bi serê risteyê ve, ji xeynî redîfê, wekheviya dengekî bitenê ye. Di mewlûdê de qafiyeya nîv kêr caran hatiye bikaranîn:

48 Saleha tesbîhi kir nûra şigerf
Şeş mî'et elf û çihar û bîst û elf

f: qafiyeya nîv

168 Rahê şehra girt û çûn ew kînedûz
Mîslê kûndê her bi şev çû, ne bi roz

z: qafiyeya nîv

1.6. Hunerên Edebî

1.6.1. Teşbîh

Hunera şibandinê ye. Ji bo ku peyv bêtir bihêz bibe mirov peyva bêhêz dişibîne ya bihêz. Di mewlûda Bateyî de hunera teşbîhê zehf in. Mînak:

28 Şerfê mewlûda me **yek dirhem fer** e
Hemberê yek **kohê zêrê eḡmer** e

56 Çûn ji **beḡra me' rîfet** ew hate der
Qetere jê weryan ba îlham ev qeder

83 Bû **wekî durra sipî** wê sa'etê
Ġewṭe da der cuyibarê Cennetê

168 Rahê şehra girt û çûn ew kînedûz
Mîslê kundê her bi şev çû, ne bi roz

1.6.2. Teşbîhî Belîx

Cureyeke hunera şibandinê ye. Di vê şibandinê de tenê ya ku dişibe û ya ku tê şibandin tê bikaranîn. Di mewlûda Bateyî de li hin xaneyan de hatiye bikaranîn:

- 195 Dilnewaz û pêk ve naz û **qendîleb**
 Kes nedî şêrîntir ez bînta Weheb

1.6.3 Îstîfare

Ev huner, hunereke şibandinê ye; lê di vê şibandinê de ji ya ku dişibe û ya ku tê şibandin yek tenê tê bikaranîn. Ji vê hunerê çend mînak di mewlûdê de hene:

- 176 **Refte gûrgek** hate **berxê nûciwan**
 Lê belê hişyar e lê zîba şivan
- 177 Nagehan fikrê Weheb dî j' asîman
 Hate xwarê **leşkerê rûhaniyan**

1.6.4. Tenasûb

Di yekeya helbestekê de eger peyvên ku di navbera wan de têkilî hene bi hev re bîne bikaranîn navê wê hunerê tenasûb e. Di mewlûdê de ev huner pir hatiye bikaranîn:

- 109 Rohnîkê wî şîn kirin **dar û nebat**
 Çûn di erdê da du pa û mayî mat
- 156 Her çi **dara** hişk e, ez biçme binî
 Bû **heşîn** û kat e, ez **pelgan** genî
- 166 **Cengî** û merdê dilawer **şîregîr**
 Pêk ve xwarin sond û bestin **tîr û şîr**
- 208 Wê şevê anîn **nîkah** û 'eqdê **best**
 Bûk û zava man û **şerbet** dane dest

1.6.5. Telmîh

Telmîh, hunera edebî ya ku kesên navdar û dîrokî tîne bîra mirovan. Di mewlûdê de zehf hatiye bikaranîn:

- 19 Fexrê **Îbrahîm** û **Îsma'îl** û **Nûh**
 Muşţefayê bawefa yê bafutûh
- 30 Hem ji Bûbekr û '**Umer** hat ev xeber
 Hem ji '**Uşman** û '**Elî** çêbû eşer
- 240 Mahê şaliş hate **Îdrîsê** nebî
 Kir selam û mujde ber hemla te bî

1.6.6. Tekrîr

Hunera dubarekirinê ye. Eger ku di yekeya helbestekê de peyvek an peyvin du sê caran bêne dubarekiri, li wir hunera tekrîrê heye. Di mewlûdê de li hin deveran hatiye bikaranîn:

- 230 Dê çi bit halê me û tedbîr û ray?
 Ay û way û ay û way û ay û way!"
- 285 **Merheba** ey 'alî sultân **merheba**
 Merheba ey kanê 'îrfan **merheba**

1.6.7. Întaq

Întaq, ji bilî mirovan axaftina hebûnan e. Eger ku li ji bilî mirovan hebûnek bi axife li wir întaq heye. Weke jêrîn qelem axifiye:

- 64 "Ya qelem bînvîse emrê padîşah"
 "Ez çi bînvîsim bi ferman ya Îlah"

1.6.8. Nîda

Hunera edebî ya denglêkirin an jî gazîkirinê ye. Bi tevayî bi peyvên weke “ey, ya, eya” tê bikaranîn:

- 257 **Ey** xudawendanê ‘eqlê musteqîm
 Kes nizanî qiyetê durra yetîm

1.6.9. Tezat

Di vê hunerê de du peyvên li dijî hev pevire tene bikaranîn.

- 268 Yek li destê **rastê** hat û yek li **çep**
 Yek li piştê, yek li pêşim ba edeb

1.6.10. Îstîfham

Hunera pirsê ye. Gelek caran ev pirs ne li hêviya bersivê ye.

- 269 **Ew kî bûn?** Hewwa û Sare, Asiye
 Ya li pêşim Meryema ‘Îmranî ye

1.6.11. Alîterasyon

Ev huner bi dubarekirina dengên bêdeng çêdibe.

- 268 **Yek** li destê rastê hat û **yek** li çep
 Yek li piştê, **yek** li pêşim ba edeb

1.6.12. Asonans

Bi dubarekirina dengên dengdêr hunera asonansê çêdibe.

- 306 **Yekî** der destê misîn **e** **yekî** teş
 Yekî anî cameê sipî **ez** behîşt

1.7. Zimanê Mewlûdê

1.7.1. Bandora erebî

Di Mewlûda Mela Huseynê Bateyî de bandora erebî zehf e. Helbestvan peyv, terkîb û hevokên erebî zehf bi kar anîne. Carînan riste bitevayî bi erebî ne carna jî piraniya risteyê bi erebî ye:

18 <<Şallî ya Rebbî 'ela Xeyru'l-wera
Ma tesîru'ş-Şemsu fi's-sabî'u'l-ûla>>

21 Şallî ya Rebbî 'ela Xetmi'r-Rusul
Ma yemûcu'l-'aşîqûne fi's-subul

34 Gazî ket îxwan û hîlbîtin çira
Bête xwendin mewlûda Xeyru'l-wera

a) Peyvên erebî

Di Mewlûdê de gelek peyvên erebî hatine bikaranîn:

'Adem, 'alîneseb, bedî', beqer, beyza, bînt, cebhe, cedd, cemâl, cemil, dâmî'e, 'edâwet, enwer, erbe'ûn, 'esel, eşlab, eswed, 'eşa, fuzûn, gufran, geza, îna'm, îrtûhal, îstebreq, îxwan, kebîr, kewakîb, le'în, lîqa, lu'b, luget, megrîb, mehd, melîh, menbe', muncelî, mun'ekîs, mûnqelîb, munqesîm, muntezîr, mûqîn, murdî'e, murte'îb, muştemîl, muxalîf, muxtefî, muxteşer, muzalel, muznîb, nasix, nazîr, ne're', nîsa, qemer, rabi', raşîd, rîcal, riðwan, rukn, se'adet, sabî', şabî, sabîq, sadis, şedr, sakîn, semîn, samîne, şan, şanî, se'd, sefak, sefik, sehl, sekran, sem'im, seyf, şûf, sundus, surûr, sûy, şam, şefa'et, şehd, şems, şîhab, şu'le, ta'et te'accub, tasi', tetvil, tewîl, teheyyur, tehte', telbê, temr, temşîyet, terehhum, tewekkelna, tewîl, teyyîb, tîfl, 'uşşaq, 'uyûb, waşîl, waşîq, wedûd, wehdet, weheb, weqiye, xamis, yed, yesar, yexsîr, yûmn, zail, zamîne, zebîh, zed, zeheb, zîba.

Ji van peyvên erebî hin jê bi şîklê navên pirjimar in:

Exbar: nûçeyan

Ġeybiyan: Yên xuya nakin

Huccac: heciyan

Na'leyn: du nal

'Uşşaq: Yên evîndar

b) Terkîbên erebî

Di Mewlûdê de terkîbên erebî û wateya wan:

‘en Ḥabîbî’l-İzzetî: ji rumeta yê hezkirî, ji rumeta yar.

‘Ewnî’l-ğerîbî: alîkarê xerîban

Burhanu’l-Huda: Delîla Xwedê

Haşalîllah: Xwedê neke, tu carî

Fî sebîlilleh: Di rêya Xwedê de.

Fî’l-ḥal: Niha, anka, di vî halî de.

Înşeqqe’l-qemer: heyva ku bû du şeq

Ma zağe’l-başar: nerîna şaş nebû

Nî‘me’l-emîn: Çiqas xweş “emîn”e.

Teḥte’ş-şera: Bin erdê

Turfetu’l-‘eynî: Tiştên ku mirov bi çavan pê şaş dimîne.

Temme’l-kelam: Gotin temam bû.

We’s-selam: Evqas, ji vir û pê de xweşî, silav û aşîfî.

Wellahî’l-‘ezîm: Bi Xwedayê mezin

“Şafwetu’r-Reḥman: Saf û paqijê Rehman

Xeyru’l-murselîn: Xêrtirînê yê hatine şandin.

Ji van terkîban hin jê navên Xwedê ne:

Malîku’l-Mulk, Rabbi’l-Alemîn, Zû’l-Celal

Hin ji wan jî nav û nasnavên Muhemmed (saw.) in:

Xeyru’l-Beşer, Xeyru’l-wera, Xeyru’n-Nas, Xatemu’l-Murselîn, Şefî’ul-muznibîn, Ebu’l-Qasim.

Hin ji wan navên Mekke û derdora Kabeyê ne:

Beḥa, Beytu’l-Ḥeram, Dar’us-Selam, Ummu’l-Qura

c) Hevokên erebî

Di mewlûdê de hevokên erebî û wateya wan:

“Ca’ena Ehmed Resûllullah”: Ehmed Resullullah, ji me re hat.

Ey Muḥammed sellemellahû ‘eleyk: Ey Muhemmed silava Xwedê li ser te.

Îbşîrî ya Amîne bi'l-Muştefa: Ya Amîne tu bi Mustefa bimizgin be.

Kûnî Hebîbî Ehmeda: Hezkiriyê min Ehmed, ji min re çêbû

Qale: “Haze’l-emrû minhû qed beda”: Got: “Ev ferman, ji wî dest pê kir.”

Men ente: Tu kî yî ?

La texafû: ne tirse

Tewekkelna: me tewekkul kir, me xwe siparte Xwedê

Şellî ya Rebbî ‘ela Xetmî’r-Rusul

Ma yemûcu’l-‘aşiqûne fi’s-subul: Ya Rebbî heta ku ew aşiq di rêya wî de bimeşin, alîkariya mohra Resûlan (Resûlê dawî Muhemmed saw.) bike.

<<Şellî ya Rebbî ‘ela Xeyri’l-wera

Ma tesîru’ş-şemsu fi’s-sebi’il-ûla>>: Ya Rebbî alîkariya xêrtirînê muteqiyân (Muhemmed saw.) bike. Bila tav li wê zaroka biçûk nexê.

Şellî ya Rebbî ‘ela Xeyri’l-Beşer: Ya Rebbî alîkariya xêrtirînê beşeran (Muhemmed saw.) bike.

“Uqtulû haze’l-ğulame: Vî xulamî, zarokî bikujin.

Uhlîke’l-kuffaru mîn nari’l-Cebbar: Kafir ji agirê Cebbar helak bûn.

Ummetun muznîbetun, Rabbun Ğefûr: Umet gunehkar e , Rebbê te xwedî efû ye.

“We ‘eleyke es-salam û rehmetî”: û rehmet û silav li ser te be.

d) Di Mewlûdê de Ayet Hadîs û peyvên navdar

Îhbîtû mînha cemî‘en: Li gorî Qurana pîroz dema ku Îblîs, Adem (as) û pêreka wî dixapîne, Xwedê teala jî di sureya Baqara 36, Araf 24an de ji Adem (as) û pêreka wî re weha dibêje: “De dakevin ji wir hûnê ji hev re neyar bin”⁷²

Heman wate di sûreya Taha 123’ an de jî heye: “(Xwedê Teala) Got: ‘Hûn hemû pêk ve, ji hev re dijmin, ji Behîştê dakevin(ser erdê)...”⁷³

La îlahe illallah: Di Qurana Pîroz de di gelek ayetan de (Beqere 163, A.Îmran 6,18 Enam 102, Araf 73,85, 158, Tevbe 31, Hud 50 hwd.) ev wate derbas dibe: “Ji Allah pêve tu xuda nînin”⁷⁴ Melayê Batê, ev ayet li gorî peywenda metnê bi kar aniye.

⁷² M. Huseyn Êsî, M. Se’îd Girdarî, M. Muhemmed Bêrkevanî, Wergera Qur’ana Pîroz Bi Zimanê Kurdî, Nûbihar, Îstanbul, 2008 r.7 û r.154

⁷³ H.b r.321

Uktub **la îlahe illa ene**: Di sûreya Nehl ayeta 2an de: “Ji min pê ve tu Xweda nînin.”⁷⁵
Peyva “Uktub: Binivîse” ya helbestvan e.

Înna zelemna: “Bêguman me zilm kir.” Ev ne ayet e; lê li gorî peywenda metnê Bateyî bi devê Adem (as) û jina wî ev hevok gotiye. Beriya ku bibin zalim Xwedê ji wan re gotibû: “Ey Adem tu û kebaniya xwe li Bihiştê bimînin. Hûn çawa bixwazin wisa jê bixwin. Lê nêzî vê dara hanê nebin (ku hûn bixwin) hûnê bibin ji zaliman.”⁷⁶

Ma remeyte îz remeyte: Xwedê Teala di sûreya Enfal, ayeta 17an de dema ku behsa şer dikir: “.. gava te davêt jî te nediavet ; lê belê Xuda avêt..”⁷⁷

Îhdîna ya Reb **şirâte’l-musteqîm**: Ev ayet, di sûreya Fatîhe de ye:“(Ya Rebbî) tu me bighîne rêya rastîn”⁷⁸ Peyva “ya Reb” di ayetê de nîne.

We’l-leylî: Xwedê di sureya Leyl’ de: “ Bi şevê gava radipêçe”⁷⁹

We’ d-đûha: Xwedê di sureya Duha’ de: “Bila danê sibehê ku rohiya wênî biriqandî sibehê temsîl dike, şahit be”⁸⁰

1.7.2. Bandora farisî

Bi qasî bandora erebî nebe jî bandora farisî li ser Mewlûdê heye. Ev bandor bêtir di sernivîsên Mewlûdê de xwe şanî me dike. Ji xeynî nusxeya Diyarbekirê sernivîsên hemû nusxeyan bi farisî ne. Ew qas peyv û terkîbên erebî de hîlbijartina sernivîsên farisî tiştêkî balkêş e.

Ji xeynî sernivîsan di Mewlûdê de peyvên farisî weke “Afitab, aşîna, awaz, bîş, came, dâmen, dehen, dîde, dîger, fem, hemnişîn, koh, lağer, mader, mahitab, merg, nagehan, nâm, nehed, nîm, peder, pedîd, roz, şîr, tîzî, xend, xer, zûd” jî hene.

⁷⁴ H.b r.24,50,52,141,170

⁷⁵ h.b r.268

⁷⁶ <http://www.kurandaara.com//7> Tîrmeh 2012

⁷⁷ Mele Muhammed Garsî Farqînî, Meala Fîrûz Şerha Qur’ana Pîroz, Nûbihar, İstanbul, 2003, r.179

⁷⁸ h.b r.1

⁷⁹ h.b r.596

⁸⁰ Mustafa İslamoğlu, Hayat Kitabı Kur’an, Düşün Yayıncılık, İstanbul, 2011, r.1268

Ji xeynî van peyvan Bateyî daçeka “**Ez**” ku tê wateya “Ji” jî zehf bi kar aniye:

- 156 Her çi dara hişk e, ez biçme binî
Bû heşîn û kat e, **ez** pelgan genî
- 162 Min dîye der xwab û mayim muntezer
Ehmed **ez** piştî te ye, canê peder!”
- 165 Hatin heftê Cihûd **ez** mulkê Şam
Taze bey‘et best û ‘ehda natemam
- 195 Dilnewaz û pêk ve naz û qendileb
Kes nedî şêrîntir **ez** binta Weheb

1.7.3. Bandora tirkî

Bateyî, di hin xaneyan de peyvên tirkî jî bi kar anîne.

Ocak: mal, malbat

- 356 Da biçine pêşî **ûcağa** Qureyş
Belkî halê me bibîtin taze ‘eyş”

Al: sor

- 392 Ey hebîbe min Muḥemmed ey delal!
Bêje da rohnîk nebarin bo te **al**

Bolûk: hîzb, beş û koma leşkeriyê

- 338 Hem qebîla Se‘dîyan dîger **bolûk**
Her dihatin ta Mekkeh telbê biçûk

2. DANASÎNA NUSXEYÊN DESTXET Û NUSXEYÊN ÇAPÊN MEWLÛDÊ

2.1. Nusxeyên Destxet

2.1.1 Nusxeya Muhemmedê Muksî

Di nav nusxeyên Mewlûda Bateyî de ya herî kevin ev e. Ev nusxe di kutupxaneya St. Petersburgê de, din av koleksiyona A. Jaba de ye. Di 1206 H (1792 M) de ji bo Feqî Mustefa, li Erzurûmê hatiye nivîsandin. Mustensîxê wê Muhemmedê Muksî ye. Destxet e û bihereke ye. 58 rûpel in. Ji 16 beşan pêk tê. Têheva xaneyan 559 e. Di serê kitêbê de : “Haze Mewlî’n-Nebî” hatiye nivîsandin. Di vê nusxeyê de beşa “Eşşelatu ‘aleyk” nîne; lê ya “Merheba ” heye. Ji sernivîsa beşa merheba em fêhm bikin ku xwediyê vê beşê “Feqî Mustefa” ye.

Beşa 1. : Ev beş bi Bi “Bismillahîrahmanirrahîm ” dest pê dike. Di vê beşê de 24 xane hene.

Beşa 2. : Sernivîsa vê beşê weha ye: “Der Beyanî Feza’ilî Mewlûdî Muḥemmed Şellallahî ‘Eleyhî we Sellem” Ev beş ji 21 xaneyan pêk tê.

Beşa 3. : Sernivîsa vê beşê weha ye: “Beyanî İbtidâî Nurî Muḥemmed Şellallahu ‘Eleyhî we Sellem” Ev beş ji 33 xaneyan pêk tê.

Beşa 4. : Sernivîsa vê beşê weha ye: “Der Beyanî Xulqî Adem ‘Eleyhî we Sellem” Ev beş ji 41 xaneyan pêk tê.

Beşa 5. : Sernivîsa vê beşê weha ye: “Der Beyanî Amedenî Nûrî Muḥemmed Şellallahu ‘Eleyhî we Sellem” Di vê beşê de 11 xane hene.

Beşa 6. : Sernivîsa vê beşê weha ye: “Der Beyanî Bûdenî ‘Ebdullah we Întîqalî Nûrî Muḥemmed Şellallahu ‘Eleyhî we Sellem” Di vê beşê de 34 xane hene.

Beşa 7. : Sernivîsa vê beşê weha ye: “Der Beyanî Sebeb Dadenî Weheb Amîne li Ebdullahî dehed” Di vê beşê de 20 xane hene. Sernivîsa vê beşê li derkenarê hatiye nivîsandin.

Beşa 8. : Sernivîsa vê beşê weha ye: “Der Beyanî Întîqalî Muḥemmed Şellallahu ‘Eleyhî we Sellem” Di vê beşê de 50 xane hene.

Beşa 9. : Sernivîsa vê beşê weha ye: “Der Beyanî Waqî‘atî Muddetî Hemlî” Di vê beşê de 25 xane hene.

Beşa 10. : Sernivîsa vê beşê weha ye: “Der Beyanî Wîladetî Ba Sa’det Muḥemmed Şellallahu ‘Eleyhî wessellem” Di vê beşê de 25 xane hene.

Beşa 11. : Sernivîsa vê beşê weha ye: “Haza Mekanî Merheba Sahîbî Feqî Mustefa” Di vê beşê de 28 xane hene. Ev beş, beşa “Merheba” ye. Cihê ku dubarekirina “Merheba” qediyaye bi qelemê hatiye xêzkirin; lê bêsernivîs e. Hejmara xaneyên ku bi “Merheba” dest pê dikin 8 e.

Beşa 12. : Sernivîsa vê beşê weha ye: “Amedenî ‘Ebdulmuṭṭelib ez Ka‘be Beter di Amîne” Di vê beşê de 21 xane hene.

Beşa 13. : Sernivîsa vê beşê weha ye: “Amedenî Halîme û Bordenî Muḥemmed Şellallahu ‘Eleyhî we Sellem” Di vê beşê de 83 xane hene.

Beşa 14. : Sernivîsa vê beşê weha ye: “Beyanî Weqîatî ki der meya Benî Sa‘dida Peydâ Bûden” Di vê beşê de 69 xane hene.

Beşa 15. : Sernivîsa vê beşê weha ye: “Bazî Awardenî Halîme Muḥemmed Şellallahu ‘Eleyhî we Sellem” Di vê beşê de 49 xane hene.

Beşa 16. : Sernivîsa vê beşê weha ye: “Der Beyanî Munacatî we Xetmî‘l-Kîtab” Di vê beşê de 25 xane hene.

Ev nusxe bi vê xaneyê dawî dibe:

“Bo cemî‘ê mu‘mînînê şalihe
Bo feqîrê Bateyî el-fatihe”

2.1.2 Nusxeya Millî Kutûpxaneyê

Ev nusxe, berê di nav koleksîyona Adnan Ötüken de bû. Niha li Enqera li Millî Kutûpxaneyê ye. Li ser navê “Ahmed Batî” hatiye qeyd kirin. Di kataloga pirtukxaneyê de nimre ya wê 06 Hk 4390 e. Di 1240 (1824 miladî) de hatiye îstînsax kirin. Di qeyda pirtukxaneyê de navê wê “Mevlûdün-Nebî” derbas dibe. 20 rûpel in. Destxet e û bihereke ye. Cureya nivîsa wê “Nestaliq” e. Kaxeta wê bifilîgran e. Bê cild e. Sernivîsên wê bi hibra sor in. Rûpelên wê hêwîne. Ji 16 beşan pêk tê. Têheva xaneyan 557 e. Di rûpela yekem de wekî sernivîs: “Haza Kitabu Mewlidu’n-Nebî Şellallahu ‘Eleyhî we Sellem” hatiye nivîsandin. Xaneya yekem ev e:

“Hemdê bê hed bo Xudâyê ‘alemîn
Ew Xudayê daye me dînê mubîn”

Beşên vê nusxeyê û sernivîsên wan weha ne:

Beşa 1. : Ev beş bi “Bismillahîrahmanirahîm ” dest pê dike. Di vê beşê de 11 xane hene.

Beşa 2. : Sernivîsa vê beşê weha ye: “Der Ne’atî Nebî Şellallahu ‘Eleyhî we Sellem” Ev beş ji 13 xaneyan pêk tê

Beşa 3. : Sernivîsa vê beşê weha ye: “Der Feza’îlî Mewlûdu’n-Nebî Şellallahu ‘Eleyhî we Sellem” Ev beş ji 21 xaneyan pêk tê.

Beşa 4. : Sernivîsa vê beşê weha ye: “İbtidaî Nura Muḥemmed Şellallahu ‘Eleyhî we Sellem” Ev beş ji 33 xaneyan pêk tê.

Beşa 5. : Sernivîsa vê beşê weha ye: “Amedenî deran Waqtî Xulqî Seyîdîna Adem” Ev beş ji 39 xaneyan pêk tê.

Beşa 6. : Sernivîsa vê beşê weha ye: “Amedenî der İntiqalî Nûrî Muḥemmed Şellallahu ‘Eleyhî we Sellem” Di vê beşê de 46 xane hene.

Beşa 7. : Sernivîsa vê beşê weha ye: “Tabet Mesden der Dilî Weheb Ba Abdullah Daden” Di vê beşê de 20 xane hene.

Beşa 8. : Sernivîsa vê beşê weha ye: “Amedenî der an Waqtî İntîqalî Nûr Ba Amîne” Di vê beşê de 50 xane hene.

Beşa 9. : Sernivîsa vê beşê weha ye: “Amedenî der Muddetî Waqî‘atî ber serî Hemlî Amîne” Di vê beşê de 25 xane hene.

Beşa 10. : Sernivîsa vê beşê weha ye: “Amedenî Weqtî Weladetî Seyyîdîna Muḥemmed Şellallahu ‘Eleyhî wessellem” Di vê beşê de 25 xane hene.

Beşa 11. : Sernivîsa vê beşê weha ye: “Haza Qiyamu’l-Qedûmî Muḥemmed Şellallahu ‘Eleyhî we Sellem” Di vê beşê de 26 xane hene. Ev beş, beşa “Merheba ” ye. Xaneyên ku bi merheba dest pê dikin 7 in.

Beşa 12. : Sernivîsa vê beşê weha ye: “Amedenî der an Waqtî ‘Ebdulmuṭṭelib ez Ka‘be” Di vê beşê de 21 xane hene.

Beşa 13. : Sernivîsa vê beşê weha ye: “Amedenî Hâlîme û Bordenî Muḥemmed Şellallahu ‘Eleyhî we Sellem” Di vê beşê de 153 xane hene.

Beşa 14. : Sernivîsa vê beşê weha ye : “Amedenî Weqtî Hâlîme ber Medîne Muḥemmed Şellallahu ‘Eleyhî we Sellem” Di vê beşê de 49 xane hene.

Beşa 15. : Sernivîsa vê beşê weha ye: “Amedenî der Munacat we Xitmu’l-Kitab” Di vê beşê de 12 xane hene.

Beşa 16. : Sernivîsa vê beşê weha ye: “Haza’l- Mewzu‘i ...” Di vê beşê de 13 xane hene.

Ev nusxe bi vê xaneyê dawî dibe:

“Bo cemî‘ê mu‘mînînê şalihe
Bo feqîrê Bateyî el-fatihe”

2.1.3 Nusxeya Dihokê

Ev nusxe li Dihokê li kutupxaneya taybet ya Îsmâîl Taha Şahîn e. Di 1271 hicrî (1854 mîladî) ji aliyê Ehmed bin Hesên ve hatiye îstînsaxkirin. 44 rûpel in. Têheva xaneyan 546 e. Xetê wê bihereke ye. Beriya ku metin dest pê bike di serê rûpela pêşî de îfadeya: “Haza Mewlûdu’n-Nebî Şellallahu ‘Eleyhî we Sellem bi’l-lisani’l- Kurdî Mewlana Muḥemmed Batê Rahmetullahu ‘eleyh” heye. Di vê nusxeyê de beşa “Eşşelatu ‘aleyk” û “Merḥeba ” nîne.

Ev nusxe ji 16 beşan pêk tê. Li jêrê emê cih bidin sernav û hijmara wan xaneyan:

Beşa 1. : Sernivîsa vê beşê weha ye: “Bismillahîrahmanirahîm we bi teqdîm” Di vê beşê de 11 xane hene.

Beşa 2. : Sernivîsa vê beşê weha ye: “Der Na’atî Muḥemmed Şellallahu ‘Eleyhî We Sellem” Ev beş ji 13 xaneyan pêk tê

Beşa 3. : Sernivîsa vê beşê weha ye: “Fezailî Mewlûdî Muḥemmed Şellallahu ‘Eleyhî we Sellem” Ev beş ji 21 xaneyan pêk tê.

Beşa 4. : Sernivîsa vê beşê weha ye: “İbtidâî Nûrî Muḥemmed Şellallahu ‘Eleyhî we Sellem” Ev beş ji 31 xaneyan pêk tê.

Beşa 5. : Sernivîsa vê beşê weha ye: “Xulqî Adem ‘Eleyhî selam” Ev beş ji 38 xaneyan pêk tê.

Beşa 6. : Sernivîsa vê beşê weha ye: “İntiqalî Nûrî Muḥemmed Şellallahu ‘Eleyhî we Sellem” Di vê beşê de 11 xane hene.

Beşa 7. : Sernivîsa vê beşê weha ye: “İntiqalî Nûrî Muḥemmed Şellallahu ‘Eleyhî we Sellem be ‘Abdullah” Di vê beşê de 35 xane hene.

Beşa 8. : Sernivîsa vê beşê weha ye: “Der Dil Uftaden ki Amîne be ‘Abdullah be dehed” Di vê beşê de 20 xane hene.

Beşa 9. : Sernivîsa vê beşê weha ye: “İntiqalî Nûrî Muḥemmed Şellallahu ‘Eleyhî We Sellem ba Amîne Muqine Ṭahir” Di vê beşê de 50 xane hene. Xaneyek li derkenar hatiye nivîsandin.

Beşa 10. : Sernivîsa vê beşê weha ye: “Waqi‘atî Muddetî Hemli‘l-Amîne” Di vê beşê de 25 xane hene.

Beşa 11. : Sernivîsa vê beşê weha ye: “Wiladetî Ba Sa‘adetî Xeyru‘l-Enam Muḥemmed Muştafa Şellallahu ‘Eleyhî We Sellem” Di vê beşê de 25 xane hene.

Beşa 12. : Sernivîsa vê beşê weha ye: Xaneyâ dawî bi hibra sor e. Bêsernivîs e. Dewama beşa beriya vê beşê ye. Ji 18 xaneyan pêk tê.

Beşa 13. : Sernivîsa vê beşê weha ye: “Amedenî ‘Ebdulmuṭṭelib ez Ka‘be Be nezdi Amîne” Di vê beşê de 21 xane hene.

Beşa 14. : Sernivîsa vê beşê weha ye: “Amedenî Ḥalîme we Bordenî Muḥemmed Şellallahu ‘Eleyhî We Sellem” Di vê beşê de 84 xane hene.

Beşa 15. : Sernivîsa vê beşê weha ye: “Waqi‘at ki der Meyan Qabîleî Beni Sa‘dîyan Bûden” Di vê beşê de 69 xane hene.

Beşa 16. : Sernivîsa vê beşê weha ye: “Baz Awerdenî Ḥalîme Muḥemmed Şellallahu ‘Eleyhî we Sellem bi Mekkeî Şerîfe” Di vê beşê de 49 xane hene.

Beşa 17. : Sernivîsa vê beşê weha ye: “Ḥaza Munacatî Mewlana Muḥemmed Batê Raḥimâllahu Ta‘ala we Hem Xitmî Kitabî Mewlûd” Ev beşa dawî ye û ji 25 xaneyan pêk tê.

Ev nusxe bi vê xaneyê dawî dibe:

“Bo cemî‘ê Muslimînê şaliḥe

Bo feqîrê Bateyî el-fatîḥe”

2.1.4. Nusxeya Mahmûd Efendî (Mela Mahmûdê Bayezîdî)

Ev nusxe di kutupxaneyâ St. Petersburgê de, din av koleksiyona A. Jaba de ye. Destxet e. Mustensîxê wê Mela Mahmûdê Bayezîdî ye. Di 1274 H (1858 M) de hatiye nivîsandin. 261 rûpel in. Ji 18 beşan pêk tê. Têheva xaneyan 511 e. Bi hereke ye. Di serê kitêbê de : “Ḥaze Mewlî‘n-Nebî” hatiye nivîsandin. Li ser qaba kitêbê : “Kîtabî Mewlûdî Şerîf Kurmancî ye” hatiye nivîsandin. Di vê nusxeyê de beşa “Eşşelatu ‘aleyk” nîne; lê ya “Merḥeba ” heye.

Beşa 1. : Sernivîsa vê beşê weha ye: “Bismillahîrahmanirrahîm ” Di vê beşê de 11 xane hene.

Beşa 2. : Sernivîsa vê beşê weha ye: “Der Beyanî Feza‘ilî Mewlûdî Muḥemmed Şellallahî ‘Eleyhî we Sellem”: Ev beş ji 13 xaneyan pêk tê.

- Beşa 3. : Sernivîsa vê beşê weha ye: “Der Beyanî Feza’ilî Mewlûdî Muḥemmed Şellallahî Te‘ala ‘Eleyhî we Sellem”: Ev beş ji 21 xaneyan pêk tê.
- Beşa 4. : Sernivîsa vê beşê weha ye: “Beyanî Îbtidaî Nurî Muḥemmed Şellallahu ‘Eleyhî we Sellem”: Ev beş ji 32 xaneyan pêk tê.
- Beşa 5. : Sernivîsa vê beşê weha ye: “Der Beyanî Xulqetî Adem ‘Eleyhî Selam”: Ev beş ji 39 xaneyan pêk tê.
- Beşa 6. : Sernivîsa vê beşê weha ye: “Der Beyanî Amedenî Nûrî Muḥemmed Şellallahu Te‘ala ‘Eleyhî we Sellem”: Di vê beşê de 11 xane hene.
- Beşa 7. : Sernivîsa vê beşê weha ye: “Der Beyanî Bûdenî ‘Ebdullah we Întîqalî Nûrî Muḥemmed Şellallahu ‘Eleyhî we Sellem”: Di vê beşê de 34 xane hene.
- Beşa 8. : Sernivîsa vê beşê weha ye: “Der Beyanî Sebeb Dadenî Weheb Amîne lî Ebdullahî dadî weşt”: Di vê beşê de 20 xane hene.
- Beşa 9. : Sernivîsa vê beşê weha ye: “Der Beyanî Întîqalî Nûrî Muḥemmed Şellallahu ‘Eleyhî we Sellem”: Di vê beşê de 50 xane hene.
- Beşa 10. : Sernivîsa vê beşê weha ye: “Der Beyanî Waqî‘atî Muddetî Hêml”: Di vê beşê de 25 xane hene.
- Beşa 11. : Sernivîsa vê beşê weha ye: “Der Beyanî Wîladetî Ba Sa‘detî Muḥemmed Şellallahu ‘Eleyhî wessellem” : Di vê beşê de 20 xane hene.
- Beşa 12. : Sernivîsa vê beşê weha ye: “Mekanî Merheba lî eclî Mustefa”: Di vê beşê de 10 xane hene. Ev beş, beşa “Merheba” ye. Hejmara xaneyên ku bi “Merheba” dest pê dikin 8 e.
- Beşa 13. : Sernivîsa vê beşê weha ye: “Der Beyanî Mu‘cîzatî Nebî Şellallahu ‘Eleyhî Selam” Di vê beşê de 18 xane hene.
- Beşa 14. : Sernivîsa vê beşê weha ye: “Amedenî ‘Ebdulmuṭṭelîb ez Ka‘be Betered Amîne”: Di vê beşê de 21 xane hene.
- Beşa 15. : Sernivîsa vê beşê weha ye: “Amedenî Ḥalîme û Bordenî Muḥemmed Şellallahu ‘Eleyhî we Sellem” : Di vê beşê de 43 xane hene.
- Beşa 16. : Sernivîsa vê beşê weha ye: “Beyanî Weqîatî Ki der meyan Benî Sa‘diyan Peydâ Bûden”: Di vê beşê de 69 xane hene.
- Beşa 17. : Sernivîsa vê beşê weha ye: “Baza Awardenî Helîme Muḥemmed Şellallahu ‘Eleyhî we Sellem”: Di vê beşê de 49 xane hene.
- Beşa 18. : Sernivîsa vê beşê weha ye: “Der Beyanî Munacatî we Xetmî’l-Kîtab” : Di vê beşê de 25 xane hene.

Ev nusxe bi vê xaneyê dawî dibe:

“Bo cemî‘ê mu‘mînînê şalihe

Bo feqîrê Bateyî el-fatîhe”

2.1.5. Nusxeya Diyarbekirê

Ev nusxe, pêşî li D.Bakır Z. Gökalp İhtîsas Kütüphanesi (Kutupxaneya pisporî ya Z.Gökalp a Amedê) bû. Niha ev nusxe li Kutupxaneya destxetan ya Konya ye. Lê nusxeya dijîtal li vê kutupxaneya Z. Gökalp peyde dibe. Nimreya wê ya Diyarbekir 21 Hk 1916 ye. Di qeyda kutupxaneyê de dîroka istinsaxê 1880 ye. (Hicrî 1299) Li ser navê Ehmed el-Batî hatiye qeydkirin. Bi paçikê qahweyî hatiye te‘mîr kirin. Destxet e û bihereke ye. Bi filîgran e. Rengê rûpelan ne weke hev in. Di vê nusxeyê de sernivîsên beşan, xaneyên di serê rûpelê de, yên ku hatine binê rûpelê û yên ku hatine nava rûpelê bi hibra sor hatine nivîsandin. Xetên sor li deverna nayên xwendin. Ev nusxe 18 rûpel in. Çend rûpelê wê kêr in. Wê kêmaniyê, hejmara beş û xaneyan kêr kiriye. Ev nusxe, ji 10 beşan pêk tê. Têheva xaneyên wê, 243 ye. Di rûpela pêşî de berî ku metin dest pê bike, weke ser nivîsekê û bi hibra sor wisa hatiye nivîsandin: “ Haza Kitabu Mewlûdi Şerîf Bismillahîrrahmanirrahîm” Xaneya yekem jî ev e:

“Hemdê bê hed bo Xudayê ‘alemîn

Ew Xudayê daye me dînê mubîn”

Sernivîsên vê nusxeyê ev in:

Beşa 1. : Sernivîsa vê beşê weha ye: “Bismillahîrrahmanirrahîm” Di vê beşê de 11 xane hene.

Beşa 2. : Sernivîsa vê beşê weha ye: “Na’eta Muḥemmed Şellallahu ‘Eleyhî we Sellem” Di vê beşê de 13 xane hene.

Beşa 3. : Sernivîsa vê beşê weha ye: “Fazileta Mewldu’n-Nebî Şella ‘Eleyhî we’s-salam” Di vê beşê de 21 xane hene.

Beşa 4. : Sernivîsa vê beşê weha ye: “İbtida ya Xûlqiyeta Muḥemmed Şellallahû ta‘ala ‘Eleyhî we Sellem” Di vê beşê de 33 xane hene.

Beşa 5. : Sernivîsa vê beşê weha ye: “Xûlqeta Adem Peyxember Şellallahû ‘eleyhî we Sellem” Di vê beşê de 39 xane hene.

Beşa 6. : Sernivîsa vê beşê weha ye: “Întîqala Nûra Muḥemmed ba Ceddihi ‘Ebdulmuṭṭelib min Zûhrî Adem” Di vê beşê de 11 xane hene.

Beşa 7. : Sernivîsa vê beşê weha ye: “Întîqala Nûra Muḥemmed ji ‘Ebdulmuṭṭelib ba Abdullah” Di vê beşê de 35 xane hene.

Beşa 8. : Sernivîsa vê beşê weha ye: “Sabit Şuden dilî Amîne ra dehed bi Abdullah” Di vê beşê de 20 xane hene.

Beşa 9. : Sernivîsa vê beşê weha ye: “Întîqala Nûra Muḥemmed Şellallahu ‘Eleyhî We Sellem ba Amîne” Di vê beşê de 50 xane hene.

Beşa 10. : Sernivîsa vê beşê weha ye: “Muddetî Zuhûr li Hemil Şoden û Goftenî Amîne” ji ber ku rûpelên vê nusxeyê windayîne, di vê beşê de 10 xane tenê hene.

Rûpelên vê nusxeyê hatine qetandin. Li dawîya vê nusxeyê ev xane heye:

“Mahê sadîs hati Îbrahîm Xelîl

Da me mizgînî ji wî hemla Cemîl”

2.1.6. Nusxeya Ortahîsarê

Li ser kitêbê 1328 H hatiye nivîsandin; lê li dawîya kitêbê mustensîx li rexekî 1331 û li rexekî jî 1328 nivîsiye. Dîrokek ji van li gorî salnameya Rûmî ye û ya din jî li gorî salnameya Hicrî ye. Em karin bibêjin bi salnameya mîladî di 1910an de hatiye îstînsaxkirin. Dîsa li ser vê nusxeye mohra “Hüseyîn Galip Kütüphanesi Ortahîsar” heye. Ev nusxe 53 rûpel in. Bi hibra sor û reş hatiye nivîsandin. Destxet e. Bi hereke ye. Munstensîx ne diyar e. Ji 560 xaneyan pêk tê. Bi “Bismillahîrahmanirrahîm” dest pê dike. Xaneya yekem ev e:

“Hemdê bêhed bo Xudâyê ‘alemîn

Ew Xudayê daye me dînê mubîn”

Ji xeynî beşa dawî, beşên wê bêsernivîs in. Di beşa dawî de ev sernivîs heye: “Dibacê Mewlûdî Şerîf” Di navbera her beşê de ev xane dubare dibe:

“Ger divên hûn ji narê bit necat

Bi ‘eşq û şewqek hûn bibêjin eş-şalat”

Ev nusxe ji 16 beşan pêk tê. Beşa “Esselatu ‘eleyk” tê de nîne; lê ya “Merheba” heye. Hejmara beşên wê ev in:

- 1) Beşa yekem, ji 11 xaneyan pêk tê.
- 2) Beşa duyem, ji 13 xaneyan pêk tê.

- 3) Beşa sêyem, ji 21 xaneyan pêk tê.
- 4) Beşa çarem, ji 33 xaneyan pêk tê.
- 5) Beşa pêncemîn, ji 40 xaneyan pêk tê.
- 6) Beşa şeşemîn, ji 11 xaneyan pêk tê.
- 7) Beşa heftemîn, ji 35 xaneyan pêk tê.
- 8) Beşa heştemîn, ji 70 xaneyan pêk tê.
- 9) Beşa nehemîn, ji 25 xaneyan pêk tê.
- 10) Beşa dehemîn ji 54 xaneyan pêk tê.
- 11) Beşa yazdemîn, ji 21 xaneyan pêk tê.
- 12) Beşa duwazdemîn, ji 59 xaneyan pêk tê.
- 13) Beşa sêzdemîn, ji 24 xaneyan pêk tê.
- 14) Beşa, çardemîn ji 69 xaneyan pêk tê.
- 15) Beşa pazdemîn, ji 49 xaneyan pêk tê.
- 16) Beşa şazdemîn, ji 25 xaneyan pêk tê.

Ev nusxe bi vê xaneyê dawî dibe:

“Bo cemî‘ê Muslimînê şalihe
Bo feqîrê Bateyî el-fatihe”

2.1.7. Nuxxeya Gundê Batê

Ev nusxe di destê nevîçirkê Melayê Bateyî, Mela Nûrî de ye. Destxet e . 42 rûpel in. Ji 14 beşan pêk tê. Têheva xaneyan 481 e. Bi hereke ye. Hin rûpelên wê kêr in. 4 xaneyên pêşî nîn in. Dîroka îstînsaxê nediya e. Bi vê xaneyê dest pê dîke:

“Ew Xudayê bê nezîr û zû’l-Celal
Bêmîsal û bêheval û bêzewal”

Sernivîsên wê bi hibra sor hatine nivîsandin. Beşa yekem bêsernivîs e. Beşa “Eşşelatu ‘eleyk” û “Merheba” tê de nîne. Beş û sernivîsên vê nusxeyê ev in:

Beşa 1. Bêsernivîs e. Di vê beşê de 7 xane hene. 4 xaneyên ku di nusxeyên din de hene di vê beşê de kêr in.

Beşa 2. : Sernivîsa vê beşê weha ye: “Der Beyanî Na’atî Muḥemmed Şellallahu ‘Eleyhî We Sellem” Di vê beşê de 13 xane hene.

Beşa 3. : Sernivîsa vê beşê weha ye: “Der Fezailî Mewlûdî Muḥemmed Şellallahu ‘Eleyhî we Sellem” 10 xane hene, 11 xane kêmin. Li gorî nusxeyên din heta beşa din 56 xane kêmin. Ji ber vê kêmbûnê beşa dû vê beşê jî bêsernivîs e.

Beşa 4. : Sernivîsa vê beşê weha ye: Ev beş, ji ber qetandina rûpelan nîne.

Beşa 5. : Sernivîsa vê beşê weha ye: Ev beş ji ber qetandina rûpelan kêmin e. 29 xane ne.

Beşa 6. : Sernivîsa vê beşê weha ye: “Der Beyanî Întiqalî Nûrî Şellallahu ‘Eleyhî We Sellem.” Di vê beşê de 14 xane hene.

Beşa 7. : Sernivîsa vê beşê weha ye: “Întiqalî Nûrî Muḥemmed Şellallahu ‘Eleyhî We Sellem be ‘Abdullah” Di vê beşê de 32 xane hene.

Beşa 8. : Sernivîsa vê beşê weha ye: “Der Dil Uftadenî Weheb ki Amîne be ‘Abdullah dehed” Di vê beşê de 20 xane hene.

Beşa 9. : Sernivîsa vê beşê weha ye: “Întiqalî Nûrî Muḥemmed Şellallahu ‘Eleyhî We Sellem be Amîne” Di vê beşê de 50 xane hene.

Beşa 10. : Sernivîsa vê beşê weha ye: “Waqî’atî Muddetî Hemlî Amîne” Di vê beşê de 25 xane hene.

Beşa 11. : Sernivîsa vê beşê weha ye: “Wiladeti Ba Sa’adeti Muḥemmed Şellallahu ‘Eleyhî We Sellem” Di vê beşê de 24 xane hene.

Beşa 12. : Sernivîsa vê beşê weha ye: “Haṣa Mewziu’l-Qiyami Ta’zîman li’l-Wiladeti (Derkenar)” Di vê beşê de 19 xane hene.

Beşa 13. : Sernivîsa vê beşê weha ye: “Amedenî ‘Ebdulmuṭṭelib ez Ka’be Benezdi Amîne” Di vê beşê de 21 xane hene.

Beşa 14. : Sernivîsa vê beşê weha ye: “Amedenî Ḥalîme Sa’adenu û Berdî Muḥemmed Şellallahu ‘Eleyhî We Sellem” Di vê beşê de 84 xane hene.

Beşa 15. : Sernivîsa vê beşê weha ye: “Waqî’ati ki Der Meyan Beni Sa’diyan Peyda bu deh” Di vê beşê de 69 xane hene.

Beşa 16. : Sernivîsa vê beşê weha ye: “Baz Awirdenî Ḥalîme Muḥemmed Şellallahu ‘Eleyhî We Sellem” Di vê beşê de 36 xane hene. Ji vê xane ya xwarê û pêve nîne. Nusxe bi vê xaneyê xelas dibe:

“Bo Muḥemmed her zeman û her mekan

Şed hezaran nobedar û pasiban”

2.2. Çapên Mewlûdê

2.2.1. Çapa Haziq

Ev nusxe di sala 1313ê hicrî, 1895ê mîladî de ji aliyê Haziq ve hatiye nivîsandin. Ev nusxe bi ruxseteke fermî li Sitenbolê çap bûye. Lewra di kitêbê de: “Mearîf Nezaretî celîlesinin ruxsetiyê teb olmîştir.”⁸¹ hatiye nivîsandin. Ev nusxe 48 pel in û ji 16 beşan pêk tê. Di Mewlûdê de 557 xane hene. Li ser kitêbê “Mewlûda Melayê Bateyî” hatiye nivîsandin. Mustensîxê vê nusxeyê di rûpela pêşî de pesnê Melayê Bateyî daye. Navê Haziq Derwîş Nihad û dîroka kitêbê jî li wir hatiye nivîsandin. Di serê mewlûdê de îfadeya “Haza Mewlûdu’n-Nebî Şellahu Ta’ala ‘Eleyhî We sellem” heye. Di bin re îfadeya “Bismillahîrahmanirrahîm” heye û xaneyê yekem ev e:

“Hemdê bê hed bo Xudayê ‘alemîn

Ew Xudayê daye me dînê mubîn”

Li dawiya wê rûpelek û nîv beşa duyan heye. Beş û sernivîsên vê nusxeyê ev in:

Beşa 1. : Sernivîsa vê beşê weha ye: “Bismillahîrahmanirrahîm” Di vê beşê de 11 xane hene.

Beşa 2. : Sernivîsa vê beşê weha ye: “Der na’atî Muḥemmed Şellallahu ‘Eleyhî We Sellem” Ev beş ji 13 xaneyan pêk tê

Beşa 3. : Sernivîsa vê beşê weha ye: “Der Fezailî Mewlûdu’n-Nebî Şellallahu ‘Eleyhî We Sellem” Ev beş ji 21 xaneyan pêk tê.

Beşa 4. : Sernivîsa vê beşê weha ye: “Der İbtidâî Xulqiyetî Nûrî Muḥemmed Şellallahu ‘Eleyhî we Sellem” Ev beş ji 33 xaneyan pêk tê.

Beşa 5. : Sernivîsa vê beşê weha ye: “Der Xulqiyetî Adem Pêxember ‘Eleyhî Selam” Ev beş ji 39 xaneyan pêk tê.

Beşa 6. : Sernivîsa vê beşê weha ye: “Der İntisabî Muḥemmed Şellallahu ‘Eleyhî We Sellem” Di vê beşê de 11 xane hene.

Beşa 7. : Sernivîsa vê beşê weha ye: “Der İntiqalî Nûrî Muḥemmed Şellallahu Teala ‘Eleyhî We Sellem” Di vê beşê de 35 xane hene.

Beşa 8. : Sernivîsa vê beşê weha ye: “Der Qeşetî Qesdi’l-Cuhûd Qetlî ‘Abdullah Bin ‘Ebdulmuṭṭelib” Di vê beşê de 20 xane hene.

⁸¹ “Bi destûra wezaretê berz ya perwerdehiyê hatiye çapkirin.”

Beşa 9. : Sernivîsa vê beşê weha ye: “Der Xutbeî Amîne we Aqdî Nikahî ‘Abdullah” Di vê beşê de 50 xane hene.

Beşa 10. : Sernivîsa vê beşê weha ye: “Der Muddetî Waqî’atî Hemlî Amîne” Di vê beşê de 25 xane hene.

Beşa 11. : Sernivîsa vê beşê weha ye: “Der Wiladetî Muḥemmed Şellallahu ‘Eleyhî We Sellem” Di vê beşê de 74 xane hene.

Beşa 12. : Sernivîsa vê beşê weha ye: “Amedenî Ḥalîme we Bordenî Muḥemmed Şellallahu ‘Eleyhî We Sellem” Di vê beşê de 84 xane hene.

Beşa 13. : Sernivîsa vê beşê weha ye: “Der ... ” Ev beş ji 69 xaneyan pêk tê.

Beşa 14. : Sernivîsa vê beşê weha ye: “Ḥalîme der Berê Muḥemmed Şellallahu ‘Eleyhî We Sellem” Di vê beşê de 49 xane hene.

Beşa 15. : Sernivîsa vê beşê weha ye: “Der Munacatî Xitmi’l-Kitab” Ev beşa dawî ye û ji 12 xaneyan pêk tê.

Beşa 16. : Sernivîsa vê beşê weha ye: “ Haza mewziu Dua...” Ev beşa dawî ye û ji 13 xaneyan pêk tê.

2.2.2. Çapa Berlînê

Ev nusxe, di kitêba “Kurdische Texte” de, li Berlînê, di sala 1903an de hatiye çapkirin. Berhevkarê wê A. Von Le Coq e. Ev çap, ji ber destxeta Mela Muhemedê Wanî hatiye nivîsandin. Mela Muhemedê Wanî, ev destxet, di 9’ê Zilqe’dê roja sêşemê 1887 (H 1305) nivîsandiye.⁸²

Di vê kitêbê de hin tekstên Kurdî jî hene. Beşa mewlûdê 48 rûpel in. Destxet weke xwe hatiye çapkirin û bi hereke ye. Ji 20 beşan pêk tê. Têheva xaneyan 576 e. Di dawiya nusxeyê de bi erebî 2 rûpelên duayan hene. Beriya ku teksta mewlûdê dest pê bike di serî de îfadeya “Haza Mewlûdu’n-Nebîyyi’l-Ḥaşîmî Bi’l-Luxatî’l-Kurdiyyî ehli’l-Iraqî” dûvre “Bismillahîrahmanirrahîm” heye û xaneya yekem ev e:

“Hemdê bê hed bo Xudayê ‘alemîn

Ew Xudayê daye me dînê mubîn”

Sernivîsên vê nusxeyê ev in:

⁸² Zeynelabidîn Zinar, Mewlûd, Fırat Yayınları, İstanbul , 1992 , r.6

- Beşa 1. : Sernivîsa vê beşê weha ye: “Bismillahirrahmanirrahîm” Di vê beşê de 11 xane hene.
- Beşa 2. : Sernivîsa vê beşê weha ye: “Der Na’atî wesfî Seyyîdîna Muḥemmed Şalla ‘alayhi Rabbûna’l-ahed.” Di vê beşê de 13 xane hene.
- Beşa 3. : Sernivîsa vê beşê weha ye: Der Fezaîlî Mewlîdî Muḥemmed Xatîmû Resûlî Rabbîhi’l-Ahed”. Di vê beşê de 21 xane hene.
- Beşa 4. : Sernivîsa vê beşê weha ye: “Der İbtîdaî Nûrî Muḥemmed ji Nûra Wahîdû’l-Ahed”. Di vê beşê de 33 xane hene.
- Beşa 5. : Sernivîsa vê beşê weha ye: “Der Xilqata Adem Peyxamber zehere minhu Nûru’n-Nebiyî’l-muftexer” Di vê beşê de 27 xane hene.
- Beşa 6. : Sernivîsa vê beşê weha ye: “Fî Beyanî Eklî Adem ‘Eleyhî Selam Mine’ş-Şeceratî” Di vê beşê de 12 xane hene.
- Beşa 7. : Sernivîsa vê beşê weha ye: “Der İntiqalî Nûrû’l-Hebîb ji Adem ba Ceddihi ‘Ebdulmuṭṭelib” Di vê beşê de 11 xane hene.
- Beşa 8. : Sernivîsa vê beşê weha ye: “Der İntiqalîhî ji ‘Ebdulmuṭṭelib ba Weledihî ‘Abdullahî Waledî’l-Munqelib” Di vê beşê de 35 xane hene.
- Beşa 9. : Sernivîsa vê beşê weha ye: “Der Sabit Şuden ba Amîne Adāwetî Cûhûdān bi Abdullah” Di vê beşê de 21 xane hene.
- Beşa 10. : Sernivîsa vê beşê weha ye: “Der İntiqalî Nûru’l-Mustafa ba Walidetihî Amîne Sahib Wefa” Di vê beşê de 50 xane hene.
- Beşa 11. : Sernivîsa vê beşê weha ye: “Der Muddetî Zuhurî Hamil Şuden we Guften bi Kulli Mah Be Merhabayî Enbiyan” Di vê beşê de 25 xane hene.
- Beşa 12. : Sernivîsa vê beşê weha ye: “Der Wiladetî Muḥemmed Seyyidu’l-Kewneyn we Şeffî’l-Muznibin fi’d-Dāreyn” Di vê beşê de 25 xane hene.
- Beşa 13. : Sernivîsa vê beşê weha ye: “Der İkrāmî Qiyam li Wiladetî Xayri’l-Enam ‘Eleyhî Efdelu’ş-Şalatî We’s-selam” Ev beş, beşa “Esselatu aleyk” e. Di vê beşê de 15 xane hene.
- Beşa 14. : Sernivîsa vê beşê weha ye: “Der Medhî Hebîbî İlahî Seyyidina Muḥemmed ki Sahibi ‘İzz û Cahî” Ev beş, beşa “Merheba” ye. Di vê beşê de 28 xane hene.
- Beşa 15. : Sernivîsa vê beşê weha ye: “Der ‘Ebdulmuṭṭelib Talebe Ka’behu ba bi Nezdi Şerefî Amîne” Di vê beşê de 22 xane hene.
- Beşa 16. : Sernivîsa vê beşê weha ye: “Der Ridā’atî Muḥemmed Weledî ‘Abdullah ba Hālime ki ji nesla Sa’diye” Di vê beşê de 84 xane hene.

Beşa 17. : Sernivîsa vê beşê weha ye: “Der Waqî‘atî İkrâmî Hêbibî Raḥman Berekat Diket nav Sa’dîyan” Di vê beşê de 69 xane hene.

Beşa 18. : Sernivîsa vê beşê weha ye: “Der Hali Awazi kirî ji Hâlîme ba Muḥemmed Muştafa di Rewan bike” Di vê beşê de 49 xane hene.

Beşa 19. : Sernivîsa vê beşê weha ye: “Der Wesfî Şewqî Nurî Muḥemmed ta heft tabaq Asiman Warid” Di vê beşê de 12 xane hene.

Beşa 20. : Sernivîsa vê beşê weha ye: “Der Munacatî Xetmu’l-Kitab we Mewlidî Resulî’l-Melîkî’l-Wahab” Di vê beşê de 13 xane hene.

Ev nusxe bi vê xaneyê dawî dibe:

“Bo cemî‘ê Muslimînê şaliḥe
Bo feqîrê Bateyî el-fatiḥe”

2.2.3. Çapa Misrê

Ev nusxe, li Stenbolê di kutupxaneyê Alî Emîrî de ye. Jimara qeyda wê AEmnz 1369 e. Heman çap di kutupxaneyê Zanîngeha Erziromê de jî heye û jimara qeyda wê 9258/SÖ ye. Matbû û bêhereke ye. Ji aliyê Kurdîzade Ahmed Ramîz ve di sala 1324 ê hicrî, 1907 ê mîladî de li Misrê hatiye çapkirin. Heman çap di kutupxaneyê Erzurumê de bi jimareya SÖ/ 9258 ve qeyitkirî ye. Di rûpela pêşî de navê wê weke “Mevlûdu’n-Nebî” hatiye nivîsandin. Di bin re: “ Bi’l-Lûxatîl- Kurdiye” hatiye nivîsandin. Tevlî duaya dawî 33 rûpel in. Ji 18 beşan pêk tê. Têheva xaneyan 576 e.

Ev nusxe bi “Bismillahîrahmanirrahîm” dest pê dike. Xaneyê yekem ev e:

“Hemdê bê hed bo Xudayê ‘alemîn

Ew Xudayê daye me dînê mubîn”

Ji xeynî beşa dawî, li dawîya hemû beşan heman xane heye:

“Şallû ‘eleyhî wesellimû teslîma

Heta tenaû Cenneten we ne‘îma”

Ev nusxe ji 18 beşan pêk tê û hejmara haneyên beşan li jêrê hatine nîşandan:

- 1) Beşa yekem, ji 11 xaneyan pêk tê.
- 2) Beşa duyem, ji 13 xaneyan pêk tê.
- 3) Beşa sêyem, ji 21 xaneyan pêk tê.
- 4) Beşa çarem, ji 33 xaneyan pêk tê.
- 5) Beşa pêncemîn, ji 39 xaneyan pêk tê.

- 6) Beşa şeşemîn, ji 11 xaneyan pêk tê.
- 7) Beşa heftemîn, ji 35 xaneyan pêk tê.
- 8) Beşa heştemîn, ji 20 xaneyan pêk tê.
- 9) Beşa nehemîn, ji 50 xaneyan pêk tê.
- 10) Beşa dehemîn, ji 25 xaneyan pêk tê.
- 11) Beşa yazdemîn, ji 25 xaneyan pêk tê.
- 12) Beşa duwazdemîn, ji 15 xaneyan pêk tê. Beşa ku “Esselatu Aleyk” tê de ye.
- 13) Beşa sêdemîn, ji 30 xaneyan pêk tê. Beşa “Merheba..” ye.
- 14) Beşa çardemîn, ji 21 xaneyan pêk tê.
- 15) Beşa panzdemîn, ji 84 xaneyan pêk tê.
- 16) Beşa şazdemîn, ji 69 xaneyan pêk tê.
- 17) Beşa huvdemîn, ji 49 xaneyan pêk tê.
- 18) Beşa hijdemîn, ji 25 xaneyan pêk tê.

Di vê nusxeyê de beşa, “Es-selatu ‘eleyk es-selamû ‘eleyk” heye. Dûvre beşa “Merheba” dest pê dike. Beriya vê xaneyê jî tu xane nînin. Di nusxeya Kurdîzade de beşa “Merheba” û beşa mûcîzeyên şeva wîladeta Pêxember, ji hev nehatine veqetandin. Ew beş di nusxeyên din de bi vê xaneyê dest pê dike:

“Sicde bir her wê demê an nûrê can
Dest hilîrandî bi sûyê asîman”

Ev nusxe bi vê xaneyê dawî dibe:

“Bo cemî‘ê Muslimînê şalihe
Bo feqîrê Bateyî el-fatihe”

2.2.4. Çapa Dersaadetê

Ev nusxe di sala 1909an de li Dersaadetê (Stenbol) hatiye çapkirin. Li serê “Mewlîdî’n-Nebî” hatiye nivîsandin. Li gorî hin riwayetan, ji aliyê Şefîq Erwasî ve li çapxaneya Ahmet Kamîl hatiye çapkirin. Me ev nusxe di kutupxaneya Erzurumê de dît. Jimareya qeyda wê: 24521/ SÖ ye. Bi tîpên erebî û bihereke ye. Ji 564 xane û 19 beşan pêk tê. Beşa “Merheba” beşeke serbixwe ye. Tevlî duaya dawî 47 rûpel in. Sernivîsên wê nînin. Di navbera her beşê de ev xane dubare dibe:

“Ger divêtin hûn ji narê bin necat
Bi ‘eşq û şewqek hûn bibêjin eş-şalat”

2.2.5. Çapa Xulûsî

Ev nusxe di sala 1925an de li Dersaadetê (Stenbol) li çapxaneya Xulûsî hatiye çapkirin. Li serê “Mewlîda Sa‘adeta Hazretî Pêxember” hatiye nivîsandin. Ji bilî vê sernivîsê ev nusxe ji her alî ve dişibe çapa Dersaadetê. Ev nusxe, di kutupxaneya Erzurumê de bi jimareya: 9251/ SÖ qeyitkirî ye. Bi tîpên erebî û bihereke ye. Ji 564 xane û 19 beşan pêk tê. Beşa “Merheba” beşeke serbixwe ye. Tevlî duaya dawî 47 rûpel in. Sernivîsên wê nînin. Di navbera her beşê de ev xane dubare dibe:

“Ger divêtin hûn ji narê bin necat
Bi ‘eşq û şewqek hûn bibêjin eş-şalat”

2.2.6. Çapa Osman Beg

Ev nusxe di sala 1932an de li çapxaneya Osman Beg hatiye çapkirin. Heman çapxane di 1974an de çapeke din jî kiriye. Li serê “Mewlîda Nebî” hatiye nivîsandin. Ji bilî vê sernivîsê ev nusxe ji her alî ve dişibe çapa Dersaadetê. Ev nusxe, di kutupxaneya Erzurumê de bi jimareya: 24523/ SÖ qeyitkirî ye. Bi tîpên erebî û bihereke ye. Ji 564 xane û 19 beşan pêk tê. Beşa “Merheba” beşeke serbixwe ye. Tevlî duaya dawî 48 rûpel in. Sernivîsên wê nînin. Di navbera her beşê de ev xane dubare dibe:

“Ger divêtin hûn ji narê bin necat
Bi ‘eşq û şewqek hûn bibêjin eş-şalat”

2.2.7. Çapa Muhammed Şakir

Ev nusxe, li Konyayê di Kutupxaneya Berhemên Desxet de ye. Jimara qeyda wê BB0000023686 e. Matbu û bi hereke ye. Ji aliyê Muhammed Şakir ve di sala 1372 ê hicrî, 1953 ê mîladî de bi tîpên erebî hatiye nivîsandin û li çapxaneya Osman Beg hatiye çapkirin. Li dawiya nusxeyê dîroka H 1374 jî hatiye nivîsandin. Lê me, dîroka rûpela pêşî bingeh girt. Di rûpela pêşî de navê wê wekî “Mevlûdu’n-Nebî” hatiye nivîsandin. Tevlî duaya dawî 48 rûpel in. Ji 19 beşan pêk tê. Ji bilî xaneya ku dubare dike têheva xaneyan 564 e. Sernivîsên wê nînin û beşên wê bi xaneya dubarekirî hatine

veqetandin. Ev nusxe, heman çapemeniya çapa Dersaadetê ye ku di 1909an de hatibû çapkirin. Ev çap ji aliyê Çapxaneyê Ayfa ve dîsa hatiye çapkirin lê dîroka çapê li ser kitêbê nehatiye nivîsandin. Heman çap, li Urmiye di sala 1964an de bi navê “Mewlûdname” dîsa hatiye weşandin.

Ev nusxe bi “Bismillahîrahmanirrahîm” dest pê dike. Xaneya yekem ev e:

“Hemdê bê hed bo Xudayê ‘alemîn

Ew Xudayê daye me dînê mubîn”

Ji xeynî beşa dawî, li dawiya hemû beşan heman xane heye:

“Ger divêtin hûn ji narê bin necat

Bi ‘eşq û şewqek hûn bibêjin eş-şalat”

2.2.8. Çapa Şêx Muşerref

Ev nusxe, li gorî agahiyên ku Tehsîn Îbrahîm Doskî dane, di 1957an bi destxeta Şêx Muşerref hatiye çapkirin. Çend carên din jî li Sêrtê, ji aliyê M. Vefa Özcan û Hüseyin Yiğit ve hatiye çapkirin; lê mixabin dîroka çapan nehatiye nivîsandin. Ji 19 beş û 564 xaneyan pêk tê. Bi tûpên erebî hatiye nivîsandin. Destxet e û bi hereke ye. Beşa “Merheba” tê de heye. Li dawiya kitêbê duayek dirêj jî heye. Tevlî vê duayê hejmara rûpelan 159 e. Ji ber nusxeya Dersaadetê hatiye îstînsaxkirin. Ev nusxe Bi “Bismillahîrahmanirrahîm”dest pê dike. Xaneya yekem ev e:

“Hemdê bêhed bo Xudâyê ‘âlemîn

Ew Xudâyê dāye me dînê mubîn”

Sernivîsên wê nînin. Di navbera her beşê de ev xane dubare dibe:

“Ger divêtin hûn ji narê bin necat

Bi ‘eşq û şewqek hûn bibêjin eş-şalat”

2.2.9. Çapa Zeynelabidînê Amidî

“Şerhanî lî’l-Menzumeteyn” li Stenbolê çap bûye. Ev kitêb ji 2 kitêban pêk tê. Yêk jê “Nechu’l-Enam” e û yek jê jî Mewluda Bateyî ye. Beşa Mewlûdê 135 rûpel in û 1391 H (1971 M) de hatiye îstînsaxkirin. Heman berhem, di sala 2011an de bi navê “Behcetü’l-Enam Bi Şerhî mewludî sahîbî’l-Meqam fî yewmu’l-Qiyam” li Diyarbekir dîsa hatiye çapkirin. Zeynelabidîn Amidî, ev kitêb weke şerhê amade kiriye. 581 xaneyê Mewlûdê tê de hene. Ji 17 beşan pêk tê. Pêşî xane û di bin re jî şerha wan bi

erebî nivîsandiye. Ferqa hin nusxeyan jî şanî me kiriye. Amidî, li gorî naveroka beşan, ew bi erebî bi nav kirine. Li dawiya kitêbê ferhengokek heye û li gorî beşan hatiye amadekirin. Li dawiya her beşê ev xane dubare dibe:

“Ger divêtin hûn ji narê bit necat
Bi ‘eşq û şewqek hûn bibêjin eş-şalat”

2.2.10. Çapa Sadiq Behadîn Amedî

Navê kitêbê “Mewlûda Melayê Bateyî”ye. Amadekarê wê Sadiq Behadîn Amedî ye. Li matbeya Wela li Bexdatê di 1982an de çap bûye. Amadekar ev kitêb weke “cem‘ û tehqîq” amade kiriye. Ev kitêb ji 2 berheman pêk tê. Yek Mewlûda Bateyî ye ya din jî “Aqîda Îmanê” ya Ehmedê Xanî ye. 192 rûpel in. Bi tîpên erebî hatiye nivîsandin. Matbû ye. Mewlûd berawirdkirina 5 nusxeyan e: Destxeta Ehmed (E), Destxeta Muhemmed Abdullah (MA), Destxeta Abdullah Golî (AG), Destxeta Hewlêr (H) û Çapa Berlîn a A. Von Le Coq (L). Ferqa wan di tîbiniyan de şanî me dike. Ji 19 beşan pêk tê. Jimara xaneyan 572 ye.

2.2.11. Çapa Zeynelabidîn Zinar

Zeynelabidîn Zinar, Mewlûda Bateyî cara pêşî di 1987 an de, li Stockholmê di nav Weşanên Roja Nû de bi tîpên latinî daye çap kirin. Zinar, di vê çapê de nusxeya Misrê ku ji aliyê Kurdîzade Ramiz ve hatiye çap kirin binyat girtiye. Pişt re, di 1992 an de li çapxaneyê Fîrat de çap kiriye. Nusxeya di destê me de ev e. Di vê çapê de Zinar, nusxeya Misrê û ya A. Von Le Coq (destxeta Mela Muhemedê Wanî) berawird kiriye, ferqa nusxeyan di tîbiniyan de şanî me kiriye û tevî guhertinan ji nûve bi tîpên latinî çap kiriye. Axaftin, ayet yan jî hedîs bi nivîseke reştir hatiye nîşandan. Mewlûda di vê çapê de ji 18 beşan pêk tê. Li dawiya her beşê ev xane dubare dibe:

“Ger divêtin hûn ji narê bit necat
Bi ‘eşq û şewqek hûn bibêjin eş-şalat”

2.2.12. Çapa Ebdulbasid Mihemed Ebdulsamed

Navê kitêbê “Mewlûda Nebî”ye. Amadekarê wê Abdulbasid Muhemmed Ebdulsamed e. Çapa yekem, di 2003 an de, di nava Weşanên Nûbiharê de, li Stenbolê çap bûye. Ev nusxe, 192 rûpel in. Bi tîpên erebî hatiye nivîsandin. Di çend rûpelên pêşî

de agahiyên li ser nav, jiyan û berhemên Bateyî hatine dayîn. Çend rûpel jî di derheqê caîzbûna civandina bi sebeba Mewlûdê de ne. Di vê nusxeyê de Mewlûd ji 570 xane û 19 beşan pêk tê û sernivîsên beşan bi Kurdî ne. Di dawiya her beşê de ev xane dubare dibe:

“Ger divêtin hûn ji narê bit necat
Bi ‘eşq û şewqek hûn bibêjin eş-şalat”

Amadekar, wateya peyv, hedîs û ayetan di têbiniyan de şanî me kiriye. Bêjeyên dubare, navên taybet, hedîs û ayet bi hibra sor hatine nîşandan.

2.2.13. Çapa Tehsîn Îbrahîm Doskî û Muhsîn Îbrahîm Doskî

Navê vê kitêbê “Melayê Bateyî Jiyan û Berhem” e. Ji aliyê Çapxaneyê Spîrêz ve di 2005 an de li Hewlêrê hatiye çapkirin. Mewlûda Bateyî weke beşekê cih girtiye. Navê vê beşê “Mewlûdnameya Bateyî” ye. Ev mewlûd li gorî nusxeya Mîlî Kutupxaneyê, Misir, Orta Hîsar, Dihokê, Şêx Muşerref hatiye çapkirin. Bi tîpên erebî hatiye çapkirin û matbû ye. 4 rûpel li ser agahiyên mewlûdê ne. Metnê mewlûdê 79 rûpel in. Ji 19 beşan pêk tê. Li ser her beşê sernivîsek heye. Sernivîs bi Kurdî ne. Di vê nusxeyê de 572 xane hene. Li dawiya her beşê ev xane dubare dibe:

“Ger divêtin hûn ji narê bit necat
Bi ‘eşq û şewqek hûn bibêjin eş-şalat”

2.2.14. Çapa Mela Musa Celalî Bayezîdî

Ev çap di 2010an de li Stenbolê bi tîpên erebî hatiye çapkirin û ji du kitêban pêk tê. Ya pêşî nivîskarê wê Mela Musa Celalî Bayezîdî ye û navê kitêbê “Feyzu’l-Qarîrî’l-Mebde’ Şerhî’l-Mewlûdî’l-Kurdî” ye. Ev berhem, şerha mewlûda Bateyî ye. Bi tîpên matbû hatiye çapkirin. Hejmara rûpelên wê 268 e. Kitêba duyem ya Mela Nurullah el-Xeyûtî El-Gudiskî ye û navê wê jî “Sehli’l-Mewrid fî Şerhî’l-Mewlûd” e. Ev berhem jî şerha mewlûda Bateyî ye. Weke destxetê hatiye çapkirin. Ji ber çapa Osman Beg hatiye îstînsaxkirin û ji 262 rûpelan pêk tê.

2.2.15. Çapa M. Xalid Sadinî

Navê kitêbê “Mela Huseynê Bateyî Jiyana Berhem û Helbestên Wî” ye. Amadekarê wê M. Xalid Sadinî ye. Çapa duyem ya vê kitêbê di 2011an de bûye. Kitêb, di bin navê Weşanên Nûbihar Stenbolê çap bûye. Di vê kitêbê de mewlûd tenê nîne. Herwiha jiyana Bateyî û berhemên wî yên din jî tê de hene. Beşa mewlûdê 59 rûpel in û bi tîpên latînî hatiye çapkirin. Ev çap bitevayî li gorî nusxeya Tehsîn Îbrahîm Doskî hatiye nivîsandin. Li dawîya kitêbê ferhengokek heye. Di vê nusxeyê de Mewlûd ji 18 beşan pêk tê û sernivîsên hemû beşan bi Kurdî ne. Di vê çapê de 570 xane hene. Li dawîya her beşê ev xaneya jêrîn dubare dibe:

“Ger divêtin hûn ji narê bit necat

Bi ‘eşq û şewqek hûn bibêjin eş-şalat”

2.2.16. Çapa Huseyn Şemrexî

Navê kitêbê “Mewlûd” e. Amadekarê wê Huseyn Şemrexî ye. Çapa yekem di 2011 an de ye. Kitêb, di nava Weşanên Nûbihar li Stenbolê çap bûye û 182 rûpel in. Di vê kitêbê de mewlûd, hem bi tîpên erebî hem bi tîpên latînî hatiye nivîsandin. Di pêşgotinê de bi kurtasî behsa jiyana û berhemên Melayê Bateyî kiriye. Li dawîya kitêbê ferhengokek heye. Mewlûda di vê çapê de ji 19 beşan pêk tê. Di vê nusxeyê de 568 xane hene. Sernivîsên hemû beşan bi Kurdî ne. Li dawîya her beşê ev xane tê dubare kirin:

“Ger divêtin hûn ji narî bin necat

Bi ‘eşq û şewqek hûn bibêjin eş-şalat”

Ev çap bitevayî li gorî nusxeya Mîllî Kutupxaneyê û ya Dihokê hatiye nivîsandin. Di nava rûpelan de ferhengokek jî heye.

Tabloya Nusxeyên Mewlûda Bateyî

NUSXE	Dîrok	Destxet an çap	Semivîs	Hejmara xaneyan	Hejmara beşan	Beşa merheba	Beşa esselatu 'eleyk	Xaneya dubare	Tîp	Li ber kîjan nusxeyê hatiye nivîsandin
Muhemedê Muksî	1792	Destxet	Farisî	559	16	Heye	Nîne	Nîne	Erebî	
Millî Kütüphanê	1824	Destxet	Farisî	557	16	Heye	Nîne	Nîne	Erebî	
Dihok	1854	Destxet	Farisî	546	16	Nîne	Nîne	Nîne	Erebî	
Mahmud Efendî (M. Mahmudê Beyazidî)	1858	Destxet	Farisî	511	18	Heye	Nîne	Nîne	Erebî	Muhemedê Muksî
Diyarbakir	1880	Destxet	Kurdî	243	10	Nîne	Nîne	Nîne	Erebî	
Haziq	1895	Çap	Farisî	557	16	Nîne	Nîne	Heye	Erebî	
Berlîn	1903	Çapa wek destxet	Farisî	576	20	Heye	Heye	Nîne	Erebî	Mela Muhammedê Wanî
Misir	1907	Çap	Nîne	576	18	Heye	Heye	Heye	Erebî	
Dersaadet	1909	Çap	Nîne	564	19	Heye	Nîne	Heye	Erebî	
Ortahisar	1910	Destxet	Nîne	560	16	Heye	Nîne	Heye	Erebî	
Gundê Batê	--	Destxet	Farisî	481	16	Nîne	Nîne	Nîne	Erebî	
Xulûsî	1925	Çap	Nîne	564	19	Heye	Nîne	Heye	Erebî	Dersaadet
Osman Beg	1932	Çap	Nîne	564	19	Heye	Nîne	Heye	Erebî	Dersaadet
Muhemmed Şakir	1953	Çap	Nîne	564	19	Heye	Nîne	Heye	Erebî	Dersaadet
Şêx Muşerref	1957	Çap	Nîne	564	19	Heye	Nîne	Heye	Erebî	Dersaadet
Zeynelabidîn Amidî	1971	Çap	Erebî	581	17	Heye	Nîne	Heye	Erebî	
Sadiq Bahaddîn Amedî	1982	Çap	Farisî	572	19	Heye	Heye	Heye	Erebî	Ehmed, M. Abdullah Berlîn, A. Golî Hewlêr
Zeynelabidîn Zinar	1992	Çap		576	18	Heye	Nîne	Heye	Latinî	Misir û Berlîn
A.Basîd Muhammed A.Samed	2003	Çap	Kurdî	570	19	Heye	Nîne	Heye	Erebî	
Tehsîn û Muhsîn Îbrahîm Doskî	2005	Çap	Kurdî	572	19	Heye	Nîne	Heye	Erebî	
Mela Musa Celalî El-Beyazidî	2010	Çap	Erebî	564	19	Heye	Nîne	Heye	Erebî	Osman Beg
M.Xalid Sadînî	2010	Çap	Kurdî	570	18	Heye	Nîne	Heye	Latinî	Tehsîn Î. Doskî
Huseyin Şemrexî	2011	Çap	Kurdî	568	19	Heye	Nîne	Heye	Erebî û Latinî	Dihok û Millî Kutupxane

METNÊ BI KRÎTÎK

1. RÊBAZA AMADEKIRINA METNÊ

Xebata “Edîsyon Qritîk” ê ji 2 beşan pêk tê: Rexneya derveyî metnê û rexneya hundirê metnê.⁸³ Di vê xebatê de me li ser “Rexneya hundirê metnê” kar kir. Mebesta me ev bû ku em metnekî nêzîkî orjînalê wê derxin meydanê. Di encamê de me dît ku “Rexneya Hundir”, beriya her tiştî hunera dîtîne û sererastkirina metnê ye. Ji xwe ku mirov bala xwe baş nede metnê, dîtina cudahiyan naderkeve holê. Wekî rexnedarekî metnê, li hemberî metnê peywira me pasîf bû. Ev pasîfbûn, ji hendezaî û sebra me dihat.

Di amadekirina bi edîsyon krîtîka Mewlûda Melayê Bateyî de me ev xalên jêrê li ber çavan girtin:

A) PEYWENDA METNÊ

Peyv, qîmetê xwe ji wateya peyvên din distîne û ev jî peywenda metnê derdixe pêş. Di vê xebatê de, li ser peyvan, du xebatên bingehîn hatine kirin ku ev rê li ber mirov vedikin ku mirov metnê rast fêm bike: Pêşî bi xebata ferhengê kifşkirina wateyê, paşê li gorî peywenda metnê xebata hilbijartina wateyan. Hilbijartin, ji aliyekî ve cudahiyeke hişmendî ye û ji aliyekî din ve pêvekirin, tevîhevkerin û lihevanîn e. Vê hilbijartina hişmendî, pewîste ji nav van çewtiyên jêrîn biryar daba. Ev çewtî bêtir li ser tîpên ku çewt hatine nivîsandin û cih guhertina xaneyan e:

1) Ji ber ku di hin nusxeyan de hin tîpên bixal weke:

- B (ب), P (پ), Y (ی)
- C (ج), Ç (چ)
- F (ف) Q (ق)
- W (و), V (و)

ji aliyê mustensixan ve bi nuqtayekê an bi du nuqtayan çewt hatine nivîsandin; me li gorî wateya xaneyê hin peyv hilbijartin. Wekî mînak:

⁸³ Mertol Tulum, Tarihi Metin Çalışmalarında Usul, Deniz Kitapevi, İstanbul, 2000

163 qetla] fetla HDN
 344 dayîn] dabîn H, AG
 350 pustanê] bustanê HDN, B
 423 bûse] pûse HDN
 426 pakîze] bakîze M
 438 ba] ya GB
 446 cihê] çihê D
 473 çerxê] cerxê M
 514 bes] pes HDN
 541 hişyarê] hişbarê HDN

2) Di hilbijartina peyvên “Ev] ew” an de me li gorî peywendê û li gorî nêzîkayî-
 dûrayiyê biryar da. Wekî mînak:

32 Hem ji şeyxan bû rîwayet **ev** xeber
 Şeyxê Kerxî, Fexrê Razî ba dîger

111 Rojekê **ew** der sucudê bêmefer
 Pir girî û hem li ‘erşê kir nezer

3) Sererastkirina çewtiyên tîpên din jî hebûn. Wekî mînak:

337 da] ta B
 395 dayine] daniye MK
 439 dîdara] dindara HDN
 519 geybiyanê] gebyanê GB

4) Di hilbijartina hin peyvan de me devoka Gundê Bate’yê hilbijart:

169-457 gehiştê] gihiştê MK
 43 pir] pur D, B, MK, OH
 44 wekî] weku E, H
 124 pişta] puşta D, B, GB, OH
 170 ketne] keftine D
 314 ket] keft D
 339 birsan] pursan MK bursan B, D

347 bîrsan] bûrsan D
351 pîrsîn] pûrsî D
402 kerê] xerê MK
416 çi kem] çi kim ji xeynê HDN hemu nusxe
522 dîn e] dêhn e B,MA,E

5) Di hin nusxeyan de carinan cihê xaneyan an cihê risteyan hatibûne guhertin. Me li gorî peywendê û honaka metnê cihê wan tespît kir:

Ev xaneya jêrîn di D de bi xaneya dû wê re cih guhertiye.

46 Girtî yek qebze ji nûra xwe Xuda
Gote wê: “Kûnê Hebîbê Ehemeda”

47 Hêj ne ‘erş û ferş û kûrsî û qelem
Hêj ne lewh û enbiyayê muhteşem

Di MK de ev riste û ya bin cih guhertine:

266 Le ‘leha, têr av ji ava Kewşerê
Zulfêha, şed te ‘ne dane ‘enbere

267 Bejn û bala serw û sîmayê şefaf
Min şibandîn tuxmê ‘Ebdulmenaf

B) KÊŞ

Eger metn li gorî kêşê neyê xwendin, metn şaş tê xwendin. Peyva ku şaş tê xwendin, dibe peyveke nenaskirî ku di ferhengên de nayê peydekirin. Di hîlbijartina peyvan de me kêşa Mewlûdê ji bîr nekir û me ew weke pîvanekê nîrxand. Me ji nav xaneyên pîrcure de yê li gorî kêşê hatine nivîsandin hîlbijartin. Yê ku kêşê wan zêde, yê kêşê û yê ne li gorî kêşê hatine nivîsandin jî me nexistin metnê û di jêrenotan de weke cudahiyên nusxeyan nîşan dan. Hin peyvên ku ji bo kêşê dengdêr li wan zêde dibe, me dengdêra wan din av kevanê de nivîsand: nam(i)wer, kar(i) saz, gûş(i)dar.

C) PÊVEK

Di xebateke bi vî rengî de pêwistbû li ser ferhengê lêkolîneke ciddî çêbibe û di pêvekê de jî ferhengeke metnê hebe. Di vî karî de eger lêgerîna ferhengê çênebûya kêmasiyeke mezin derdiket meydanê. Di vî karî de ya ku bêtir kêrî mirov tê jî ferheng e. Me jî ferhengeke Mewlûdê amade kir. Me wateya kîjan peyvê didît, me ew peyv dixiste nav ferhengê. Zexmbûna vê xebatê jî ji vî karê ferhengê tê.

D) RASTNÎVÎS Û XALBENDÎ

Di metnekî bîedîsyon qatîk de, nîşaneyên xalbendiyê çiqas xweş bîkaranîn, ew tê wê wateyê ku ew ewqas baş hatiye fêmkirin. Ji bo vê yekê jî me zehf girîngî da xalbendiyê. Di amadekirina metnê mewlûdê de me ev xal li ber çavan girtin:

1. Me serê risteyan û navên taybet bi tîpên mezin nivîsandin. Mînak:

27 Ez şefî'ê wî me roja **Mehşerê**
Dê vexut ew taze ava **Kewşerê**

457 **Pêk ve** rabûn xaş û 'amê Se'diyan
Lê **Helîme** zû gehîştê an zeman

2. Ji bo ayet, hedîs an jî peyvên navdar me, nîşandeka neynokê (<< >>)

9 Hêvîdar in em ji te Şahê Kerîm
<<Îhdîna ya Reb şîrîte'l-musteqîm>>

3. Me ji bo axaftinê xalecot (:) bi karanî:

134 Taze bû ew xûn û mercan bûne rêz
Rahiban got: "Ay û way exbar(i) nêz"

4. Li gorî peywendê ku di wateyê de pirs hebûya, me pirsnîşan (?) bi kar anî.

224 Zuryeta wî Cumle hatin bînewa:
"Ev çi hale ? bêje me" Wî gote wa:

5. Di te‘mîrkirina metnê de me kevaneya çargoşe [] bikar anî.

57 Şed hezar û hem çihar û [bîstî] elf

Her yekê bû yek nebiyê dil şigerf

E) ALFABEYA TRANSKRIPSIYONÊ

Mewlûda Melayê Bateyî, bi tîpên erebî hatiye nivîsandin. Ji tîpên mewlûdê hin jê weke P (پ), Ç (چ), J (ج) di alfabeya erebî de nînin û ji berê de di alfabeya kurdî de hene. Me, di wergerandina tîpên ji erebî bal bi tîpên latinî ve, ji xeynî tîpên “q” û “x” yê alfabeya navnetewî bi kar anî.⁸⁴ Me peşî alfabeya transkripsiyonê derxist û paşê jî dest bi kar kir. Alfabeya transkripsiyonê li jêrîn e:

ا: A a

ب: B b

پ: P p

ت: T t

ج: C c

چ : Ç ç

د: D d

ر: R r

ز : Z z

ژ : J j

س: S s

ش: Ş ş

گ: Ğ ğ

ف: F f

ق: Q q

ك: K k

⁸⁴ Wekî mînak bnr. Adak Abdurrahman, “Mela Xelîlê Sêrtî: Helbestvanê Bi Mexlesa ‘Şewqî’ û Helbestên Wî yên Kurdî (Kurmanci)”, Mukaddime, j.1., Bihar, 2010, r.154

ل: L l
 م: M m
 ن: N n
 و: W w
 ف: V v
 خ: X x
 ه: H h
 ی: Y y
 ی: Î î
 ئ: Ê ê

Tîpên ku di alfabeya kurdî de nînin li jêrin :

ء : '
 ث: S s
 ذ : Z z
 ص: Ş ş
 ض: Ž ž
 ض: Ḍ ḍ
 ط : Ṭ ṭ
 ظ : Z ẓ
 ع : '
 غ : Ġ ğ
 ح : H ḥ

NAVNÎŞA SEMBOLÊN NUSXEYAN

AG	Nusxeya Abdullah Golî
B	Nusxeya Berlînê
D	Nusxeya Dihokê
DB	Nusxeya Diyarbekirê
E	Nusxeya Ehmed
EB	Çapa Ebdulbasid Ebdulsamed
GB	Nusxeya Gundê Batê
H	Nusxeya Hewlêrê
HDN	Nusxeya Haziq
M	Nusxeya Misrê
MA	Nusxeya Muhemmed Abdullah
ME	Nusxeya Mahmud Efendî
MK	Nusxeya Millî Kutupxaneyê
MM	Nusxeya Muhemedê Muksî
OH	Nusxeya Orta Hisarê
ŞM	Nusxeya Şêx Muşerref

2. METNÊ MEWLÛDA MELAYÊ BATEYÎ

1- BISMILLAHÎRRAHMANIRRAHÎM⁸⁵

- 1 Hemdê bêhed bo Xudayê 'alemîn
Ew Xudayê daye me dînê mubîn
- 2 Em kirine ummeta Xeyru'l-Beşer
Tabi'ê wî muqtedayê nam(i)wer
- 3 Ew Xudayê Malîku'l-Mulkê 'ezîm
Daye me mîraşa Qur'ana Kerîm
- 4 Dînê me kir kamil û ni'met tamam
Ye'nî da me Eḥmed û Daru's-Selam
- 5 Ew Xudayê bênezîr û zû'l-Celal
Bêmîşal û bêheval û bêzewal⁸⁷
- 6 Raziqê bêdest û pa û mar û mûr
'Alimê sirra negotî der şudûr
- 7 Kar(i)sazê bende û sulṭanê can
Raḥîm û Reḥman Laṭîf û Mihrîban
- 8 Asîmanê bêsutûn wî kir pedîd
Şûretê ba xal û xet wî aferîd

⁸⁵ Ji xeynî GB, hemu nusxe wisa destpê dîkin. 4 xaneyên pêşî di GB de nînin.

3 mîraşa Qur'ana Kerîm] mîras û Qur'ana Kerîm, Ji xeynî AG û H

4 kamil û ni'met] kamil ni'met MK

⁸⁷ Ev xane destpêka GB ye.

8 pedîd] bedîd B, M, HDN, MK, GB

ba xal û xet] ba xet û xal ME

9 Hêvîdar in em ji te Şahê Kerîm
<<Îhdîna ya Reb şîraçe 'l-musteqîm>>⁸⁸

10 Nê ji me sûc û xeşa tên û sîtem
Lê ji te îhsan û gufran û kerem

11 Ya Reb îmanê dixwazin em mudam
Jê rê alaya Muḥemmed we's-selam⁸⁹

2 - DER NE'Î MUḤEMMED ŞELLALAHU 'ELEYHÎ WE SELLEM⁹⁰

12 Ber tu bada her zeman û an û hîn
Ey Muḥemmed şed hezaran aferîn

13 Ey şefî' û daruwê her 'îlletê
Dîde û bînahiya vê ummetê

14 Destegîr û mustegâşê her du kewn
Bo gunehkaran penah û pişt û 'ewn

15 Şellî ya Rebbî 'ela Xeyri 'l-Beşer⁹¹
Ta hebin teyr û bixûnin ber şecer

⁸⁸ Ev ayet, di sûreya Fatîhe de ye:“(Ya Rebbî) tu me bighîne rêya rastîn”⁸⁸ Peyva “ya Reb” di ayetê de nîne.

⁸⁹ Piştî vê xaneyê di M de: “Şallû 'eleyhî wesellimû teslîma
Ḥeta tenalû Cenneten we ne'îma”

Di MA, AG, H, E, OH de:
“Ger divêtin hûn ji narê bin necat
Bi 'eşq û şewqek hûn bibêjin eşşelat”

11 Reb] Rebbî MA, H, E û AG, îmanê] îman MA. Mudam] medam” D

⁹⁰ Ji xeynî bêjeyên ku tên heman wateyê, sernivîsa vê beşê di hemî nusxeyan de hevpar e. Me ya D'yê hîlbijart.

13 Ey] Ew M, GB, MM, ME

14 mustegâşê] mustegâş û MK.

⁹¹ Ya Rebbî alîkariya xêtirînê beşeran (Muḥemmed saw.) bike.

- 16 Ew Hebîbê rohaniya heft asîman
Her du ‘alem qalib ew rûh û rewan
- 17 Xakê payê Ehmed ew Beytu’l- Hëram
Lew şerîf in Zemzem û rukn û meqam⁹²
- 18 <<Şellî ya Rebbî ‘ela Xeyri’l-wera
Ma tesîru ‘ş-şemsu fî ‘s-seb ‘i’l- ‘ûla >>⁹³
- 19 Fexrê Îbrahîm û Îsma ‘îl û Nûh
Muştefayê bawefa yê bafutûh
- 20 <<Ma remeyte îz remeyte>>⁹⁴ gûş(i)dar
Destê wî destê Xuda der kar û bar
- 21 Şellî ya Rebbî ‘ela Xetmi’r-Rusul
Ma yemûcu’l- ‘aşiqûne fî ‘s-subul⁹⁵
- 22 Ew kelîme xoş newayê çerxê Tûr
Dağîdar im bo wî sîmayê bi nûr
- 23 Ey şefî‘ û şahîbê alayê hemd
Min hene bêhed guneh nîsyan û ‘emd
- 24 Lê me hêvî waşîq e dê ez feqîr
Jê rê alaya te bim roja ‘esîr⁹⁶

16 heft] hevt M, DB, MK

17 Ehmed] Ehmedin MK. Beytu’l- Hëram] Beytu’l-Hëyam MA

⁹³ Ya Rebbî alîkariya xêrtirînê muteqiyan (Muhemmed saw.) bike. Bila tav li wê zaroka biçûk nexse.

⁹⁴ “Gava te davêt jî te nediavet ; lê belê Xuda avêt” Enfal-17

20 kar û bar] kar bar D, karibar MK

⁹⁵ Ya Rebbî heta ku ew aşiq di rêya wî de bimeşin, alîkariya mohra Resûlan (Resûlê dawî Muhemmed saw.) bike.

22 Dağîdarim] Dağdarim ME, D Dağ û darim MM

23 Ey] Ew HDN, DB. şefî‘ û] şefî’ ê DB. min] men” D

⁹⁶ Piştî vê xaneyê di M de: “Şallû ‘eleyhî wesellimû teslîma

3- DER FEŽA'ÎLÎ MEWLÛDU'N-NEBÎ ŞELLALLAHU 'ELEYHÎ WE SELLEM⁹⁷

- 25 Herkesê guhdarê mewlûda Nebî
Dergehê mizgîniyan dê lê vebî
- 26 Gote wî Peygamberê 'alî şifet
“Mewlûda min herkesê mezin biket”
- 27 Ez şefî'ê wî me roja Mehşerê⁹⁹
Dê vexut ew taze ava Kewşerê
- 28 Şerfê mewlûda min yek dirhem fer e
Hemberê yek kohê zêrê eħmer e
- 29 Fî sebîlilleh bibexşin ber feqîr
Qedrê mewlûdê bizanin hûn kebîr¹⁰⁰
- 30 Hem ji Bûbekr û 'Umer hat ev xeber
Hem ji 'Uşman û 'Elî çêbû eşer

Heta tenalû Cenneten we ne 'îma”
Di HDN de li pişt vê xaneyê: “Hûn dixwazin ji agir xelaş bin temam
Ber Muhammed eşşelatu we's-selam”
Di MA, AG, H, E, OH de li pişt vê xaneyê: “Ger divêtin hûn ji narê bin necat
Bi 'eşq û şewqek hûn bibêjin eşşelat”

⁹⁷ Ji xeynî bêjeyên ku tên heman wateyê, sernivîsa vê beşê di hemî nusxeyan de hevpar e. Me ya MK'yê hilbijart.

25 guhdarê] guh daye D. Mizgîniyan] mizgîniya MM, B

26 'alî şifet] 'aşifet DB

⁹⁹ Ez şefî'ê wî me roja Mehşerê] Ez şefî'ê wî di roja Mehşerê MM, ME

28 M. fer e] par e M

29 bibexşin] bêbexşî H

¹⁰⁰ Di ME de ev xane wisa ye : “Fî sebîlilleh ger bibexşin ber feqîr
Qedrê mewlûdê kin hûn kebîr”

- 31 Dirhemek bit şerfê mewlûda Nebî
Xeyrekî mezin ji bo haşil dibî
- 32 Hem ji şeyxan bû rîwayet ev xeber
Şeyxê Kerxî, Fexrê Razî ba dîger¹⁰¹
- 33 Herkesê hazır biket ew yek te‘am
Ba buxûr û şerbet û qedrê tamam
- 34 Gazî ket îxwan û hîlbîtin çira
Bête xwendin mewlûda Xeyru’l-wera
- 35 Tête heşrê ew digel xelqê berî
Ye‘nî ba peygemberanê enwerî
- 36 Her çi bînit hindî tiştê xwarinê
Dê mubarek bî li ber wê xwendinê
- 37 Bête xwendin ger li avê êy vexut
Rehmê nazil cumleyê ‘îllet dibit
- 38 Bête xwendin ger li yek sikke diraf
Dê mubarek bin derahîm bibne zaf
- 39 Her cihê lê bête xwendin rehme lê
Dê melek bîn û tijî wê menzilê¹⁰²

31 xêrekî] xêreke E, MA, AG, H

32 ev] ew GB, B, D, MK

Ba] û GB

¹⁰¹ Ji ber ku rûpelên GB kêmin ji vê xaneyê heta beşa afirandina Adem (a.s), heta vê xaneyê nîne:
“Pif kirê ruha xwe ew bû nazenîn

Lew melek hatin ji bo wî sacidîn”

33 Herkesê hazır] Her çê hazır MK

Ew]ev DB

34 mewlûda] mewlida D

35 têtê] Dite M , Dêdi D

36 bînit] bînin B. Wê] vê D

38 bin] bit D

¹⁰² Di D de ev xane û ya beriya vê cih guhertine.

- 40 Xaniyê lê bête xwendin ev şela
Dê bibête ba 'îşê def 'a bela
- 41 Bo xudanê zadî û bo hemnişîn
Her şelatan dê bidin Kerrûbiyîn
- 42 Dafi 'ê cumle hesûdê çavxerab
Der mezarê sehl e lê redda cewab
- 43 Pir kesan dîtin keramat û eşer
J' xwendina mewlûda sulţanê beşer¹⁰³
- 44 Her wekî hatine gotin bêhisab
Lê neşim bêjim ji tetwîla kîtab
- 45 Qedrê mewlûdê nizanim bêjim ez
Lêk hişyar bin da nebîte cergebez¹⁰⁴

41 hemnişîn] hevnişîn E Bidin] biden D

42 hesûdê] hesûdan E, MA
Çavxerab] cavxirab D
Mezarê] mizar D

43 ji xwendina] xwendina DB
Pir] pur D, B, MK, OH

¹⁰³ Sulţanê Beşer] xeyrul-beşer ME, D; lê di derkenar D de "Sulţan" heye.

44 wekî] weku E, H

45 Lêk] lîk MM, ME cergebez] cerg û bez E, MA

¹⁰⁴ Piştî vê xaneyê di M de: "Şallû 'eleyhî wesellimû teslîma
Heta tenalû Cenneten we ne 'îma"
HDN de li piştî vê xaneyê: "Ger dixwazî wan Cennatê 'aliyat
Pûr bixwûnîn ser Muhemmed şelewat"
Di OH de li piştî vê xaneyê: "Ger divêtin hûn ji narê bin necat
Bi 'eşq û şewqek hûn bibêjin eşşelat"

4- ÎBTÎDÂÎ NURÎ MUḤEMMED ŞELLALLAHU ‘ELEYHÎ WE SELLEM¹⁰⁵

46 Girtî yek qebze ji nûra xwe Xuda
Gote wê : “Kûnî Hebîbî Ehmeda”¹⁰⁶

47 Hêj ne ‘erş û ferş û kûrsî û qelem
Hêj ne lewh û enbiyayê muhteşem

48 Saleha tesbîhi kir nûra şigerf
Şeş mî’et elf û çihar û bîst û elf

49 Paşê bo wê çêkirin d’wazdeh hîcab
Her yekê xweştir ji ya dî der hîsab¹⁰⁷

50 Qudret û te‘zîm û minnet merhemet
Hem se‘adet hem keramet menzîlet

51 Hem hîdayet hem nubuwwet rif‘et e
Ta‘et e yazdeh şefa‘et temmet e

52 Her yekê westabû tê da çendî sal
Lê ‘eded me spare ‘ilmê layezal

53 Her yekî tesbîheke xaş û cuda
Daîma tesbîhi xwendin bo Xuda

¹⁰⁵ Ji xeynî bêjeyên ku tên heman wateyê, sernivîsa vê beşê di hemî nusxeyan de hevpar e. Me ya D’yê hîlbijart.

¹⁰⁶ Hezkiriyê min Ehmed, ji min re çêbû. Ev xane di D de bi xaneyê dî wê re cih guhertiye.

47 lewh] leh AG, H

48 şigerf] şigref MM, MK, DB şingerf ME

¹⁰⁷ Ev xane di ME de nîne.

52 me spare] muspare D

53 xwendin] xo an B, M

- 54 Paşê avête çihar behrê mezin
Wî Xudayê layezalê îns û cin
- 55 Behra nazre sanî behra merheme
Behra qudret behra ‘îrfan în heme
- 56 Çûn ji behra me‘rîfet ew hate der
Qetre jê weryan ba îlham ev qeder
- 57 Şed hezar û hem çihar û [bîstî] elf
Her yekê bû yek nebiyê dil şigerf
- 58 Paşê wî çêkir ji nûra nam(i)wer
Cewherek lê kir nezer ew bû dû ker¹⁰⁸
- 59 Nişfê ewwel daye çavê heybetê
Nişfê şanî daye çavê şefqetê
- 60 Nişfê ewwel bûye behr û her livî
Nê jê tirsê heybetê qet nanivî
- 61 Hem kelî ew behr û kef da û duxan
Kef bû erd û hem duxan bû asîman
- 62 Nîvika dî çêkirin jê çari çîz
‘Erş û kursî û qelem lewha temîz

54 Paşê avête] Paşê bir avête MK

56 me‘rîfet] merhemet MK

Qetre jê weryan ba îlham ev qeder] Qetre jê werya bi îlham ew qeyer MA, AG

57 şigerf] şigref MM,MK dil şigerf] zî tengerf ME

¹⁰⁸ Di D de ev xane di derkenarê de hatiye nivîsandin.

60 nanivî] navêyî D

61 Erd] erxî E, MA

Kef bû erd û hem duxan bû asîman] Kef bû erd û duxan asîman DB,

Kef bûye erd û duxan bû asîman MM,ME,B

62 çari çîz] çar û çîz MM,ME,DB, MK

- 63 Hate emrê padîşahê layezal
Malîku'l-Mulkê Celîlê zu'l-Celal
- 64 “Ya qelem binvîse emrê padîşah”
“Ez çi binvîsim bi ferman ya Îlah”
- 65 <<Qale: “*Uktub la îlah illa ene*”¹¹¹
Hem Muḥemmed qaşidê emrê min e”
- 66 Sacîd û bêhiş gerî şed salê dî
Ser hilîna got: “Îlahî seyyîdî
- 67 Ez dizanim la îlah illa tu yî
Ew Muḥemmed hemberê îsmet bû yî
- 68 Kîjk e ya sultânê ba cûd û kerem ?”
Padîşahê sermedî got: “Ya qelem
- 69 Ger nebûya ew Muḥemmed lewḥ û ‘erş
Min netînane wucûdê ta bi ferş
- 70 Nê tu û nê Cennet û narê mezin
Cumle eşya min ji bo wî çêkirin
- 71 Muḥbetê hingaft û şeq bû ew qelem
Ma li ser lewḥê nivîsî dem bi dem

63 Celîlê] Celîl û DB,MK

64 Ya qelem binvîse emrê padîşah] Ya qelem binvîs bi emrê padîşah E, H, AG,MA

¹¹¹ Binivîse “ji min pê ve tu Xweda nînin.” Sureya Nehl, ayeta 2.

65 Hem] ew E

67 hemberê] heşberê AG, H

68 got] go MM,ME,E, AG, MA, MK, M, B

69 “ew”, “ev” D

70 Nê tu û nê] Nê tu etî H, MA, ne tu etî E, nê tuê AG

71 hingaft û şeq] hingaft û hem şeq MK

Nivîsî] eyisî MM,ME,B, M

- 72 Serxweş û sekranê wî navê şêrîn
Paşê ba îlhama Rebbi'l- 'Alemîn
- 73 Gote ewwel "Ya Muḥemmed es-salam"
Hem " 'eleyke" gote Rebbê layenam
- 74 Da cewaba 'en Ḥabîbi'l-Îzzetî:
"We 'eleyke es-salam û raḥmetî"¹¹²
- 75 Bûye sunnet lew salam û reddê ferz
Cumle eḥwalê dî paşê kirne 'erz
- 76 Wê nivîsî pêk ve ummet qencikar
Cennetî û 'aşıyan dê biçne nar
- 77 Ummeta Eḥmed nivîsî ehlê nûr
Ummetun muznîbetun, Rebbun Gefûr
- 78 Cumle eḥwalê di 'alem bîş û kem
Wî nivîsî borî û hişk bû qelem¹¹⁴

72 Paşê] başê B, D

74 cewaba] cewaben B, MK, DB

¹¹² û rehmet û silav li ser te be.

75 Cumle eḥwalê dî paşê kirne 'arz] Cumle eḥwalê paşê hingî kirne erzî MA, H, AG, Cumle eḥwal paşê bo wî kirne erz M, Cumle eḥwalê paşê kirne 'arz MM,ME,D, DB

76 qencikar] qenc û kar DB, D, B

78 eḥwalê di 'alem] eḥwalê 'alem MM,ME,D, DB

¹¹⁴ Piştî vê xaneyê di M de: "Şallû 'eleyhî wesellimû teslîma
Ḥeta tenalû Cenneten we ne'îma"

Di HDN de li pişt vê xaneyê: "Ger dixwazî wan Cennatê 'aliyat
Hûn bixwûnîn ser Muḥemmed şelewat"

Di MA, AG, H, E, OH de li pişt vê xaneyê: "Ger divêtin hûn ji narê bin necat
Bi 'eşq û şewqek hûn bibêjin eşşelat"

5- DER XULQIYETÎ ADEM PÊXEMBER ‘ELEYHÎ‘S-SELAM¹¹⁵

- 79 Çûn îradet hate Sulţanê refî‘
Çêkitin Adem bi vî şeklê bedî‘
- 80 Emrî hate goşê Cibrîlê emîn:
Qebzeyê bîne ji beyzayê zemîn
- 81 Ew dilê erqê û hem husn û beha
Zîneta meknûn û durra bêbeha
- 81 Hate Cebra’îl û ba emrê Leţîf
Çengekê axê ji wê qebra şerîf
- 82 Girt û ba tesnîm û şafî kir hevîr
Têk ve da hetta ku ew qenc bû xemîr
- 83 Bû wekî durra sipî wê sa‘etê
Gewte da der cuyibarê Cennetê
- 84 Emrê Cebra’îl kir paşê çunan
Wî bigêre der zemîn û asîman
- 85 Berr û behr û şerq û ğerbê ‘alemê
Hate gêran hêj ne beħsa Ademê

¹¹⁵ Ji xeynî bêjeyên ku tên heman wateyê, sernivîsa vê beşê di hemî nusxeyan de hevpar e. Me ya HDN hîlbijart.

79 Çêkitin] çêkirin DB

80 beyzayê] beyşayê H

81 Hati] Ha D

Wê] ber AG, B

82 ew qenc bû xemîr] qenc bû ew xemîr DB

83 Gewte da der cuyibarê Cennetê] Ğewze da hem der cubayê Cennetê DB

84 Cebra’îl] Cebra’îl D, MK

- 86 Nê hezaran salî çûne axirî
Ew nebî bû Adem hêj av û herî
- 87 Paşê hingê xaliqê her şûretê
Çêkir Adem wî bi destê qudretê
- 88 Pif kirê rûhê xwe û bû nazenîn
Lew melek hatin ji bo wî sacidîn
- 89 Bû xezîne ew ji bo durra yetîm
Daniye pişta wî ew nûra ‘ezîm
- 90 Paşê bir avête bagê Cennetê
Geyrî darê jê bixwe her nî‘metê¹¹⁷
- 91 Şef bi şef westane pişta wî gelek
Nazîrê nûra Muḥemmed ew melek
- 92 Gote Adem: “Ew melaik bo çi her
Wê li pişta min dîkin daîm nazer
- 93 Rebbê ‘alemê got Adem: “Ey mulî
Tu ji bo nûra Muḥemmed ḥamilî
- 94 Ew ḥebîbê min di pişta te zuhûr
Lew melek tene temaşayê ji dûr”

86 Ew Nebî bû Adem hêj av û herî] Ew Nebî Adem bû av û herî H, MA

87 Çêkir Adem wî] Çêkir Adem H, MA; Çêkirî Adem bi destê qudretê MK, DB

88 Pif] Puf MM, GB rûhê] rûha MM,ME

89 Daniye] Danîne MA

90 bixwe] bixwûn DB, buxwe MM,ME

¹¹⁷ Ew xane di D de nîne.

91 pişta] bişta GB, puşta D,OH pişû H, MA

92 Ew] ev MK, HDN

Pişta] bişta GB, puşta B,D,OH

Dîkin] tîkin D

93 got] goti B, DB

94 pişta] bişta DB, puşta D, yuşta B

- 95 Gote Adem: “Ey Xudawendê felek
Min divêtin bêne pêş min ew melek
- 96 Hem bi fermana Xuda wê sa‘etê
Nûr ji piştê hate nîvê cebhetê
- 97 Hin dibêjin: Hate tilya şahidê
Lê heqîqet her dizanîtin Xudê
- 98 Mîslê roja hatiye ewca felek
Hem teheyyur Adem û hindî melek
- 99 Gote Adem: “Ya Rab ew nûra qebûl
Maye tiştêk ? Gote: “Eşhabê Resûl”¹¹⁸
- 100 Gote Adem: “Ya Îlahî qenc e bêt
Bête tilyan her çi maye min divêt
- 101 Nûra Bubekr û di wuşta û ‘Umer
Binşer û ‘Uşman di xinşer musteqer
- 102 Hate îbhamê di bin nûra ‘Elî
Şû‘le da tilyan û Cennet muncelî
- 103 Hate Hewwa û nezer da nûra şaf
Gote: “Ya Adem çi nûr e pir şefaf”

95 Ey] ya D

pêş min] pêşim MM,ME,B, GB,M

96 fermana] ferwada D, GB ferwerê MM Piştê] biştê GB, puştê B

97 dizanîtin] tizaniyin D

¹¹⁸ Ev xane di OH de dubare kiriye.

100 maye] mayî GB, B, MK

101 Bûbekr û] Bubekrî D, Ebûbekrî AG, H, Nûra Ebûbekir MA, DB

wuşta] westa D

xinşer] xunşer AG, H

103 Gote] goti D, MK, GB, E, MA, H, B, got M

Pir] ho MA, E, DB, D, MK, M, GB, şir H

Ya Adem] Adem MM,ME

- 104 Gote “Nûra yek nebiyyê mezin e
Seyyid û hem mezinê nesla min e
- 105 Çûnkî bêemrî ji Adem bû zîhar
Nûr ji anyê hate piştê bû sitar¹¹⁹
- 106 Nê ji darê xwarin herdukan şêrîn
Hulleyê Cennet ji bejnê da firîn
- 107 <<Îhbîtû minha cemî ‘en>> hate emr¹²⁰
Adema dê bêteve lêkin bi şebr
- 108 Der serendîbê ba erdê ket girî
Çendî sê sad sal û rohnîk bûn herî
- 109 Rohnîkê wî şîn kirin dar û nebat
Çûn di erdê da du pa û mayî mat
- 110 Pir girî û xweş girî bêhed gelek
Newheê <<Înna zalemna>> çû felek¹²¹
- 111 Rojekê ew der sucudê bêmefer
Pir girî û hem li ‘erşê kir nezer

104 Mezinê] serwerê H, AG, E mazinê] MM,ME

105 piştê] puştê D, DB

¹¹⁹ Ev xane, di B de destpêka beşeke din e.

¹²⁰ “De dakevin ji wir hûnê ji hev re neyar bin” Bakara ayeta 37.

106 xwarin]xwar MM,ME

107 bêteve] pêkeve DB, bêyeve M, D bi şebr] şebr MM

108 Çendî sêsad sal û rohnîk bûn herî] Çend salan rohnîkê wî bûn herî H, AG Çendî sê sad sal hûnek bûnehî ME

109 mayî] maye M, E, MA

110 Pir girî û xweş girî bê hed gelek] Pur girî û xweş girî pê hed gelek D
çû felek] di çû felek B

¹²¹ Bêguman me zilm kir.

111 Pir] pur MM,GB, MK, B, D Kir] dikir B

- 112 Dît nivîsî <<La îlahe îllallah¹²²
Ba Muḥemmed ba Resulullahê şah>>
- 113 [Got] bi heqqê an Muḥemmed kî te neqş
Wî kirî ba îsmê xo ber saqê ‘erş
- 114 Tu bi gufranî min ê bêçare ah
Hate Cebra’îl û ba emrê Êlah
- 115 Ser hilîne Adema ‘efwa Celîl
Bo te hatim rabe ey zîba cemîl
- 116 Hürmeta navê Muḥemmed an Resûl
Tewbeya te bû qebûl û her qebûl¹²⁴

6- ÎNTİQALÎ NÛRÎ MUḤEMMED ŞELLALLAHU ‘ELEYHÎ WE SELLEM¹²⁵

- 117 Çûn ji Adem nûra Eḥmed bû cuda
Hate pişta Şîşê burhanu’l-Huda

¹²² Di Qurana Pîroz de di gelek ayetan de (Beqere 163, A.Îmran 6,18 Enam 102, Araf 73,85, 158, Tevbe 31, Hud 50 hwd.) ev wate derbas dibe: “Ji Allah pêve tu xuda nînin.”

112 Ba] ya DB, E

113 kî te] keş ME

114 Hati]hatê MK

Cebra’îl û ba emrê] Cebra’îl ba emrê MM,ME,MK, GB, M

115 hilîne] helîna DB, B, H, MA, AG , D

Hatim] hat û MM,ME,GB, B, MK, M, D

116 te] ne HDN

¹²⁴ Piştî vê xaneyê di M de: “Şallû ‘eleyhî wesellimû teslîma

Ĥeta tenalû Cenneten we ne’îma”

Di MA, AG, H, E, OH de li pişt vê xaneyê: “Ger divêtin hûn ji narê bin necat

Bi ‘eşq û şewqek hûn bibêjin eşşelat”

¹²⁵ Ji xeynî bêjeyên ku tên heman wateyê, sernivîsa vê beşê di hemî nusxeyan de hevpar e. Me ya D’yê hîlbijart.

117 pişta] puşta MM,B, GB

- 118 Hate eşlab û buṭûnên ṭahîre
Qeṭ nebû yek jê xerab û facîre
- 119 Fewqê ‘Ednan ta bi Adem îxtîlaf
Tê heye lew bêtişaq e ev meşaf
- 120 Jê rê ‘Ednan ta ji ‘Ebdullah guhist
Bîst û yek bab in hemî rast û durist
- 121 Hin belî ‘Ednan û Me‘d û hem Nezar
Muḍr û Ilyas in bizan ey goşîdar
- 122 Mudrîke paşê Xuzeyme taze ‘eyş
Hem Kenan e, paşê Neḍr e bû Qureyş
- 123 Malik û hem Fehr û Ġalib hem Lu‘ey
Ke‘b û Murre hem Kîlab û hem Quşey
- 124 Hem ji pişta wî Quşeyyê pak û şaf
Ew emanet hate nik ‘Ebdulmenaf
- 125 Hem ji nik ‘Ebdulmenaf ew muxtefî
Hate pişta Haşim ew nûra şafî
- 126 Hem ji Haşim bû emanet munqelib
Hat û bû mēhvanê ‘Ebdulmuṭṭelib

118 buṭûnên] biṭûnê H

119 bi] ji H, Heye] hene M Tifaq] itfaq DB, MA, B

120 ji] bi GB, MK

121 belî] yekî H, AG

122 Neḍrê] Neẓre M, D, GB

123 Fehr] Fihir MK, B

Murre] Merre D

124 pişta] puşta D, B, GB, OH

pak û şaf] pakî şaf B, DB

125 pişta] puşta MM, D, B, DB, GB

126 Hat û] hate H

- 127 Silsila wî ta ba Adem da û bab
Pêk ve dê biçne beheştê bêhisab¹²⁶

7- DER ÎNTİQALÎ NÛRÎ MUḤEMMED ŞELLALLAHU TE‘ALA ‘ELEYHÎ WE SELLEM¹²⁷

- 128 Hem ji ‘Ebdulmuṭṭelib bû ḥamîle
Faṭîme hem muddeteş bû kamîle¹²⁸

- 129 Jê bû ‘Ebdullah bi ḥukmê sabîqe
Nûra Eḥmed der cebîneş barîqe¹²⁹

- 130 Mezherê nûra Muḥammed hate ew
Pak û nûranî mu’eyyed hate ew¹³⁰

- 131 Cubbeyê Yehya di Şamê da nimûn
Şûfeke spî bû hemî têk da bû xûn

- 132 Girtî xûnê cubbeyê Yehya çû nar
Wê demê bûye şehîdê pêşîwar

¹²⁶ Piştî vê xaneyê di M de: “Şallû ‘eleyhî wesellimû teslîma
Ḥeta tenalû Cenneten we ne‘îma”
Di HDN de li pişt vê xaneyê: “Ger dixwazîn ji nara Cehennem necat
Dê bixwûnin ser Muḥammed şelewat”
Di MA, AG, H, E, OH de li pişt vê xaneyê: “Ger divêtin hûn ji narê bin necat
Bi ‘eşq û şewqek hûn bibêjin eşşelat”

¹²⁷ Sernivîsa HDN

128 Hem] her HDN

¹²⁸ Di MK de ev beş bêsernivîs e. Berdewama beşa şeşemîn e. Di GB de ev xane di beşa şeşemîn de ye.

129 Jê bû ‘Ebdullah bi ḥukmê sabîqe] Hem ji ‘Ebdullah bi ḥukmê sabîqe DB] Jê bû ‘Ebdullah ḥukmê sabîqe MM,ME der] ez ME

¹²⁹ Di GB de ev xane di beşa şeşemîn de ye.

130 hate] hatî E,MA Pak û] pakî B mu’eyyed] mu’mine ME

¹³⁰ Di GB de ev xane di beşa şeşemîn de ye.

131 Şûfeke spî bû hemî têkdabû xûn] Şûfekî spî bû hem têda bû xûn B] Şûfekî spî hemî têk da bixûn
ME spî bû] spî HDN

132 pêşîwar] bêşûwar Ji xeynî D di hemu nusxe

- 133 Hişkî bû ew xûn û borîn rûzîgar
Ta wucûda ‘Ebdullahê namîdar
- 134 Taze bû ew xûn û mercan bûne rêz
Rahiban got: “Ay û way exbar(i) nêz”
- 135 Weqt e rabit Eḥmedê ‘alî ‘elem
Nasixê Tewrat û Încil û şenem
- 136 Hat xudanê seyf û Furqana mubîn
Xûna Yehya bû nêşana wî yeqîn
- 137 Lêk vegêran hem su’al û hem cewab
Way û weyla kefte nav ehlê kîtab
- 138 Wan yeqîn kir ‘Ebdullah hate wucûd
Ba ‘edawet qeşd kirin qetla wî zûd
- 139 Ehlê kizb û ehlê zûr û îftîra
Çendî car ew hatine Ummu’l-Qura
- 140 ‘Ebdullah der ḥifzê sulṭanê Wedûd
Nûra Eḥmed dafi ‘ê şerrê Yehûd
- 141 ‘Ebdullah mezin bû ba naz û delal
Canê ‘Ebdulmuṭṭelib ew mah û sal

133 namidar] kul‘uzar GB

134 got] go B, DB

Exbari] eḥbari ji xeynî MK hemu nusxe

135 weqt e] wext e B

136 Furqana] Qur’ana H wî] ew DB

138 Ba ‘edawet qeşd kirin qetla wî zûd] Ba ‘edawet qeşd kir qetla wî wî yehûd ME Wan] wa GB
qeşd kirin] qeşdî kir D

139 Çendi car] Çend caran M, H, AG, MA

140 şerrê] şera ME Yehûd] Cuhûd GB

- 142 Xweş divê babê ‘ezîzê maderê
Rohniya malê û zîba esmerê
- 143 Şiklê sîma mîslê bedra asîman
Nazik û re‘na û nûra xanedan
- 144 Dilber û mehbûb û şêrîn wek şeker
Herkesê ew dît û dil lê bû dû ker
- 145 Dohtê çakanê Qureyşî û ‘Ereb
Muntezîr bûn pêk ve bo wî roz û şeb¹³²
- 146 Her yekê hêvî fikir ew bit qebûl¹³³
Ba yekê wî qet neda meyla wuşûl
- 147 Bûdi azad ew ji fikra înan an
Yumnê nûra Ehmedî bû pasiban
- 148 Rojekê wî gote babê: “Ey emîr
Sa‘eta ez biçme Beḥaya Beşîr
- 149 Min ji piştê tete der nûrek mezin
Radibîte ser serê min ew ji min
- 150 Ez dibînim munqesîm bûye du ker
Yek di şerqê yek di xerbê çûye der

142 Xweşdivê] xweşfê D, xweştivê GB, B

143 Şiklê] Şikl û B, GB, M, MK

144 wek] çûn MK, û AG

145 Dohtê] dotê D, dot û MM çakanê] çakan û AG, H, MA, E

¹³² Di M de “Muntezîr bûn bo wî pêk ve roz û şeb”

¹³³ Di E de “Her kesê ‘evî fikir ew bit qebûl”

146 Ba yekê wî qet neda meyla wuşûl] Ba yekê qet wî neda meyla wuşûl H

147 Bûdi azad] Bû di azan DB, Bûbû azad B, Bû û azad H Bûd aza MM pasiban] pasipan D, MK

148 Ey] ya H, MA Beḥaya] Beḥa û M, GB, D

149 piştê] puştê D Radibîte] ratibîte D, B

150 di] li DB,

- 151 Têteve çespan û çapik bêdereng
Tête ser yek mîslê ‘ewrê tazereng¹³⁵
- 152 Ez dibînim asîman bûye du şeq
Radibit ew nûrê ta heftem tebeq
- 153 Têteve fî’l-ħal der an ‘alîmeqam
Ez dibînim tête pişta min tamam
- 154 Sa‘eta rûnim li ser mehda zemîn
Min ‘ecayib têne pêş û aferîn
- 155 Hem ji erdê tête sem‘im ev kelam:
“Wê digel te nûra Ehmed es-selam”
- 156 Her çi dara hişk e, ez biçme binî
Bû heşîn û kat e, ez pelgan genî
- 157 Bû sih û sîwan li ser min nagehan
Ez ku çûm bû hişk û bêpelg û guşan
- 158 Ew çi remz û hal e? Babo bêje min!
Gote babê: “Rohniya çavê di min

151 çespan] hespan GB çapik] çapûk H

¹³⁵ Ev xane di MM û ME de nîne.

152 Ez dibînim asîman bûye du şeq] Ez dibînim asîmanî bûye şeq GB, DB, MK, Ez dibînim asîman wê bûye şeq B,D

153 an] zan GB, M, D, B pişta] puşta D,B

154 têne] têt D pîş û] bîşem H,AG pêş min E pêş û MA

155 sem‘im] goşem GB ew] îy MM,ME

156 hişk e] hişk bî DB Her çê dara hişk e, ez biçme binî] Her çi dar hişk û ez biçme binî H, E, MA, AG Bû heşîn wez ji belgan bû genî ME

Heşîn] hişîn B pelgan] belgan GB

Bû heşîn û kat e, ez pelgan genî] Bû heşîn û kesk ji belgekan pir ‘enî H, AG

157 sih] reh H, E,MA sî B nagehan] nagihan B, DB

- 159 Şabe, mizgînîm li te ey nazenîn
Dê ji te zahir bitin şahê Emîn
- 160 Hêviya min waşiq e, dê rabbitin
Ehmedê ‘alem¹³⁷ ji te peyda bitin
- 161 Eşrefê mexlûq û sultânê cîhan
Dê ji te peyda bitin, bêşek bizan
- 162 Min diye der xwab û mayim muntezer
Ehmed ez piştî te ye, canê peder!”¹³⁸

8- DER DÎL UFTADEN KÎ AMÎNE BE ‘EBDULLAH BE DEHED¹³⁹

- 163 Çûnkî ‘Ebdullah(i) rabû pakîzat
Xweş li qetla wî Cuhûdan kir xebat
- 164 Rahib û eḥbar û hem ehlê kîtab
J’agirê kerbê hemî bûne kebab

159 Şabe, mizgînîm li te ey nazenîn] Şab min, mizgîn li te ey nazenîn MA,
Şabe min, mizgîn li te ey nazenîn H,E zahir] peyda GB
¹³⁷ Di B de ev bêje hatiye dubare kirin.
162 piştî] puştî MM,D,B te ye] te me MM, te nebin ME
¹³⁸ Piştî vê xaneyê di M de: “Şallû ‘eleyhî wesellimû teslîma
Heta tenalû Cenneten we ne‘îma”

Di HDN de li pişt vê xaneyê: “Ger dixwazîn ji nara Cehennem necat
Dê bixwûnîn ser Muḥemmed şelewat”
Di MA, AG, H, E, OH de li pişt vê xaneyê: “Ger divêtin hûn ji narê bin necat
Bi ‘eşq û şewqek hûn bibêjin eşşelat”

¹³⁹ Sernivîsa D

163 ‘Ebdullahi] ‘Ebdullah MK, GB, B pakîzat] pak û zat MK
Xweş] Nê MM,ME,M, D, GB qetla] fetla HDN
164 kerbê] kufrê D

- 165 Hatin heftê Cihûd ez mulkê Şam
Taze bey'et best û 'ehda natemam
- 166 Cengî û merdê dilawer şîregîr
Pêk ve xwarin sond û bestin tîr û şîr
- 167 Ta neyête kuştin ew zîba xiram
Yek ji me nayête axa mulkê Şam
- 168 Rahê şehra girt û çûn ew kînedûz
Mîslê kundê her bi şev çû, ne bi roz
- 169 Zû gihîştin çûne dora Mekkehê
Ketne pusê mîsle ava bin kehê
- 170 Da bînin kengî dibînin firşetê
Nobedar ketne kenara hêşetê
- 171 Rojekê wan dî bi çolê da meşî
Talışê nêçîr û hem ahû xweşî
- 172 Wan ku dî raborî 'Ebdullah çunan
Ba tenê تنها bi çolê da rewan
- 173 Firşeta xwe dît û rabûn şûr hesûn
Çûn di pey da mîslê gurrî devbixûn

165 Hatin | Hayidan DB, MK, B, M, E, D, GB best | gest AG

166 Cengî û | Çûnkî ew şîregîr | şîrûgîr B, şîrgîr GB,D

167 axa | ax û H, MK, D

168 girt | girtin MA her | hem B ne | nê GB, MK, B çû, ne bi roz | çûn bi roz ME
Rahê şehra girt û çûn ew kînedûz | Rahê şehra girt ewan kînedûz AG

169 Ketne | ketine MK, keftine D

170 Da bînin kengî dibînin firşetê | Da binê kengî dibînin derve tê ji xeynî MM,ME hemu nusxe.
firşetê | derfetê GB ketne | keftine D kenara | kenarên GB,D

171 Talışê nêçîr û hem ahû xweşî | Talışê nêçîr û ahû xweşî MM,ME,D,GB

173 dît | dîn AG,H gurrî | gûrgê AG,H

- 174 Hem di wê rojê li şeydê bû Weheb
Ye'nî babê Amîne 'alîneseb
- 175 Çûn şeda hat û Weheb lê kir nezer
Hate 'Ebdullah(i) qewmê xûnceger
- 176 Refte gûrgek hate berxê nûciwan
Lê belê hişyar e lê zîba şivan¹⁴¹
- 177 Nagehan fikrê Weheb dî j'asîman
Hate xwarê leşkerê rûhaniyan
- 178 Geybiyanê keskipûş ê gul'îzar
Hatinê jêk rakirin ew tar û mar
- 179 Turfetu'l-'eynî Cuhûd ber ba kirin
Wan j'eqalîmê cîhan winda kirin
- 180 Sa'eta sirra ji geybê dî Weheb
Maye heyran û vemaye der 'eceb
- 181 Çûn ji 'Ebdullah(i) dît ev sirr û hal
Xweş li lewşa dil nivîsî ev xeyal:

176 Refte] Revte DB

¹⁴¹ Di navbera herdu xaneyan de di B de

“Hate xwarê agirê mişlê şîhab

Nê warat û şuhtê ew ehlê 'ezab”

177 Nagehan] nagihan DB, B Nagehan fikrê Weheb dî j'asîman] Nagehan fikrê Weheb ji asîman ME

178 keskipûş] kesk û pûş MK, B keskepûş E, MA, H jêk] ji DB

Hatinê jêk rakirin ew tar û mar] Hatîn ew jêk rakirin jê tar û mar AG, H Hatîn û jêk rakirin ew tar û mar M

179 ba] bad AG, H ban MM, ME j'eqalîmê] eqalîmê DB, M, D, B, GB femaye] vemayî B, D mayî M, MK

180 geybê] 'eynê D Maye] mayî GB, D, MK

181 dît] dî B, M

- 182 “Ger qebûl ket daye wî min Amîne
Pak û me‘şûm e, hebb e, mûqîne”¹⁴²

9- AMEDENÎ DER AN WAQTÎ ÎNTÎQALÎ NÛR BA AMÎNE¹⁴³

- 183 Paşê wê sirra ezîm û nûra tab
Nazilê qelbê Weheb bû iztirab
- 184 Çapik û çespan vegerya hate mal
Wî hîkayet kir ji bo mala xwe hal
- 185 Hin hîkayet kir ji bo zewcê, Weheb
Hem keramet hem ji cenga bi‘l-‘eceb
- 186 Gote zewcê: “Qenc e qaşid bêje min
Rabe biçne xanedana dilmezin
- 187 Bêje ‘Ebdulmuṭṭelib Min Amîne
Wê li nik zîba ‘efife, mûqîne
- 188 Ger ji ‘Ebdullah bibêtin ew qebûl
Temşiyet dê bêt û çêbît ew wuşûl

182 Pak û me‘şûm e, hebb e, mûqîne e] Pak û me‘şûm e, eff e, mûfn e MA, H

¹⁴² Piştî vê xaneyê di M de: “Şallû ‘eleyhî wesellimû teslîma
Heta tenalû Cenneten we ne‘îma”

Di HDN de li pişt vê xaneyê: “Selewatan buxwinin her çi hazîr”

Ger dixwazin hûn xelaş bin ji agir”

Di MA, AG, H, E, de li pişt vê xaneyê: “Ger divêtin hûn ji narê bin necat

Bi ‘eşq û şewqek hûn bibêjin eşşelat”

¹⁴³ Ji xeynî bêjeyên ku tên heman wateyê, sernivîsa vê beşê di hemî nusxeyan de hevpar e. Me ya MK’yê hîlbijart.

183 sirra] nûra MM,ME nûra tab] nûr û tab D

184 Çapik û çespan] Çapik çespan û M

185 Hin] Hem E, MA bi‘l-‘eceb] bû el-‘eceb B,DB, D, GB, M

186 biçne] biçye dilmezin] der mezin E

188 bibêtin] bêtin H, D,M dê bêt GB, bîten MA, E, AG

Çêbît] û çît AG, çîten E, MA

- 189 Nazik û sîma xweş û dilber ew e
Layîqa wî babeta wî her ew e”
- 190 Hat û ‘Ebdulmuṭṭelib kir ba xeber
Hem di ‘Ebdullah(i) ḥubbê kir eṣer
- 191 Gote dayê: “Rabe ey zîba xîşal
Zewceya bo min bixwaze bes delal
- 192 Ba cemal û ba kemal û ba edeb
Xweş eda, şêrîn lîqa, ‘alî neseb
- 193 Zûdî rabû Faṭîme dil şadîman
Nazîrê ber şûretê gul çehrekan
- 194 Pir şepal û gul ruxan û taze ‘eyş
Sakinanê beldeyê alê Qûreyş
- 195 Dilnewaz û pêk ve naz û qendileb
Kes nedî şêrîntir ez bînta Weheb
- 196 Amîne gul bû di gulzara cemal
Ḥusnê bêhed qed û qamet î‘tîdal
- 197 Dê çi bêjim ez cemal û me‘rîfet
Walîda Eḥmed bes e her ev şifet

189 sîma xweş] sîma û xweş M,B, sîmaî xweş MK

Layîqa] Lai’qa E, MA, MK, H

190 Hat û] Hatî B,DB ba] ew D kir] dikir B

193 Zûd] zûy MA Nazîrê] nazîr e E gul çehrekan] gulçehreyan MA,E

194 Pir] pur D,GB beldeyê] berdeên H, derîdeyê A perdeyê MM,ME,M, B,MK,GB berdeê DB

195 qendileb] qend û leb MM, B, MK, DB

197 ev] ew M,DB

- 198 Faṭîmê dît û vegerya zamîne
Gote ‘Ebdullah(i) beḥsa Amîne
- 199 Mîsle wê nabin şepal û nazenîn
Nê di dunyê nê di Firdewsa berîn
- 200 Caridi çû dît û ew nazik nîhal
Lê vexwarbûn babet in, herdû heval
- 201 Hat û ‘Ebdulmuṭṭelib rakir ji mal
Çûn ji babê xwestin ew re‘na şepal
- 202 Weqiyek zîv û hem weqiyek zeheb
Şed şutur şed pez ewî dane Weheb
- 203 Şed beqer cumle cuwan û şamîne
Bo hinarin pêk ve nexta Amîne
- 204 Hate ‘Ebdulmuṭṭelib wê sa‘etê
Kir tedarik kar û barê de‘wetê
- 205 Çêkirin zad û te‘amê bî‘l-‘eceb
Hem Qureyşî xwendin û hindî ‘Ereb
- 206 Amîne xemilî j’rêgê gulşenê
Zend û bazin, riştine j’rêgê xenê¹⁴⁴

198 Faṭîmê dît û vegerya zamîne] Faṭîmê çû dît vegerya zamîne
beḥsa] weşqa GB

199 şepal] beşir ME

200 vexwarbûn] vexware H babet in] babet û M

201 hat û] hat MM, M xwestin] xwest D,B

202 Weqiyek] weqyeke GB

Weqiyek zîv û hem weqiyek zeheb] Weqyeke zîv û weqyek hem zeheb D

Weqiyek zîv weqiyek hem zeheb MA,H

206 riştine] teşne’ê DB

¹⁴⁴ Ev xane di D de li derkenarê hatiye nivîsandin.

207 Xweşnewa û xweş eda hatin ‘Ereb
Cum‘e bû ew şev nehê maha Receb

208 Wê şevê anîn nîkah û ‘eqdê best
Bûk û zava man û şerbet dane dest

209 Der Mekke meşhûrî bû ev gotine:
“‘Ebdullah zava ye, bûk e Amîne”

210 Hêret û kerbê hemî ber ba kirin
Wê şevê wan go du şed jin jê mirin

211 Bûk û zava herdû çûne xelwetê
Şahiyane kefte bagê Cennetê¹⁴⁶

212 Zûdi Rîdwanan vekir babê cînan
Daketin dergahê nîran nagehan

213 Hûr û gîlman û çem û teyr û nebat
Hatine hemd û şenaya xweş lûgat

214 Ez demê can bexşî, Cibrîlê emîn
Mujde da ehlê semawat û zemîn

215 Cebra’îl got: “Hate nûra Eḥmedî
Hate şahê mîşlê wî çavan nedî

208 Wê şevê anîn nîkah û ‘eqdê best] Wê şevê anî nîkah û ‘eqd û best B, DB, MK dane]şekir ME
209 ev] ew AG, B, M, MK

210 ba] bad AG, M Wê şevê wan go duşed jin jê mirin] Wê şevê wan duşed jin jê mirin DB
¹⁴⁶ Ev xane di D de bi xaneyê dî xwê re cih guhertiye.

212 Zûdi] Zûd B nagehan] béguman B Rîdwanan] Rîdwanî DB, MK, GB, M Rîdwan B
Zûdi Rîdwanan vekir babê cînan] Zûd Rîdwan vekir babê cinan MA, E, AG

213 gîlman] wildan D

215 Cebra’îl got: “Hate nûra Eḥmedî] Cebra’îl “Hate nûra Eḥmedî MM, ME, MK, D, M, GB
Cebra’îl “Hate dewra Eḥmedî got] go OH, wî B, DB

- 216 Rabe mizgînê bibe j' mexlûqi ra
J' asîman û erd û ta tehte' s-sera
- 217 Ğulgule peyda bû der heft asîman
Şewta tesbîha melek çû lamekan
- 218 Hate xwarê Cebra'îl û mujde da
Keskî alayek li banê Ke'bê da
- 219 Mujde da mexlûqi hayê behr û berr
Cumle heywanat dizanî ev xeber
- 220 Xweş nîda hat ez yesar û meymene
Nûra Eħmed hat û çû nik Amîne
- 221 Hate nuranî şefî'ul-muznibîn
Hate Xeyru'n-Nasî Xetmu'l-Murselîn
- 222 Wê şevê hindî şenem bûn sernigûn
Textê Îblîsê le'în bû wajigûn
- 223 Lew li ser şûret revî teşbîhê mar
Hate Kohê Bûqûbeys û kir hewar
- 224 Zuryeta wî cumle hatin bînewa:
“Ev çi hale bêje me?” Wî gote wa:

216 j' mexlûqi] mexlûqi M, GB, DB, MK

217 heft] vet MM

218 Keski alayek] Kesk û alayek B Kesk alayek DB, M

219 dizanî] zanî M, D Cumle heywanat dizanî ev xeber] Cumle heywanati zanî ev xeber GB, MK, DB

222 sernigûn] sernexûn MM, E, MA

MM, M, GB, D

224 Ev] ew M

Textê Îblîsê le'în bû wajigûn] 'Erşa Îblîsê şeqî bû wajigûn
'Erşa Îblîsê şeqî bû wajigûn ME

- 225 “Lew li min çêbûye tirs û zelzele
Ba Muhammed Amîne bû hamîle
- 226 Hate dewra Ehmedî, dewra me çû
Lat û ‘Uzza dê biket bêavirû
- 227 Yek ji me îdî neşîtin bit ‘eyan
Wî li me rê girt ji çûna asîman
- 228 Hate xûnrêzê cîhangîrê sefak
Em ji destê wî hemî dê bin helak
- 229 Rohniya herdû cîhan û milletan
Ummeta wî çêtirînê ummetan
- 230 Dê çi bit halê me û tedbîr û ray?
Ay û way û ay û way û ay û way!”
- 231 Hem di subha wê şeva dewlet fuzûn
Textê şahanê cîhan bû sernigûn
- 232 Bêtekellum ma devê hindî mulûk
Şah eger hakim eger mîrê mulûk¹⁴⁹

225 çêbûye] çêbûne GB, D

226 Hati] hate D hat M avirû] abrû AG, H, MA,MM ab û rû] ME

227 îdî] eydî DB ji] û B

Wî li me rê girt ji çûna asîman] Wî li me rê girt çûna asîman MK,GB

228 cîhangîrê] cîhangîr û H

229 çêtirînê] xûbterînê D

230 Dê çi bit halê me û tedbîr û ray?] Dê çi bit halê me ey berê rey? DB

231 sernigûn] ser nexwin DB, E, H, MA, sernuxun] MM, ME

232 mîrê mulûk] mîr û mulûk HDN, MK, M, E,MA

¹⁴⁹ Piştî vê xaneyê di M de: “Şallû ‘eleyhî wesellimû teslîma

Heta tenalû Cenneten we ne‘îma”

Di HDN piştî vê xaneyê: “Hûn dixwazin ji agir xelaş bin tamam

Ber Muhammed eşşelatî we’s-selam”

Di MA, AG, H, E, OH de li piştî vê xaneyê: “Ger divêtin hûn ji narê bin necat

Bi ‘eşq û şewqek hûn bibêjin eşşelat”

10- DER MUDDETÎ WAQÎ‘ATÎ HEMLÎ AMÎNE¹⁵⁰

- 233 Amînê go: “Ta kî şeş meh çûne ser
Min ji hemla xwe nedî qet yek eşer
- 234 Paşê şeş meh gote min awaza geyb:
“Min li te mizgîn e, ey pakîze ceyb!
- 235 Wî digel te xatemê peyğemberan
Nasixê herfa kîtab û defteran”
- 236 Lê di xewnê da me dîtin bê‘eded
Enbiya’ û remz û nîşan û sened
- 237 Ewwela min dî ji min nûrek diçî
Qeşra Buşra min ji ‘eksa wê didî
- 238 Mahê ewwel hate Adem tēyyîba
Kir selam û gote hemlê: “Merhaba!”
- 239 Mahê sanî hate Şîş ez meymene
Gote min mizgîn li te ya Amîne
- 240 Mahê salîş hate Îdrîsê nebî
Kir selam û mizgîn ber hemla te bî

¹⁵⁰ Ji xeynî bêjeyên ku tên heman wateyê, sernivîsa vê beşê di hemî nusxeyan de hevpar e. Me ya HDN’yê hîlbijart.

233 Amînê go: “Ta kî şeş meh çûne ser] Amînê gotî: ‘kû şeş meh çûnê ser MA, H

234 Paşê şeş meh gote min awaza geyb] Paşê şeş meh gote awaza geyb ME
mizgîn e] mizgînî M, AG, H

Min li te mizgîn e, ey pakîze ceyb!] Min li te mizgîn, ey kîze ceyb E, MA
235 te] neh H

238 hati] ha DB

- 241 Mahê rabi‘ Nûh û xamis Hûd û hem
Hatin û mizgînî da min ez kerem
- 242 Mahê sadis hate Îbrahîm Xelîl
Da me mizgînî ji wê hemla cemîl
- 243 Mahê sabi‘ hate Îsma‘îl zebîh
Mujde bexşî min, ji wê hemla melîh
- 244 Mahê semin hate Mûsa ba wefa
*Îbşîrî ya Amîne bi ‘l-Muştefa*¹⁵¹
- 245 Mahê tasi‘ hate ‘Îsa j’ asîman
Mujde da min: “Hate sulţanê cîhan”
- 246 Ew ku şeş meh çûn ji hemla mûnqelîb
Gote ‘Ebdullah(i), ‘Ebdulmuţtelib:
- 247 “Ba tîcaret dê biçî ta semta Şam
Ez Medîne bar bikî temr û te‘am
- 248 Wê demê dê Amîne kodek bibî
Yek ziyafet lazim e da‘wet bibî”
- 249 ‘Ebdullah ew mahê rûyê gûl‘izar
Der Medîne şerbeta mergê vexwar

241 ez] pir H, AG

242 Di MK de “Mahê sadis hati Îsma‘îl zebîh”
ev riste bi risteya xaneya bin de cih guhertine.
Cemîl] Celîl MM,ME,MK, D, M, GB, B

243 Mahê sabi‘ hati Îsma‘îl zebîh] Mahê sabi‘ hati Îbrahîm Xelîl MK

¹⁵¹ Ya Amîne tu bi Mustefa bimizgin be.

246 çûn] çûne MA, H, E

Ew ku şeş meh çûn ji hemla mûnqelîb] Ew ku çû şeş meh ji hemla mûnqelîb MK

249 ew] an ji xeynî GB hemu nusxe

- 250 ‘Umrê ‘Ebdullah(i) bîst û pênc sal
Borî û wî kir ji dunya îrtîhal
- 251 Zanî ‘Ebdulmuṭṭelib ew waqî‘e
Herdû çavên Amîne bûn damî‘e:¹⁵²
- 252 “Esmerê min ma û xelqê kariwan
Hatin û peyda nebû rûh û rewan
- 253 Kan hebîbê min dilê min bû du nîm
Ah û hesret kodekê min ma yetîm”
- 254 Dar û ber bo wî girîn wê sa‘etê
Av û rohnîk nadenê qeṭ muhletê
- 255 Hem melek rabûn û gotin: “Ya Kerîm!
Nê hebîbê te Muḥemmed ma yetîm”
- 256 Malîku’l-mulkê mezin da ev cewab:
“Çêtirim bo wî ji xêra da û bab”
- 257 Ey xudawendanê ‘eqlê musteqîm
Kes nizanî qiyetê durra yetîm¹⁵⁴

250 Borî] borîn MM,D, B, GB, MK wî kir] kir wî MM,ME,H, MA, D, M, B

251 Zanî] çûn ji H,AG çavên] çavê M, MK,B

¹⁵² Ev xane di çapa A. Basîd de nîne.

252 peyda nebû] peydane ew D, M, GB,MK

253 Kan hebîbê min¹⁵³ dilê min bû du nîm] Kan hebîbê dilê min bû du nîm MK

254 Av] ab AG

255 Nê hebîbê te Muḥemmed ma yetîm] Nê Muḥemmed ma hebîbê te yetîm D

Malîku’l-mulkê mezin da ev cewab] Malîkê mulkê ezîm da ev cewab E

257 Kes nizanî qiyetê durra yetîm] Kî dizanî qiyeta durra yetîm E

¹⁵⁴ Di MA, AG, H, E, OH de li pişt vê xaneyê: “Ger divêtin hûn ji narê bin necat
Bi ‘eşq û şewqek hûn bibêjin eşşelat”

**11- AMEDENÎ WEQTÎ WELADETÎ SEYYÎDÎNA MUḤEMMED
ŞELLALLAHU ALEYHÎ WE SELLEM¹⁵⁵**

258 Ez rebî‘u’l-ewwela şev rewşen e
Heşti şev borîn li hemla Amîne

259 Ya neha za’ il bû jê tirs û ‘îna
Ya deha bû mujde, der Xîf û Mîna

260 Yazdehem bû gulgul û awazi hem
Zimzima tesbîhi der hindî Herem

261 Diwazdehem helbû şemala dewletê
Amîne mabû tenê der xelwetê

262 Wê şevê der Ke‘be ‘Ebdulmuṭṭelib
Mabû, bo te‘mîra erdê munqelib

263 Amîne got: “Mam tenê bêmêr û jin
Ez demek tirsam û lertzî hate min

264 Min dî xanî rohnî bû gayet belê
Çari jin hatin ji ruknê menzilê

265 Ba cemaî û ḥusn û nûranî Qemer
Ḥulleyê îstebreq û sundus di ber

¹⁵⁵ Ji xeynî bêjeyên ku tên heman wateyê, sernivîsa vê beşê di hemî nusxeyan de hevpar e. Me ya MK’yê hîlbijart.

258 şev] şeb B, MM, ME

260 Yazdehem] Yazdeh hem D, B yazdeh MK gulgul û] gulgule B
Zimzima] zimzim û B zemzem MK zemzema D

261 Diwazdehem] Duwazidehem MK Duwazdeh hem M, B
Helbû] hîlbû GB mabû] ku ma M tenê] bitenê MM, D, GB

262 Mabû, bo te‘mîra erdê munqelib] Mabû, te‘mîra erdê munqelib H, AG bo] bê D

263 got] go MM, B, MK, M, GB, D tenê] demek MM, ME lertzî] MA

264 bû] bî MK, GB gayet] pî gayet D çari] çarû MM, ME

Çari jin hatin ji ruknê menzilê] Çar jin hatin ji ruknê kin menzilê AG

265 Ḥulleyê] Ḥulle û GB, MK, M

- 266 Le 'leha, têt av ji ava Kewşerê¹⁵⁷
Zulfêha, şed ʔe 'ne dane 'enbere
- 267 Bejn û bala serw û sîmayê şefaf
Min şibandin tuxmeê 'Ebdulmenaf
- 268 Yek li destê rastê hat û yek li çep
Yek li piştê, yek li pêşim ba edeb
- 269 Ew kî bûn? Hewwa û Sare, Asiye
Ya li pêşim Meryema 'Îmranî ye
- 270 Meryemê husn û melaḥet zêde bû
Pal veda bû ew, ji bo min tekye bû
- 271 Nagehan bû zimzim û tesbîḥ û deng
Ba luḡethayê muxalîf rengereng
- 272 Rast û çep min dî kewakib têk firîn
Qafi ta qafi cîḥan bû enwerîn
- 273 Pêk ve dunya min dî bûye qurşa nûr¹⁵⁸
Meşriq û meḡrîb didîtin min ji dûr
- 274 Keski aleyek di meḡrîb da me dî
Yek li şerqê yek li banê Ke 'be dî¹⁵⁹

¹⁵⁷ Di MK de ev riste û ya bin cih guhertine.

266 ji] û MM,E, MA, M, MK Le 'leha] heha ME

267 serw] selv MM,ME,B, MK, M, D,GB

268 piştê] pûştê D Yek li piştê, yek li pêşim ba edeb] Yek li pişt û yek li pêşim ba edeb H,AG

270 veda bû] vedayî MM,ME,GB, D, M, B ew] min MM,ME,GB, D, M, MA, B wê MK

271 zimzim] zemzem MK, GB, D

¹⁵⁸ Ev xane di ME de nîne.

273 bûye] bû yek MK dî] didî AG, H, MA

274 Keski aleyek] Keski û aleyek B

¹⁵⁹ Ev xane di ME de nîne.

- 275 Emrê Cebra'îl kirî mîrê mezin
Mujde da ehlê semawat û zemîn¹⁶⁰
- 276 Daketin dergehê nîran nagehan¹⁶¹
Şahiyane hûr û Riðwanê cinan
- 277 Gulgûlîn hûrî di qeşrên Cennetê
Kî dizanît kar û barê qudretê¹⁶²
- 278 Hate Cibri'l û melai'k fewc û fewc
Çar kenarê Mekkehê bûn mewc û mewc
- 279 Nagehan ez têhnî bûm wê sa'ete
Min dî da destê min tasek şerbetê
- 280 Sipî wekî şîr û şêrîn wek 'esel
Nê ji wî şîr û 'esel bûne meşel
- 281 Min vexwar û têhnî çû fî'l-ħal ji min
Teyrekî sipî hat û ber mala di min
- 282 Wê demê min bo Muħemmed Muştefa
Nûra can û me'dena şîdq û şefa¹⁶³

275 Mujde da ehlê semawat û zemîn] Mujde da ehlê semawatan ji bin MM,HDN,GB, E, D,MK

¹⁶⁰ Ev xane di ME de nîne.

¹⁶¹ Ev xane di ME de nîne.

276 nagehan] bêguman HDN,GB, D, MK, M, B] baguman, MM Riðwanê] gilman MM

277 qeşrên] qeşrê B, MK, M, HDN

¹⁶² Ev xane di ME de nîne.

278 Cebra'îl] Cebrîl D,GB

279 min] me GB, MK,D tasek] camek EB

280 wekî] wek HDN, MK,M, OH

bûne] bûye MA, H,AG

281 fî'l-ħal] ħalî B, M, GB, MK, D,HDN

sipî] ispî B

ber mala] palî di min AG, E, MA per mala GB,] per mala di min MM.ME

¹⁶³ Ev xane di MK de di beşa bin de ye. Piştî vê xaneyê di M de: "Şallû 'eleyhî wesellimû teslîma
Heta tenalû Cenneten we ne'îma"

Di MA, AG, H, E, de li pişt vê xaneyê: "Ger divêtin hûn ji narê bin necat

Bi 'eşq û şewqek hûn bibêjin eşşelat"

12- DER İKRAMÎ QİYAM LÎ WÎLADETÎ XAYRÎ'L- ENAM 'ELEYHÎ EFDELÜ'S- SALATÎ WE'S-SELAM¹⁶⁴

Eşşelatu 'aleyk esselamu 'aleyk min babi esselam¹⁶⁵
Eşşelatu 'aleyk esselamu 'aleyk ya Xeyru'l-Enam¹⁶⁶
Eşşelatu 'aleyk esselamu 'aleyk min Rebbi Raḥîm
Eşşelatu 'aleyk esselamu 'aleyk min Rebbi 'azîm
Eşşelatu 'aleyk esselamu 'aleyk Eḥmed ya yetîm
Eşşelatu 'aleyk esselamu 'aleyk Eḥmed ya teham
Eşşelatu 'aleyk esselamu 'aleyk ya Mekkî û Şam
Eşşelatu 'aleyk esselamu 'aleyk kemleke min maqam
Eşşelatu 'aleyk esselamu 'aleyk ya bedru't-temam
Eşşelatu 'aleyk esselamu 'aleyk muzalel bi'l-gemam¹⁶⁷
Eşşelatu 'aleyk esselamu 'aleyk ya zeyni'l-qiyam¹⁶⁸
Eşşelatu 'aleyk esselamu 'aleyk min Rabi'l-enam
Eşşelatu 'aleyk esselamu 'aleyk Muḥemmed ya imam
Eşşelatu 'aleyk esselamu 'aleyk ya mehdi'l-enam
Eşşelatu 'aleyk esselamu 'aleyk min babi esselam¹⁶⁹

¹⁶⁴ Ev beş di M, B, E, MA, H, AG de tenê heye. Di B'de tenê bi sernivîs e.

¹⁶⁵ Ev riste di M, B, E, MA, H û AG de tenê heye.

¹⁶⁶ Ji vê risteyê heta tevlu risteya "Eşşelatu 'aleyk esselamu 'aleyk kemleke min maqam" tenê di B, E, MA, H, AG heye.

¹⁶⁷ Ev riste di M, B, E, MA, H û AG de tenê heye. Di E, MA, H û AG de "bi'l- zam"

¹⁶⁸ Ji risteyê heta tevlu risteya "Eşşelatu 'aleyk esselamu 'aleyk ya mehdi'l-enam" tenê di B, E, MA, H, AG de heye.

¹⁶⁹ Ev riste di M, B, E, MA, H û AG de tenê heye.

Piştî vê xaneyê di M de: "Şallû 'eleyhî wesellimû teslîma
Heta tenalû Cenneten we ne'îma"

Di vê beşê de risteyên ku tenê di M de hene evin:

Eşşelatu 'aleyk esselamu 'aleyk fi cenahi'l-zalam
Eşşelatu 'aleyk esselamu 'aleyk nesli'l-sekram
Eşşelatu 'aleyk esselamu 'aleyk te ya ḥebîbî
Eşşelatu 'aleyk esselamu 'aleyk te ya nesîbî
Eşşelatu 'aleyk esselamu 'aleyk ya 'awni'l-gerîbî
Eşşelatu 'aleyk esselamu 'aleyk ya meskî û ṭeyîbî
Eşşelatu 'aleyk esselamu 'aleyk ya nesli'l-zebîḥ
Eşşelatu 'aleyk esselamu 'aleyk zî'l-wechi'l-şabîḥ
Eşşelatu 'aleyk esselamu 'aleyk zî'l-nuṭqi'l-feşîḥ
Eşşelatu 'aleyk esselamu 'aleyk te ya Muḥemmed
Eşşelatu 'aleyk esselamu 'aleyk te ya mû'id
Eşşelatu 'aleyk esselamu 'aleyk Aḥmed ya Muḥemmed

**13- DER MEDHÎ HEBÎBÎ ÎLAHÎ SEYYÎDÎNA MUḤEMMED KÎ SAHÎBÎ ‘İZZ
Û CAHÎ¹⁷⁰**

283 Cumle zerratê cihan da ev seda
Kirne gazi pêk ve gotin: “Merheba

284 Merheba ey ‘alî sultân merheba
Merheba ey kanê ‘îrfan merheba¹⁷¹

285 Merheba merheba ey canê baqî
Merheba merheba ‘uşşaqê saqî¹⁷²

286 Merheba merheba dermanê derdan
Merheba merheba ey sirra Furqan¹⁷³

287 Merheba merheba ey zâtê mergûb
Merheba merheba ey xasê mehbûb¹⁷⁴

288 Merheba ey qurretu’l-‘eynê Xelîl
Merheba ey xasê mehbûbê Celîl

289 Merheba ji bo cumle yarê meqşûdê to
Merheba ji bo xaliqê mahebûbê to¹⁷⁵

¹⁷⁰ Ev beş di B û MK de tenê bi sernivîs in. Me ya B hilbijart.

¹⁷¹ Di HDN, E, MA û MK de cihê vê xaneyê hatiye guhertin û wisa ye:
“Merheba ey sultânê ‘alî merheba
Merheba ey ‘îrfanê xalî merheba”

Merheba ey sultânê ‘alî merheba | Merheba ey ‘alî sultân MM

¹⁷² Ev xane ji bilî MM û ME di B, H, E, MA de wisa ye:.

“Merheba ey canê baqî merheba
Merheba ‘uşşaqê şafî merheba”

285 saqî | şafî B, H, E, MA

¹⁷³ Ev xane ji bilî MM di ŞM, B, MA, AG de heye û wisa ye:

“Merheba ey sirra Furqan merheba
Merheba dermanê derdan merheba”

di ME de wisa ye:

“Merheba derdê derman merheba
Merheba ey sirra Furqan merheba”

¹⁷⁴ Ev xane tenê di MM û ME de heye.

¹⁷⁵ Ev xane tenê di MM û ME de heye.

- 290 Merheba ey mah [û] xurşîdê Xuda
Merheba êy ku ji Heq nabit cuda¹⁷⁶
- 291 Merheba ey reheten lî'l-‘alemîn
Merheba tu yî şeffî‘u’l-muẓnîbîn
- 292 Ey ji bo derê dilan dermanî tu
Ey ji bo mexlûqan hemî sultanî tu¹⁷⁷
- 293 Merheba ey iftiharê enbiya
Merheba ey semi‘ cem‘ê ewliya¹⁷⁸
- 294 Merheba hate şeffî‘ê îns û can
Merheba hate leîfê îns û can¹⁷⁹
- 295 Merheba ey nûra çeşma ummetê
Merheba ey suni‘ şahê qudretê¹⁸⁰
- 296 Merheba hate şivanê ummetê
Merheba hat bo me nûra dewletê¹⁸¹
- 297 Merheba ey şahibê ceş û hasem
Merheba ey kasirê Lat û şanem¹⁸²

¹⁷⁶ Ev xane tenê di MM û ME de heye.

291 tu yî] ente MM, ME, H,AG ey tu yî M, hafî MK

¹⁷⁷ Ev xane tenê di MM û ME de heye.

¹⁷⁸ Ev xane tenê di MK de heye.

¹⁷⁹ Ev xane di MK, HDN de tenê heye.

¹⁸⁰ Ev xane di HDN, EB,E, MA, M û B de tenê heye.

¹⁸¹ Ev xane di EB, AG û H de tenê heye.

¹⁸² Di vê beşê de xaneyên ku tenê di çapa EB de hene ev in:

Merheba ey nûra Xurşîdê Xuda
Merheba ey tu ji Heq nabî cuda

Merheba ey şahibê seyf û geza
Merheba ey mani‘ê Lat û ‘Uza

Merheba meîlûbê ‘alem her tu yî
Merheba ewladê Haşim her tu yî

- 298 Sicde bir her wê demê an nûra can
Dest hilînandin bi sûyê asîman¹⁸³
- 299 Pareyek ‘ewrê sipî ’ez asîman
Hat û hilgirt û ji min gai’b bû an
- 300 Hateve medhûn û pêçayî, kehîl
Pare ‘ewrek dî gehîşte ew cemîl
- 301 Girt û bir, lê hate guh min ev xeber:
“Girti wî dunya seraser behr û ber”
- 302 Hateve sipî pare ermîşek digel
Wî mijî ba le’le wek şehd û ‘esel
- 303 Lê belê xweş hate gûşem ev nida:
“Pêk ve zanî xelqehayê ’enbiya”

Merheba ey nûra Heq ra mazhar î
Merheba ey ewliya ra serwer î

Merheba ey bedrê ‘alem ya munîr
Merheba xelqê ketî ra destegîr

Merheba sultânê Cumle enbiya
Merheba ey nûra çeşma eşfiya

Di vê beşê de xaneyên ku tenê di nusxeya M de hene ev in:

Merheba tu yî sûwarê neh felek
Merheba xadem ji wî ra bûn melek

Merheba tu yî saqî ji ab gewr
Merheba di hunerê da tu yî umîda hebr

Di vê beşê de xaneya ku tenê di nusxeya HDN de hene ev e:

Merheba şefî’ê zenûb û xeta
Merheba ey kanê lutf û ‘aşa

¹⁸³ Ev xane di EB, û GB de bisernivîs e. Di D de berdewama beşa berî wê ye.

299 ‘ewrê] ‘ewrekî D, ‘ewrek EB gai’b bû an] gai’ban HDN

300 Hateve] Hate MK Pare ‘ewrek dî gehîşte ew cemîl] Pare ‘ewrek dî gehîştê bû delîl H, AG, EB

301 ev] ew AG,H

302 Wê] Xweş M

303 gûşem] guh min MM,ME,D, H, AG,EB

- 304 Min dî xanî bû ji teyran rengereng
Dim ji zumrûdan û hem yaqût e çeng
- 305 Paşê hatin sê nefer lê her yekê
Husn û şûret mîslê qurşa rojekê
- 306 Yekî der destê misîn e yekî teş
Yekî anî cameê sipî ez behîşt
- 307 Heftê caran şûşt û pêçan pir huner
Gotinê û her sê rabûn çûne der
- 308 Na'ête hedd û hesabê mu' cîzat
Muxteşer min gotine ne' t û şîfat
- 309 Dê çi bêjim ne' ta zatê enwerî
Ê ku 'alem cumle bo wî çêkirî
- 310 Mun' ekîs bûn wê şevê hindî şanem
Agirê Faris vemirya çû 'adem
- 311 Taze eywan xaneê Nûşîrewan
Rast û çep hejya û lertzî nagehan
- 312 Şeq bû kungir çarideh jê çûne xwar
Xewf û tirsek hate Kisra bêqerar

304 Dim] dum HDN, D

305 Husn û şûret] Husna şûret D,GB

306 Yekî] Wan yekî MK, êkî D, M, GB, OH Ey yekî HDN yekî 2] êdî HDN, E, MA,
sipî] pak B, E, MA

307 Heftê] hevti MK, heft AG, H
huner] xeber HDN,D, GB, MK, M, E, MA

pir] pur HDN, B ber D
Gotinê] Gohtinê E, MA, GB

311 hejya] hejyan B,HDN, MK

312 çarideh jê] çardeh eywan H

çûne] çûbûn HDN

313 Behra Sawe çik bû û hişk û nihan
Wadiya nav lê Semawe bû rewan¹⁸⁴

314 Ez serê hindî mulûkan taci ket
Zêde bû lê tirs û xewf û zelzelet

315 Der duşenbe diwazdehê ewwel rebî
Sala fîlê hate ew hemla bedî¹⁸⁵

14- AMEDENÎ DER AN WAQTÎ ‘EBDULMUṬṬALÎB EZ KA ‘BE¹⁸⁶

316 Rabû ‘Ebdulmuṭṭelib têkil seher
Got: “Me dî zimzim kete ruknê Hecer

317 Ke‘be çû secde mubarek bû meqam
Rukn û ban û beyt û lêk fikir selam

318 Rukneha, Allahû ‘ekber jê dihat
Hate mizgîna Muḥemmed ‘eş-şelat

319 Paki bûm ez Lat û ‘Uzza û şanem
Hat Ebu’l-Qasim şahê ‘alî ‘alem

320 Rast û çep xweş hate zîba ergenûn
Nê Muḥemmed hat û put bûn sernuxûn

313 Behra Sawe çik bû û hişk û nihan] Behra Sawe çikya hişk nihan” AG

¹⁸⁴ Di MK de risteya jor û ya jêr cih guhertine.

314 ket] keft D xewf] fikr MM, HDN, B, GB, M

¹⁸⁵ Di H, AG, OH de li pişt vê xaneyê: “Ger divêtin hûn ji narê bin necat

Bi ‘eşq û şewqek hûn bibêjin eşşelat”

¹⁸⁶ Ji xeynî bêjeyên ku tên heman wateyê, sernivîsa vê beşê di hemî nusxeyan de hevpar e. Me ya MK’yê hîlbijart.

316 têkil] wextê HDN digel M got] go MM, ME

zimzim] zemzem HDN, MK, D, OH

317 lêk] lê AG, H

320 sernuxûn] sernekun M

- 321 Hatîn ibrîq û legen misk û gulav
Ke ‘be şûştin mame heyran ez tev av
- 322 Ez bi der keftim ji Babê Şeybe zûd
Min Şefa û Merwe dîtin der sucûd
- 323 Pelg û dar û ber ji feyza Layemût:
“Ca’ena Ehmed Resûllullah” digot¹⁸⁷
- 324 Hate awazek: “Eya meznê Qureyş!
Ev çi¹⁸⁸ tirs û lertzî ye? Ey tîybê ‘eyş!”
- 325 Zûdi ‘Ebdulmuţtelip xweş hate mal
Teyreki mezin li banê çeng û bal
- 326 Bêhna Firdewsê ji hucra Amîne
Hat û der hingaft û got: “Ya sakîne!”¹⁹⁰
- 327 Amînê hat û ewî jê kir sû’al:
“Kanî ew nûra digel te ey şepal?”
- 328 Amînê gotê bo mawlûda mezin
Hativî navê Muħemmed gote min
- 329 Wê di xewnê de diye nûra mûbîn
Ger divêtin tu bibînî, dê bibîn

321 heyran ez] heyranê H, AG

322 keftim] kevtim ME dîtin] didîtin HDN

323 pelg] belg MM,ME feyza] feyzan D digot] got D, GB, H, AG, MK, M

¹⁸⁷ Ehmed Resullullah, ji me re hat.

¹⁸⁸ Di de “çi” nîne.

324 Ev çi tirs û lertzî ye? Ey tîybê ‘eyş!”] Ev tirs û lertzî ye? Ey tîybê ‘eyş!” B, E, MA

325 Zûdi] Rabû AG, H banê] malê MK

326 got] go hemu nusxe

¹⁹⁰ DÎ MK de ev xane û ya bin cih guhertine.

328 gotê] got û B, got D gotê bo] bo gotê MM Hativî] Hatifî GB, MK Hat wî M

- 330 Revti ‘Ebdulmuṭṭelib bo dîtinê
Şîr di destê nagehan yek rehzenê
- 331 Ne‘re’i zed hate ‘Ebdulmuṭṭelib
Heybetê girt û dilê wî murte‘îb
- 332 Nayêtin dîtin heta sê roj tamam
Da melek bêne tewafê xaş û ‘am
- 333 Hate ‘Ebdulmuṭṭelib pê xoşbiten
Bêtekellum maye ezman û dehen
- 334 Paşê çendî dîti ew nûrîn şabî
Rohniya çavê di bapîrê xwe bî
- 335 Amînê şîr da dehanê şekkerîn
Ta gehişî weqtê teslîma dayîn
- 336 Amînê got: “Min di xewnê da diye
Murđî‘e dê bit Helîma Se‘diye”¹⁹¹

329 Wê di xewnê de diye nûra mûbîn] Wê di xelwê da tenê nûra mûbîn MM,GB, M, D, MK, B Wê
xewnê de diye nûra mûbîn B tu] te GB, MK tenê] تنها ME dê] her HDN

330 Revti] reft D, M refti GB, MK, HDN reft û B

331 girt û dilê] di dilê H

332 Nayêtin] nabitin GB, M, D, E, MA, MK, B

333 xoşiten] hoyş û ten HDN xoş tebin H, AG xoyşiten GB xeyşeten M xoyşten D

334 Paşê çendî dîti ew nûrînşebî] Paşê çendî dît û ew nûrînşebî B, Paşê çû dît û wa wî nûrînşebî HDN
nûrînşebî] nûra şebî H, AG

335 dehanê] dihanê D, B, MK

336 Amînê got: “Min di xewnê da diye] Amînê min go di xewnê da diye” H

got] go GB, M, MK, B, D

¹⁹¹ Piştî vê xaneyê di E, MA,B de ev xane jî heye: “Hem bi cem wî dî ba ekramêt mezin
Hem li mu‘cizat dî jê zahir bibin”

Di HDN de li piştî vê xaneyê: “Selewatan buxwinin her çi hazîr”

Ger dixwazin hûn xelaş bin jî agir”

Di MA, AG, H, E, OH de li piştî vê xaneyê: “Ger divêtin hûn jî narê bin necat

Bi ‘eşq û şewqek hûn bibêjin eşşelat”

**15- AMEDENÎ ẖALÎME Û BORDENÎ MUẖEMMED ŞELLALLAHU ‘ELEYHÎ
WE SELLEM¹⁹²**

- 337 Mekkiyan kodek didane şîridar
 Da di germê da nebin kodek nezar
- 338 Hem qebîla Se‘dîyan dîger bolûk
 Her dihatin ta Mekkeh ţelbê biçûk
- 339 Wê qebîla Se‘diyan lê bû ğela
 Mêr û jin pêk ve ji birsan mubtela
- 340 Got ẖelîmê: “Rojekê em çend heval
 Bo geyanî çûne nava yek newal
- 341 Hem giya jî tê hebû hem ava sar
 Min giya xwar û ji avê hem vexwar
- 342 Hem hevalan ji giya û avê xwar
 Hate awazek xwudanî nadiyar:
- 343 “Ha niha biçne Mekke ey cumle jin
 Da mebarek bin ji mewlûda mezin
- 344 Xurrem ew zîba dayîn wê bo xwe bit
 Ey xweş ew pustanê ku şîr jê bixwit

¹⁹² Ji xeynî bêjeyên ku tên heman wateyê, sernivîsa vê beşê di hemî nusxeyan de hevpar e. Me ya MK’yê hilbijart.

337 Da] ta B

338 Se‘diyan] Se‘diye H Bolûk] Belûk GB

 Her dihatin ta Mekkeh ţelbê biçûk] Her dihatin Mekkeh ţelbet biçûk AG ev xane û ya bin cih guhertine.

339 Se‘diyan] Se‘diye H, AG ğela] xela GB birsan] pursan MK bursan B,D

340 geyanî] geyayî MM,ME,E, MA,B, GB, D giyaê MK, M

342 Hem hevalan ji giya û avê xwar] Hem hevalan jî giya û av xwar B,D

343 Ha niha] Han han B, M, MK Han û han HDN, GB, D Han û hanê H

344 dayîn] dabîn H, AG wê] dê D Ey] Eyê MK pustanê] bustanê B

345 Tirs gâlib bû li me, em hatine mal
Gote min Hâris: “Çi hal e ey heval ?

346 Min ji bo wî got, ewî got: “Ey hebîb
Belkî ew mewlûd ji bo me bit neşîb”

347 Min weled bû dîmrete ya dê çi kem
Qet ji birsan min nezanî dê çi kem

348 Nagehan min dî di xewnê da yekî
Ez birim avêtime rûbarekî

349 Sipî wek şîr û şêrîn û şehdiwar
Jê vexwe! Wî gote min sê çarî car

350 Ez ji xew rabûmeve têr û tijî
Her du pûstanê di min şîr jê rijî

351 Şahîban ez dîtîm û pîrsîn dirêj
Lêk tenbiye bû li min bo kes mebêj

352 Yek kerê laşer hebû lê pîr kesad
Hâris anî taze kurtan lê nehad

345 Tirs gâlib] Tirs û gâlib B, D Tirsê gâlib GB, MK, HDN
Tirs gâlib bû li me, em hatine mal] Tirs gâlib li me, em hatine mal H,
Tirs gâlib bû li me, hatine mal MM,ME,D, M, B,GB, MK,HDN
346 got] got û D got 2] gotê MK Belkî] Belku MM,ME
Min ji bo wî got, ewî got: “Ey hebîb] Min ji bo got û ewî got: ‘Ey hebîb MM,HDN, B Min ji bo got,
ewî go: ‘Ey hebîb M
347 çi kem] şikem M, MK, HND, B, D
Qet ji birsan min nezanî dê çi kem] Qet ji tirsan min nezanî dê ke kem AG, H
Birsan] bursan D
349 şîr] şîrî GB Jê] dê B vexwe] bixwe AG, H
349 Jê vexwe! Wî] Jê vexwar HDN
350 pûstanê] bûstanê HDN, B Ez ji xew rabûmeve têr û tijî] Ez vexwarim bûme ve têr û tijî H, AG
351 pîrsîn] pîrsî D pîrsîn GB, B, HDN Lêk] lêki B, MK tenbiye] tenbî D
Lêk tenbiye bû li min bo kes mebêj] Lê yekî tenbîne li min bo kes mebêj HDN
352 kerê] xerê ji xeynî GB di hemu nusxeyan de pir] pur MK, D, B

353 Kariwan rabû bi qeşda Mekkete
Bûm suwar û hem li ber min dîmrete

354 Dûre dûrî kariwanî leng û lûk
Ker ji çûnê bû û Haris ma xudûk

355 Gote min: “Da biçneve bêzeħmetê”
Min gotê: “Nê hate nûra reħmetê

356 Da biçine pêşî ûcağa Qureyş
Belkî halê me bibîtin taze ‘eyş”

357 Min dî yek merdê tewîlê enwerî
Ba serê rim wî îşaret da kerî:

358 “Ya Helîme ‘isrî‘î mizgîn li te
Tu dayînî bo Muħemmed xwezîya te

359 Tîz û xweş çûn bo kerê laġer meyan
Wê be rahê bir ji hindî kariwan

360 Ewwela min kir li Beħayê nezer
Çar teref pêk ve giya û lale ter

361 Kariwan danî li cayê tîbi ‘eyş
Jin hemî geryan li eşrafê Qureyş”

354 Dûre dûrî] Dûra dûra H, AG leng û lûk] lengê lûk HDN,B Ker] xer HDN kir D

355 Gote min: “Da biçneve bê zeħmetê] Gote min: “Wer da biçin bê zeħmetê” H, AG

Biçneve] çêteve B çêneve MK,GB, HDN reħmetê] dewletê ji xeynî MK hemu nusxe

356 belkî] belku MM,ME halê me] ‘eyşim MM,ME

358 Tu dayînî] Dê dayîn bî D

359 Tîz û xweş çûn bo kerê] Tîzi çû bo xweş xerê MK, Tîz û xweş çû bo kerê B, Tîz çûn xweş bo kerê
M, Tîzi çûn ew xweş kerê MM,ME

361 li] bi AG, H cayê] çiyayê MK

362 Gote ‘Ebdulmuṭṭelib: “Xweş Amîne
Nê divêtin bo Muḥemmed dayîne ?”¹⁹⁵

363 Qale: “*Haze ’l-emrû minhû qed beda*”¹⁹⁶
Hate goşê min ji hatif ev nîda:

364 “*Şafwetu ’r-Reḥman û Xeyru ’l-murselîn*”¹⁹⁷
Nîne ez geyrî Helîme kes dayîn”

365 Hatine nik Amîne jin ba surûr
Her çî zanî ew yetîm e çûye dûr

366 Ey xweş! ew zîba yetîmê şîrixwer
Her du ‘alem jêri ferman ser bi ser

367 Ey xweş! ew re‘na yetîmê şîricû
Nûra her du ‘alem ez ruxsarû

368 Ey Helîme hilgire an pakizat
Dewleta baqî û daîm bo te hat

369 Hat Helîme gote ‘Ebdulmuṭṭelib
Halê sal û halê qaḥṭa muzṭerib:

370 “Hatime bo yek puser ez bim dayîn
Ger li nik te dê hebî nî‘me’l-emîn”

¹⁹⁵ Di ME de ji vê xaneyê heta xaneya 402an 40 xane kêr in.

¹⁹⁶ Got: “Ev ferman, ji wî dest pê kir.”

363 hatif] hativ MM

¹⁹⁷ Saf û paqijê Rehman e û xêrtirîne yê hatine şandinan e.

364 kes] wê ji xeynî HDN hemû nûsxe

365 çî] çê MK, H, GB, HDN, çe M ew] go H çûye] çûve B,GB çûvi D

366 Ey xweş! ew zîba yetîmê şîrixwer] Ey xweş! ew bustanê zîba şîrixwer B, E, MA
jêri] jîr D

367 re‘na] zîba MM şîricû] şîrcû D, M, GB

369 Hat] wê HDN Hîn MM,D,GB,MK,M,B Helîme] Helîmê HDN, M

- 371 Gotê ‘Ebdulmuṭṭelib: “Namêṭ çi ye?”
Gotê: “Navê min Helîma Se‘dî ye”
- 372 Gotê ‘Ebdulmuṭṭelib: “Xweş mehd î, tu
Hem bi ḥusn û hem bi ḥilm û se‘d î, tu
- 373 Wê li nik min nûra çeşm û qûtê can
Mîslê wî nabin nebûne, der cîhan
- 374 Lê yetîm e, durre bêmîslê mehê
Ez li cih babê me ger dê tu bibê”
- 375 Gote ‘Ebdulmuṭṭelib: “Da ez biçim
Bêjime mêrê xwe pirsê jê bikim”
- 376 Hat û gote Ḥariş, ew zîba xîtab
Ya Helîme weyhekê! wî da cewab:
- 377 “Dê çi ke tu ba yetîmê bêpeder”
Ma Helîme damena şebrê duker
- 378 Hate çûnê kariwanî kir cihêz
Dîti Ḥariş rohnîkên wî bûne rêz
- 379 Gotê Ḥariş “Ez dibînim tu xudûk”
Gotê: “Heqq e! Dê biçim ez bêbuçûk”

372 Hem bi ḥusn û hem bi ḥilm û se‘d î, tu] Hem bi ḥilm û hem bi ḥusn û se‘d î, tu AG, H, D
373 Mîslê wî nabin nebûne, der cîhan] Mîslê wî nêbûne, nabin der zeman GB, H, AG, MK, D
374 Ez li cih babê me ger dê tu bibê] Ez li cihê babê me dê tu bibê AG, H
375 mêrê] zewcê ji xeynî GB di hemû nûsxeyan de jê] lê MM
376 Hat û] Hati B, MK Hat M
Ya Helîme weyhekê! wî da cewab] Ya Helîme damena şabrê bigerAG, H
377 bêpeder] bêpuder GB, D
378 kariwanî] karwan û GB, D Dîti] dît B, MK, M dîd D dît û HDN
rohnîkên] rohnîkê M, D, B, MK, HDN
379 Gotê] got D

- 380 Gotê: “Her bîne ewî tîflê yetîm
Qet *tewekkelna ‘alellahî’l-kerîm*”¹⁹⁸
- 381 Xweş vegerya pêşî ‘Ebdulmuṭṭelib:
“Hatime durdaneyê te ey muḥib!
- 382 Da biçêne pêşê danaya Emîn
Min ku dî ew ḥusn û dîdara şêrîn
- 383 Yek regem xalî nema ez muḥbetê
Bûme yexsîra wî ez wê sa‘etê
- 384 Xweş me hilgirt û kenî ew nê gelek
Nûra xendê, lahiqa çerxa felek
- 385 Bûse da min çavê pûstanê yemîn
Xweş mijî ba her du lêvên şekkerîn
- 386 Rast vexwar û dev neda sedyâ çepê
Hişt ji bo dîmre ba îlhama Xwedê
- 387 Wextê çûnê hate ‘Ebdulmuṭṭelib
Da me zad û tişt û min got: “*Ya muḥib!*”
- 388 Min bes e ev kodekê nûrîn cemal
Dewlemend im dê çî kim ba tişt û mal

380 Her] hanê AG, H han MM, HDN, B, D, M GB

¹⁹⁸ me xwe siparte Xwedayê Kerîm

383 regem] demê H nema] nemam H yexsîra] yeğsîr D yeqsîr GB yefsîr MK

384 Xweş me hilgirt û kenî ew nê gelek] Xweş dema hilgirt kenî bê hed gelek AG, H

385 Bûse] puse HDN çavê] çav û HDN, M, GB, MK pûstanê] bustanê B bistanê HDN

Bûse da min çavê pûstanê yemîn] Bûse da min her du çavê enwerîn AG, H

lêvên] lêvê M, MK, HDN

386 Rast vexwar] Rastê xwar HDN, MK, GB Rast xwar MM, D, E, MA, M

Hişt ji bo] Hişti bo HDN, M, B, MK, GB Hişt bo D

387 Wextê] weqtê D, M, MK, HDN got] go D, M, MK, B, GB

388 ev] ew M, HDN çî kim] çî kem GB, HDN lê çî kem MM

- 389 Xwesti xatîr min, ji ceddê Amîne
Amîne hilgirt û ew nazik ten e
- 390 Dabû ber bêhna xwe rohnîk bûne çem:
Ey Muhemmed! tê biçî ez dê çi kim
- 391 Dûriya te şohti qelbê Amine
Lê çi kim ev şugle ne b' destê min e
- 392 Ey hebîbe min Muhemmed ey delal!
Bêje da rohnîk nebarin bo te al
- 393 Tu bike ferwar û da şebr û sukûn
Bo me bêtin werne, can û dil me çûn
- 394 Tu emanetê Xudê bî ey ciger!
Ey Helîme fî emanîllah biber”
- 395 Bir Helîmê bo xwe ew durra yetîm
Êy xweş! Ew dayîne se'd û helîm
- 396 Şubhê rabû kariwanê Se'diyan
Ew kerê lağêr ji bo wan her siyan¹⁹⁹

389 ew] ey B

390 Ey] ew HDN tê] dê HDN, B, GB, M, MK, D çi kim] çi kem HDN, B, GB, MK

391 çi kim] çi kem GB, MK, D şugle] şûle GB, HDN şugul MK

392 nebarin] nebatin HDN

393 Tu bike ferwar û da şebr û sukûn] Tu bike şebr û qerar ya Reb sukûn H bike] bikî MM

394 emanetê] emaneta m Xudê bî] Xudê yî B ciger] puser D

395 dayîne] daniyeMK se'd û] se'da HDN

Bir Helîmê bo xwe ew durra yetîm] Wê Helîmê bo xwe bir durra yetîm ji xeynî AG, H hemu nusxe

396 kerê] xerê HDN Ew kerê lağêr ji bo wan her siyan] Ew kerê lağêr di pêşî kariwan AG, H

¹⁹⁹ Di OH de ev xane destpêka beşeke din e û beriya wê jî ev xane heye:

“Ger divêtin hûn ji narê bin necat

Bi 'eşq û şewqek hûn bibêjin eşşelat”

- 397 Ḥariṣ anî û Ḥelîme bû suwar
Paxila rastê Muḥemmed tê veşar
- 398 Ya çepê danîbû tê da dîmrete
Ker sivik çû çapik û bêzeḥmete
- 399 Ewwela çû Ke‘be sê car secde ber
Şaniya ew hate çûnê pir huner
- 400 Dî kusan ew ker Nebî xweş çû gelek
Wê li pişta wî suwarê neh felek
- 401 Ew kerê laḡer di pêşî kariwan
Wek siha teyrê li deştê bû rewan
- 402 Se‘diyan gote Ḥelîme: “Ey heval!
Ew kerê laḡer me go naçîte mal
- 403 Vê demê sê lê suwar in, mîslê teyr
Wê diçîtî nagehê wî kes bi seyr”
- 404 Ker bi ezman hat û gote Se‘diyan:
“Qeṭ ‘ecêb nîne ji çûna min ‘eyan

399 car] çar MK pir] pur MK, B, D, GB

Şaniya ew hate çûnê pir huner] Şaniya ew hate çûnê ber xeber HDN

400 Dî kusan] kusa M, GB, B kesan AG, H pişta] puşta B, HDN, GB suwarê]nebiyê MM
neh] nuh HDN Dî kusan ew ker nebî xweş çû gelek] Dî kusan ew ker nebî çû nû çelek MK
Dî kusa çûn xweş nebî ew ker çelek GB Dî kusa ew ker nebî çûn xweş çelek M, D Dî kesan ew ker nebî
çûn xweş gelek AG, H Dî kusa ew ker nedî çû xweş çelek HDN

401 kerê] xerê HDN di] ti GB

402 Ḥelîme] Ḥelîmê B kerê] xerê MK

403 sê] bisihê ME

404 bi] vi D ‘ecêb] ‘ecêbî D ‘eca’ib MK, GB

- 405 Wê li pišta min Resûlê Rebbê ‘erş
Jê re destê wî ji ‘erşê ta bi ferş
- 406 Seyyîdê mexlûqê Rebbî’l-‘alemîn
Çêtirînê ewwelîn û axirîn”
- 407 Qewmê Se‘dî pêk ve gotin ev meqal
Nîne ev qewl û şada îlla xeyal
- 408 Mîslê bayê kefte rê û her bigar
Dane ser yek koh û deşt û kohisar
- 409 Gote ezmanê Helîme ev beyan:
“Em bi dûr keftin ji xelqê kariwan
- 410 Min dî sakî erbe‘ûne rahiban
Tabi‘ê esqûfekî eswed qeban
- 411 Wî digote rahiban weşfa hebîb:
Wexte rabitin Muḥemmed ‘en qerîb
- 412 Kasirê eşnam û qettalê Cuhûd
Bê‘eded nîşanê wî hatne wucûd²⁰⁰

405 Wê] dê ME pišta] pušta MM,GB, HDN, B

403 nagehê wî] nagihêtê D, GB, MK, B nagihîştin HDN

407 ev] ew D, M

408 koh] kor D, HDN, B, GB

409 dûr] der AG, H, M

410 rahiban]rahîba GB qeban] qaba MM,ME,GB, MK, D

411 Wexte] weqte ji xeynî D hemu nusxe. rabitin] rabbit AG, H

qerîb] qerîban MM

412 Kasirê eşnam û qettalê Cuhûd] Kasirê qettal eşnam û qettalê Cuhûd D

Bê‘eded nîşanê wî hatne wucûd] Bê‘eded nîşan hatine wucûd D, GB

Bê‘eded nîşanê hatine wucûd MK

²⁰⁰ Ev xane di MM û ME de nîne.

413 Ez ji wan borîm û çendî, nê gelek
Şu'leya nûra Muḥemmed çû felek

414 Wey heware! "Gote usqûfê kebîr"
Hey ev e, wernê û jêk rakîn bi şîr

415 Destî da şîran û hatin şubhê şan
Xweş li pey me mulḥidanê bê'eman

416 Dê çî kem ya Reb meded mîrê mezin
Wah! Muḥemmed roḥniya çavê di min

417 Hate nêzîkî me koma rahîban
Min Muḥemmed dî nezer da asîman

418 Hate xwarê agirê mîslê şîhab
Tê werhat û şotin ew ahlê 'ezab

419 Hatevî [gote] ji yûmna şehsuwar:
"Uhlîke 'l-kuffaru mîn nari 'l-Cebbar"²⁰³

420 Kariwan hat û hemî em çûne mal
Pêk ve pê xweş bûn nîsa û hem rîcal²⁰⁴

413 Ez ji wan borîm û çendî, nê gelek] Ez ji wan borîm û çendî, gelek H

414 Hey] Heyî MK her MM,ME

Hey ev e, wernê û jêk rakîn bi şîr] Hey ev e, wernê ved bikin bi remî û şîr AG, H

Hey ev e, wernê ji destê rakîn bi şîr HDN Hey ev e, wernê jêk rakîn bi şîr MK

415 Destî] dest M, B da] dan MM,ME hatin] rabûn D

Destî da şîran û hatin şubhê şan] Dest dida şîran hatin şubhê şan AG, H

416 çî kem] çî kim ji xeynî HDN hemû nusxe

416 Wah] Wa ji xeynî HDN hemû nusxe

418 werhat] werat D, HDN, B şotin] şotî M sohtin B, D

419 Hatevî gote] Hatîfî govta E, B Hatîfî gofta MM,ME,M, MK, D, GB Hatîfî gotar AG, H

Cebbar] Qahhar AG, H

²⁰³ Kafir ji agirê Cebbar helak bûn.

420 Kariwan hat] Karwan hatin M

²⁰⁴ Di HDN de li pişt vê xaneyê: "Hûn dixwazîn ji agir xelas bin temam

Ber Muḥemmed eşşelatu we's-selam"

Piştî vê xaneyê di M de: "Şallû 'eleyhî wesellimû teslîma

16- WAQİ'AT KÎ DER MEYAN QABÎLEYÎ BENÎ SA'DIYAN BÛDEN²⁰⁵

- 421 Dewleta baqî geħa nav Se'diyan
Rizq û ni'met hat û nabin teħliyan
- 422 Dexl û dan û ga û pez lê zêde bûn
Hin cefa û miħnet û alami çûn
- 423 Pêk ve hatin dest û pê lê bûse dan
Muħbeta wî kefte qelbê cumlekan
- 424 Hem Helîme ġerqi îh'am û kerem
Wê Ebu'l-Qasim li malê, bo çi ġem
- 425 Gote: "Wellahî'l-ezîm ev nazidar
Hat û min came ne şûştin qeṭ tu car
- 426 Tahir û pakîze paqij her me dî
Bewl û ġa'it mîslê ewret min nedî
- 427 Bû du salî û xiraman sû bi sû
Têkilî lu'ba biçûkan qeṭ nebû

Heta tenalû Cenneten we ne'îma"
Di H, AG, OH de li pişt vê xaneyê: "Ger divêtin hûn ji narê bin necat
Bi 'eşq û şewqek hûn bibêjin eşşelat"

²⁰⁵ Ji xeynî bêjeyên ku tên heman wateyê, sernivîsa vê beşê di hemî nusxeyan de hevpar e. Me ya D'yê hîlbijart.

422 Hin] Hem H,M

423 lê] wî D bûse] pûse HDN Pêk ve hatin dest û pê lê bûse dan] Pêk ve hatin
dest û pay wî ramûsan AG, H

424 ġerqi] ġerq û B îh'am] ihsan MM,ME

425 tu] çû Ji xeynî AG ,H, GB hemu nusxe

Hat û min came ne şûştin qeṭ tu car] Hat û min cilbû ne şûştin qeṭ çû car GB

426 pakîze] pak û HDN bakîze M pakîz û MK

427 lu'ba] le'ba D, B, GB

- 428 Rojeke wî, heftiya yek kodekî
Heftiya wî mah û meh ba salekî²⁰⁶
- 429 Ewwelê lefza wî maye min li bîr
Gote wî: “Allahû ekber min kebîr”
- 430 Salê sê, nazik nihalê rûhê can
Arezû kir wî şivanî nagehan
- 431 Hem bi hukmê karê ummet perwerî
Bû şivanê laiqê peygemberî
- 432 Rojekê wî gote: “Ey mader bira
Kanî ?” û min gotê: “Pez birye çera”
- 433 Gote: “Qeṭ inşaf e dayê! ez li mal
Ew li germê, ez vexûm ava zelal”
- 434 Gote min wî: “Ez ditirsim hasidî
Bêṭ û te çavîn biket ya raşidî”
- 435 Gote min: “Dayê! me bispêre Xwedê
Min tewekkul daye wî, tu min bidê
- 436 Şubhê min dayê ‘aşa û zad û hem
Bûn şivan û her du çûne ber gênem

²⁰⁶ Ev xane di B û di çapa Behadîn Amidî de nîne.

428 heftiya]hevtiya MM

430 Salê sê, nazik nihalê rûhê can] Salê sê, nazik nihalê rûhê can H Salê sê, nazik nihalê rûhê can B

431 Hem] Hîn MM,ME,GB, MK, D Hîn B şivanê] şivan û AG, H, M laiqê]MM,ME

432 Ey] min B û] ew HDN

434 Gote min wî] Gote wî min MM, ME,D çavîn] çavan MK

435 Min tewekkul daye wî, tu min bidê] Min tewekkul daye wî, hem tu bidê AG, H
min] MM,ME de nîne

436 zad û] zadi GB

Bûn] Bû MK, B, D

- 437 Ey şivanê berreê birca bere
Jêri gopalê te ‘alem yekser e’²⁰⁷
- 438 Ba terehûm pez çerînî can û dil
Rehmê tu ber cumle ‘alem muştemîl
- 439 Ey şivanê kodekê zîba dilêr
Xwezuya wî berxî ji dîdara te têr
- 440 Weqtê êvarê şivan dê bête mal
Ez diçûme pêşi zîbayê delal
- 441 Gote min dayê, me got: “Hatim îleyk
Ey Muhammed sellemellahû ‘eleyk”²⁰⁸
- 442 Dûmre hat û gote min ev xweş cewab:
“Min ji wî dîne eca’ib bêhisab
- 443 Pa nehed ber xîşk û keski bûn temam
Her çî ew dît, dar û ber lêkir selam
- 444 Bêjite pez dê here, ew dê biçî
Wer neçe, naçît û sakîn multecî

²⁰⁷ Dora vê xaneyê di D de 440 e.

438 Ba] Ya GB çerînî] çerîn û B, M çerîn ew AG, H

439 kodekê] kodeka AG, H dîdara] dindara HDN

441 Gote min dayê, me got: Hatim îleyk] Gote dayê hat me go: Hatim îleyk B Gotî dayê hatim go: Hat îleyk MK Gotî dayînê hat û me go: ‘Hatim îleyk’ D Gotî dayê hat û me go: ‘Hatim îleyk’ GB Got dayê, hat go: ‘Hatim îleyk’ M Gote dayê hatim hatim îleyk MM,ME

²⁰⁸ Ey Muhammed silava Xwedê li ser te be.

442 Dûmre hat û gote min ev xweş cewab] Dûmre hat û gote min xweş ev cewab HDN Dûmre hat gote min xweş ev cewab AG, H

443 Pa nehed] Pa nihad D, GB, HDN xîşk] xûşk MM,HDN û] an D

keski bûn] keskin bû B,M dît] dî MM bît ME

444 Bêjite] Bêjete B Wer neçe, naçît û sakîn multecî] Ger neçin bêjite genem yek jê neçî AG, H

- 445 Rojekê pez bû belavî wadiyê
Min vegêrandin ji tirsî ‘adiyê
- 446 Gote min: “Bo çi tu nahêlî dilêr!
Pez biçî? min got: “Cihê qeygane şêr”
- 447 *La texafû*,²¹⁰ gote min pez çû çere
Nagehanî hate me ew qeswere
- 448 Wê Muhammed dit û dûvê xwe hejand
‘Aşiqane hate pêş û ser nihand
- 449 Girti goş û gotinê yek du meşel
Min ne fehmî wî çi gotê, ger digel²¹¹
- 450 Şêr rabû çû û îdî qet kes nedî²¹²
Pez çerî xweş rehet û kefte qedî
- 451 Anî yek pez min şikêna destihêj
Hate pêşê wî yedê xwe kir dirêj
- 452 Destê an pez girt û malê ba delal
Wê demê rabû pezê mîslê gezal

445 vegêrandin] vegêrave MK, GB, D vegêrane M vegêra ev B

446 Cihê] çihê D

²¹⁰ Netirse.

447 gote min] wî gote min MM,ME ew qeswere] ew xwed qeswere ME

448 dit] dî AG, H nihand] nihand B, MK

449 ne fehmî] nizanî D gotê] gotin MM,ME,HDN, GB, M gohtin B

²¹¹ Di D riste û ya banî cih guhertine.

²¹² Di D ev riste û ya bin cih guhertine.

450 çû] cû B kefte] kefte B, MK,OH kefte qedî] kefqedî MM asan kerî ME

çû û] çûye HDN çerî] çerîte MM

qet] ji xeynî AG, H di nusxeyên din de nîne.

451 pêşê] pêş û GB, OH şikêna] şikênand AG, H

452 pezê] bezê D, M,MK,GB,OH malê] zîba HDN

- 453 Weqtê zuhrê rojekê bêkar û bar
Dumre çapik hat û gazî kir: Hewar!
- 454 Cohte merdim bo Muḥemmed hat û bir
Ez nizamim ba birayê min çi kir
- 455 “Wa Muḥemmed” got û rabun mêr û jin
Gote Haris: “Wa Helîme wey li min!
- 456 Hate kuştin der gerîbê berkê ‘eyş
Dê çi bêjim, pêşî salarê Qureyş
- 457 Pêk ve rabûn xaş û ‘amê Se‘diyan
Lê Helîme zû gehiştê an zeman
- 458 Gote: “Min dî der tebessum le‘lê şûr
Jê diçû çerxa felek ustûne nûr
- 459 Bûse da min, her du çavên surmeyî
Ew çi bû hate hebîbê min tu yî”
- 460 Gote min: “Hatin dû merdê ba cemal
Şeklê nûranî, ji nûra layezal
- 461 Destê min girt û revand anîme hêr
Daniyame erdê û der dest e, kêr

453 kir] hê GB, B, HDN,D, OH

Dumre] Zumre M, Zumre HDN

Dumre çapik hat û gazî kir: Hewar!] Dumre çapik hat digazî hey: Hewar!

454 Cohte merdim] Cote merdim AG,H, D,M, OH, cohte merdim B

455 rabun] rabu B

Wa] Wah HDN

456 Dê] Ez AG, H

457 gehiştê] gihiştê MK

458 Gote] Gotî GB, HDN, OH Gotî D

le‘lê]emilê MM,ME

Gote: “Min dî der tebessum le‘lê şûr] Got: “Min dî dewra yetîmê le‘lê şûr AG,H

459 Bûse] Pûse HDN çavên] çavê HDN, M,MK OH, çavêd B

461 min] B

hêr] kêr HDN êr] MM,ME

revand] revam ji xeynî OH hemu nusxe

- 462 Sîneya min wî du ker kir ta bi nav
Jê derîna qelb û aḥsem tev av
- 463 Wî bi destê xwe dilêm teqlîbi kir
Nuqṭeya eswed derîna jê vekir”
- 464 Gote min: “Ev beḥreyê dêwê le’în
Min ji te avêt, ey şahê Emîn!”
- 465 Êdî, anî yek misîn û yek legen
Şûşt û pak û nerm û nazik bêmiḥen
- 466 Wê demê danîne cî qelb û ceger
Mohreke mezin ji nûrê hate der
- 467 Mohri kir hem qelb û cayê bûye şeq
Hate ser yek ew, ba emrê mîrê Heq
- 468 Rakirim danîme cih bêzeḥmetê
Got: “Bikêşe ba dehan ez ummetê”
- 469 Ba dehan kêşam û ez bûme giran
[Got]: “Bikêşe ba hezaran her wesan”
- 470 Hatê kêşan û me rakir ew hîzar
Gote wî nûrîn cebahê gul’îzar:

462 aḥsam] aḥsayem OH,GB,MK,D,M

Sîneya min wî duker kir ta bi nav] Sîneya min ker kerî û ta belaf

464 Min ji te avêt, ey şahê Emîn!] Min ji te avête, der şahê Emîn! MK

465 bêmiḥen] bêmeḥen D, MK,GB misîn] mesîne D, mesîn HDN,GB

466 cî] cih GB,MK,OH çih D

467 kir] kirin B, E,AG,MA

468 cih] cê OH,HDN çî GB,D

Got] Go MM,ME,B,M, MK,D

469 kêşam û] kêşame M kêşan AG, H

hezaran] hezarî GB,D

470 kêşan û] kêşanî OH kêşam M

- 471 “Ger bikêşî ba cemî’ê ummetê
Dê girantir bêti ji nûra rehetmetê”
- 472 Herdukan ez dame ber bihna xwe şaf
Her du çeşman û serê min kir tewaf
- 473 Mîslê berqa xatîfe, rabûn û çûn
Min didîtin ta di çerxê berze bûn
- 474 Got Helîmê, ev beyan û ev meqal
Min ji wê hilgirt û em hatine mal
- 475 Qewmê Se‘dî gote min: “Çi sakin î?
Rabe hilgir wî bibe nik kahinî
- 476 Min bire nik kahinî ew qîşse got
Kahinî hilgirt û da ber sîne got:²¹³
- 477 “*Uqtulû haze’l-gulame*,²¹⁴ min digel
Wer ne, dê baîl biket dîne Hubel”
- 478 Negehan min dî yekî merdê mezin
Rim li kahin da, libasê wî kevin²¹⁵
- 479 Qewmê kahin bû helak ew jî herê
Min Muḥemmed anî û hatim li rê
- 480 Min dî yek jin ba girîn û şîn û ah
Ber kenarê bîrê, bir ser xakê rah:

471 ji] M,GB,D, MK bêti ji] bêti û MM,ME,B

472 çeşman û] çeşmanê AG,H

473 berze bûn] bezre bûn D di] li H didîtin] tidîtin GB

çerxê] cerxê M

²¹³ Xaneyên 475 û 476 di çapa Bahattin Amedî de nînin.

²¹⁴ Vî xulamî, vî zarokî bikujin

²¹⁵ Xaneya 478 û 479 di D de cih guhertine.

- 481 Wey li min, min yek puser bû can û pak
Çû di bîran da û axir bû helak
- 482 Min Muḥemmed anî û min gote: “Wer
Mû‘cize ger te hene, bînete der”
- 483 Wî îşaret kir bi tilya nûrîn av
Av bi serkeft û puser ber rûyê av
- 484 Ew ji avê hate der rabû qiyam
Gote an dem: “*Ya Muḥemmed es-salam*”²¹⁶
- 485 Hate awazek: “Te‘accub nîne ger
Ew ji bîra kodekan ku bîne der”
- 486 Ew te‘accub bo çawan ew suwar
Dê xelaş ket van gunehkaran ji nar”
- 487 Paşê ez çûme serî û her du çav
Lê reşandin ‘enber û misk û gulav
- 488 Hate dengê hatifî: “Ya Mekketê
Ê ji te hate belê wê hate te”

481 Wey li min, min yek puser bû can û pak] Wey li min, bû yek puser bû canê pak MK,
Wey li min, yek puserek bû canê pak D

482 Mû‘cize ger te hene, bînete der] Mû‘cize ger te hene, dê bîne der OH, AG, H,D,M,GB
Mû‘cize ger te heye, dê bîne der MK Mû‘cize ger te hene, wê bîne der B

483 nûrîn av] nûra bav MK nûra şaf OH, nûra nav H, nûr û nav AG

²¹⁶ Ya Muḥemmed silav.

485 Ew ji bîra kodekan ku bîne der] Ew ji bîran kodekan bînete der] MM,M,GB,HDN, MK,OH
Ew ji bîran kodeka dê bîne der B ku bîne]bînete ME

486 Ew te‘accub bo ku çawa ew suwar]Ew ta‘accub bo çawan ew şehsuwar OH,
Ew te‘accube ku çaga ew şehsuwar B , Ew ta‘accub bo ku çawa şehsuwar MK
Bel ta‘accub ew cuanê şehsuwar AG, H bo çawan] bo ku çawan MM,ME

487 reşandin] reşandî MM,ME

489 Ketme karê, wê demê ez dem bi dem
Amîne pir jê gerîb e da bibem²¹⁷

**17- BAZ AWERDENÎ ҲALÎME MUҲEMMED ŞELLALLAHU ‘ELEYHÎ WE
SELLEM BÎ MEKKEÎ ŞERÎFE²¹⁸**

490 An ker anî û Ҳelîme bû suwar
Hem li ber sîne hebîbê namidar

491 Rû bi Ke‘be hat û ew bêtirs û bîm
Ew kerê çûn xweş me dî hate heşîm

492 Hate goşê an Ҳelîme ev newa
Xweş newayê can fedayê ez hewa:

493 “Ey haşîm û ey Һarem pak û temîz
Hate bo te bejn û balayê ‘ezîz

494 Hate sultânê felek jêrine‘al
Hate cananê du ‘alem ‘eksê xal

495 Hate mehbûbê du şed Yûsif ғulam
Hate muxtarê ku ‘erş û ferşi ram

496 Hate bo te ey Mekke weqtê surûr
Şed hezaran nûrê sîmayê binûr

²¹⁷ Piştî vê xaneyê di B,MA, E de ev xane heyê: Hem li bo ceddê wî eqrabil-elam
Kî li cih babê wî ye sahib ruhem

Piştî vê xaneyê di M de: “Şallû ‘eleyhî wesellimû teslîma
Ҳeta tenalû Cenneten we ne‘îma”

Di AG, H, OH de li pişt vê xaneyê: “Ger divêtin hûn ji narê bin necat
Bi ‘eşq û şewqek hûn bibêjin eşşelat”

489 pir] pur D, GB, B

²¹⁸ Ji xeynî bêjeyên ku tên heman wateyê, sernivîsa vê beşê di hemî nusxeyan de hevpar e. Me ya D’yê
hilbijart.

490 ker] xer MM,ME,HDN,E,MA,AG,H,MK,D,M,B,OH an] ber ME

491 çûn xweş] xweş çûn MK

492 newayê] nidayê AG, H, OH

- 497 Nê tu bûyî menzila rûhaniyan
Ta qiyamet rukbedarê hâciyan
- 498 Rast û çep fikrê Helîme kes nedî²¹⁹
Wê di girdaba teheyyur da xwe dî
- 499 Her peya pey hate awazê şêrîn
Muştefa wê daniyan de ser zemîn
- 500 Da biçîtin telbe ket kanî kî ye?
Xweş dibejin vê newaya ‘aliye
- 501 Kes nedît û hateve ew hate rê
Muştefa lê berze bû, ber da girî
- 502 Deng helîna wê li banê koh çiya
Ah û wah! Durrdaneyê min kê reva?
- 503 Mekkiyan gotin: “Me hay jê nîne qet
Wê verêtên av û rohnîk bûne şet
- 504 Pîremêrek hate pêş û ba ‘asa
“Ey Helîme! Ev çi hal e bo Xweda!”
- 505 Min ji bo wî gote halê renc û ah
Gote min: “Wer da biçîne pêşi şah”

497 bûyî] bûye GB,D

²¹⁹ Di MM û ME de ev xane bi ya bin re cih guhertiye.

498 di girdaba] di gêriya AG, H

499 Her] hem ME

500 dibejin] dibejî AG, H,D,HDN,GB,M NM

502 çiya] çeha GB, D, OH çiha ME,B, ciha MM

koh] ko MM,ME,D,M,B,GB,OH

banê] ban û HDN, OH, MK,GB

503 verêtên] ferêtên D,GB

- 506 Ez birim ta pêşî ‘Uzzayê şenem
Gote min: “Ev geyb zane, pir kerem
- 507 Nê hezaran berze wî peyda kirin
Mîslê te bêçare wî pir şa kirin”
- 508 Secde bir ew pîremêr got: “Ey şenem
Ev Hêlîme hatiye bêje te hem
- 509 Kodekê wê der Mekke winda bû lê
Îsmê an kodek Muhemmed bû belê”
- 510 Wî, Muhemmed gote ‘Uzzayê şenem
Ser teşîfî hate secde gote hem:
- 511 “Tu here ey pîro! Ew çi gotin e
Ew Muhemmed hat û nê ‘ezla min e
- 512 Sernixûn û şermisar in, em ji wî
Hem kesad û bê‘eyar in, em ji wî
- 513 Ew zeman çûyî, hewe em xweş divîn
Baregaha wî gehîşt û em revîn

506 ‘Uzzayê şenem] ‘Uzza û şenem AG, H

pir] pur GB, D, OH

507 pir şa] şada AG,H

508 Secde bir ew pîremêr got: “Ey şenem] Secde bir pîrî û gotî: “Ey şenem MM,ME,M,OH,MK,GB,D

Secde bir pîrî û kanî ey şenem HDN

bêje] pêşî D,HDN,MKGB,OH,M

509 winda] wunda OH,D MK wenda B,HDN

510 ‘Uzzayê şenem] ‘Uzza û şenem AG, H

511 hat û nê] hatnê MM,ME

512 Sernixûn û şermisar in, em ji wî] Sernixûnim şermisar im, em ji wî MM Sernixûnim şermisar im, ez ji wî ME

513 Ew zeman çûyî, hewe em xweş divîn] Ew zeman borî ku em tê xweş bibên AG,H

Baregaha] Barigaha OH

- 514 Rabe ey pîrê hewayî hate roj
Bes bi navê wî dilê min tu bisoj
- 515 Nê ji navê wî dilerzin asîman
Hem ji hubba wî kelîne behr û kan”
- 516 Heybetê xweş girte pîrê rihsipî
Wî ‘aşa avêt û lerzî mîslê bî
- 517 Lê Helîme gote pîrê hêşetê
Ger çi ez keftime behra heyretê²²⁰
- 518 Yek demê ba wî li min we‘zê diket
Yek demê seknî bi min rehmê diket
- 519 Kodekê min wê revandin geybiyan
Ġeybiyanê keskepoşê asîman
- 520 Ez ji kê nalem ji kê gazin bikem
Her çi ew bêjite, ez dê wê bikem
- 521 Gotina geybê îcazet min nebû
Lew dibêjim, Eħmedê min berze bû

514 Rabe ey pîrê hewayî hati roj] Tu here pîrê hewayî hati roj HDN
roj] roz OH bisoj] bisoz OH Bes] Pes HDN

515 Nê] lê HDN

516 rihsipî] risipî OH

517 keftime] kevtime B,OH

²²⁰ Xaneyê 517 û 518 di D de cih guhertine.

518 seknî bi] ber wî diket] dibet OH, GB,M,HDN

519 keskepoşê] kesk û boşê B revandin] revayî MM,ME,MA,E,B,OH,M,HDN,D revaye MK

Ġeybiyanê] Ġebyanê GB

520 Her çi ew bêjite, ez dê wê bikem] Her çi ew bêjite min, ez dê wê kem B, OH Her çi ew bêjite min, ez wê dikem M Her çi ew bêjite min, dê ez wê kem AG,H bikem] dikem GB dikim HDN

dekem D gazin] gazind MM,AG,H,M gazî ME ji] MM

521 Gotina] Gohtina B,D,MK,GB

- 522 Ger bibêjim hal û esrarê derûn
Dê bibêjin dîn e, sewda ye, cunûn
- 523 Gote pîrê: “Ey Helîme vê bike
Hemdê Rebbanî û hem şukrê bike
- 524 Haşelîlah ew Muhemmed berze bî
Belkî ‘alem dê di wî da berze bî
- 525 Bo Muhemmed her zeman û her mekan
Şed hezaran nobedar û pasiban”²²¹
- 526 Zanî ‘Ebdulmuṭṭelib ew waqî‘e
Av û rohnîk çûn ji çavan damî‘e
- 527 Hate ber dergahê Ke‘be ew bi soz
Gote: “Ey ‘alîmê sirra şev û roz
- 528 Min dî sîmayê xweşê durra yetîm
Dîtine aşar û îhsana Kerîm
- 529 Naşibîte me eger çi ku j’ me ye
Kîmyaya feḍl û îhsana te ye

522 esrarê] eḥwal D dîn e] dêhn e B,MA,E

523 hem] her MK,D,GB

524 Belkî] Belku GB,B, D, MK

525 pasiban] paseban B pasupan D pasipan MK, OH

²²¹ Nuxxeya GB ji vê xaneyê pêve kême.

526 Av û rohnîk çûn ji çavan damî‘e] Av û rohnîk çûn çavan damî‘e OH

çûn] çû M,B,MA,E Av û rohnîk çûn ji çavan damî‘e] Her dû çavê Amînê bûn damî‘e HDN

527 Gote: “Ey ‘alîmê sirra şev û roz] Ey ‘alîmê sirr û ey danayê roz M,D,MK,OH Ey ‘alîmê sirrê

danayê biroze AG, H ‘Alîmê sirran û danayê buroze HDN Ey ‘alîmê bêje wî danayê roj MM

Wî ‘alîmê pîr û danayê roj ME

528 Dîtine aşar û îhsana Kerîm] Dîtine aşar û îhsan ey Kerîm D,M,MK, Dîte aşar û hem îhsana Kerîm

HDN Ev xane di nuxxeya AG, H de: “Tu muyeserkî cemala wî yetîm

Dîtina ajar û îhsana Kerîm”

529 Naşibîte me eger çi ku j’ me ye] Naşibîte me eger çi ji me ye AG,H

Kîmyaya] Kîmya û B,HDN,D,M,OH

- 530 Tu biheqê feql û îhsana ‘ezîm
Bêje min eḫwalê wî ʔiflê yetîm”
- 531 Nagehanî hate awazê leʔîf
Han û han biçne Tuhameê şerîf
- 532 Wê li bin dara Yemamê û gemam
Bûye sîwan û dikeve wî mudam²²²
- 533 Pir dîkin tesbîḫ û der kef munqelib
Rabû zû çû ʔelbe ‘Ebdulmuṭṭelib
- 534 Çû ku rûniştî li bin dara Yemam
*Qale: “Men ente eya şîrîn gulam?”*²²³
- 535 Gote: “Ey namêm ji min pîrsî bi lez
Ez Muḫemmed îbnî ‘Ebdullah im ez”
- 536 Gote: “Ez ceddê te me ey rûḫê can
Ey ḫebîbê min ‘ezîzê xanedan”
- 537 Dabû ber sîne, sûwar kir hate mal
Hate malê taze nûra layezal
- 538 Amînê çav bûne rewşen we’s-selam
Hem ji mewlûda Nebî temme’l-kelam²²⁴

530 min] me MK biheqê] biheq û HDN,MK

531 Han û han biçne Tuhameê şerîf] Han han tu here Tuhameê şerîf H Han û han] nuhan B, ha niha OH

532 yemamê] îmamê HDN, OH dikeve] dikefa D,HDN gemam] gulam H

²²² Di MM û ME de ev xane bi xaneyê 533an re cih guhertiye.

533 dîkin] diket AG,H

zû] ew D

Pir] Ber B

²²³ Got: “Tu kiyî ya xulamê şîrîn”

535 Ey] wî OH

‘Ebdullah im] ‘Ebdullah me HDN

536 Gote] Got M,D Gotî B,OH,MK

18- HAZA MENACATÎ MEWLANA MUHEMMED BATÊ RAHİMALLAHU
TE‘ALA WE HEM XİTMÎ KİTABÎ MEWLÛD

539 Eħmeda! çavê te ma zağe ‘l-beşar

Yek îşarata te îñşeqqe ‘l-qemer

540 Hukmê tu carî ji ‘erşî ta bi ferş

Ey ji nûra te munewwer ta bi ‘erş

541 Ateşê Mûsa çi bû? ruxsarê tu

<<We ‘d-dûha>> nûra dilê hişyarê tu ²²⁵

542 Der di nûra te, ziyayê mihr û mah

Lê me‘ellahî‘l-Celîlê barigah

543 Nê ji na‘leyna te ey durra yetîm

Fexr û teşrîf e ji bo ‘erşê ezîm

544 Her du ‘alem çi siha îqbalê tu

Sonda <<We ‘l-leylî>> bi zulf û xalê tu ²²⁶

545 Hem tu rûh û hem rewanê can û dil

Pêşi bejnaya siha te bû xecil

²²⁴ Di AG,H, OH de li pişt vê xaneyê: “Ger divêtin hûn ji narê bin necat
Bi ‘eşq û şewqek hûn bibêjin eşşelat”

di M de: “Şallû ‘eleyhî wesellimû teslîma
Heta tenalû Cenneten we ne‘îma”

541 hişyarê] hişbarê HDN

²²⁵ Di Qur’anê de di serê sureya Duha’de: “Bila danê sibehê ku rohiya wênî biriqandî sibehê temsîl dike,
şahit be”

542 Der di] dur di MK,D,HDN

Celîlê] Celalê OH,M,D,HDN

544 siha] siya HDN

²²⁶ Di Qur’anê de, di serê sureya Leyl de: “ Bi şevê, gava radipêçe”

545 Pêşi bejnaya siha te bû xecil] Pêşi bejna te siha ku li bû xecil AG,H Pêşi bejna te siha te bû xecil
M,E,MA

Pêşi bejna bêsiha te bû xecil D Pêşi bejna bêsiha te bûn xecil OH, Pêşi bejna te siha te bûn xecil MK
bû] bûn ME,B siha] siya HDN

- 546 Canfidayê bejn û balayê te bim
Mest û sergerdanê sîmayê te bim
- 547 Şehriyarê çetreyê 'ewrayî tu
Xetîê şeq bû ber felek, tuğrayî tu
- 548 Şehsuwarê duldulê kewn û mekan
Waşilê wehdet seraya lamekan
- 549 Min hebin sêşed hezar ezman û dev
Yek demê gafil nemînînin roj û şev
- 550 Weşfê husna te bibêjin şubh û şam
Şed qiyamet dê biçin hêj natemam
- 551 Ya Resûlellah! Resûlê îns û cin
Ya şefî'ê sedrê dîwana mezin
- 552 Tu şefa'et ke ji bo me aşîyan
Werne, nefsa şûme naket qenciyan
- 553 Ya Kerîm û ya *Îlahe 'l-'alemîn*
Ya Rehîm û ya 'Ezîm û ya Metîn
- 554 Hêvîdarê rehîm û îhsana te yîn
Talibê ikram û gufrana te yîn

546 te bim] te me ME,AG,H

547 'ewranî] 'ewrarayî MM,HDN,D,MK,M,OH,B,MA,E

548 duldulê] dundulê MM

549 şev] şeb HDN nemînînin] nemînîm M

550 husna] îhsana HDN

553 Ya Rehîm û ya 'Ezîm û ya Metîn] Ya 'Ezîm û 'Ezîm û ya Rehîm û ya Metîn HDN,M
Ya 'Ezîm û ya Rehîm û ya Metîn MM,ME

- 555 Hazîrê guhdarê mewlûda Resûl
 Hêviya me tu bikî ya Reb qebûl
- 556 Nê tuyî Ğeffar û Settarê ‘uyûb
 Me bibexşî û bigufranê zunûb²²⁷
- 557 Hem li da û babê hindî mu’ mînîn
 Hem li hindî mu’ mînatana ecme‘în
- 558 Tabî‘e an şehsuwarê ummetê
 Pêk ve rabîn dê biçêne Cennetê
- 559 Ewwela bo rewzeya nûrîn nîqab
 Şaniya bo al û ezvac û şehab
- 560 Şalîşa bo enbiya û murselîn
 Rabî‘a bo ewliya û mu’ mînîn
- 561 Hem ji bo huccac û guzzatan temam
 Hem ji bo vê meclisa şahib te‘am
- 562 Hem ji bo her çar îmamê ceddeyê
 Hem ji boyî katibê vê nusxeyê
- 563 Bo cemî‘ê Muslimînê şalihe
 Bo feqîrê BATEYÎ el-fatihe

555 Hazîrê] Herkesê M Hazîr û D, HDN, MK, E, H

556 settarê ‘uyûb] settaru’l-‘uyûb OH, B, MK, E, MA, AG, H

Me] Ma MM, ME, OH, MK, D, HDN

²²⁷ Di çapa Behadîn Amedî de piştî vê xaneyê xaneyên 561 û 562 tên. Xaneyên 557, 558, 559 û 560 nînin.

562 boyî] bo wî MK, M, D, OH, B bona H bo ew E, MA bo vî MM

563 Muslimînê] Mu’ mînînê MM, ME, MK

ENCAM

- 1) Li ser dîroka jidayikbûna Mela Huseynê Bateyî, lêkolîneran agahiyên ji hev cûda dane. Lê li gorî hin delîlên ku me di vê tezê de aşkere kirine, em karin bibêjin ku Mela Huseynê Bateyî di sedsala XVIIan û XVIIIan de jiyaye.
- 2) Bateyî, kîtêba xwe ya bi navê “Hemaîl” di serdema Îbrahîmxanê Mîrê Hekkarî (1700-1742) de nivîsiye. Ev berhem, bêtir ji dua, ayetên Qurana pîroz û peyvên parastina sihrê pêk tê. Ev berhem bi erebî û farisî ye, ayet bi erebî ne û daxuyandin bi farisî ne. Di derkenarên wê de bi kurdî daxuyanî hene.
- 3) Di kitêbên dîroka edebiyata kurdî de hin agahî hene ku Bateyî çîroka gelerî ya bi navê “Zembîlfiroş” nivîsiye; lê me nusxeyek ku mexlesa Bateyî li ser be nedît.
- 4) Helbestên wî yên belawela ku li deverên cuda bûn, di salên dawîn de hatine civandin. Ji van helbestan hin jê munacaat hin jê ne‘et û hin jê jî helbestên ku temaya wan evîna beşerî ne.
- 5) Mijara vê tezê, berawirdkirina nusxeyên Mewlûda Melayê Bateyî ye. Me 12 nusxe berawird kirin; lê em bi ser nusxeya resen ve ne bûn. Lewra çewtiyên hemû nusxeyan hebûn.
- 6) Rûpelên hin nusxeyên Mewlûda Mela Huseynê Bateyî, hatine qetandin an jî eşkere ye ku kêr in.
- 7) Sernivîsên nusxeyên Dersaadetê, Şêx Muşeref, Xulûsî, Osman Beg, Muhemmed Şakir, ya Misrê û ya Ortahîsarê nînin; lê yên nusxeyên din hene. Beşên nusxeyên bêsernivîs, bi xaneyên selewatan hatine veqetandin. Sernivîsên ku hene gelek caran wateya wan weke hev e; lê hemu beş, bi heman sernivîsê nehatine nivîsandin. Lewra cihê veqetandina beşan ne weke hev e. Hejmara sernivîsan ne weke hev e. Lewra di hin nusxeyan de du beş an jî sê beş peve ne. Sernivîsên nusxeyan bi tevayî farisî ne. Lê di nav wan de weke çapa Berlînê û destxeta Diyarbekirê nêvî bi farisî, nêvî bi kurdî ne. Ji ber ku nusxeya Diyarbekirê nêvcî bû, me yên bi farisî û ji

wan jî yê kin hîlbijartin. Di sernivîsan de gelek caran çewtiyên farisî hene. Di çapên nûjen de sernivîs li gorî wateya beşê bi kurdî hatine nivîsandin.

- 8) Guhertina cihê xaneyan û risteyan bi tevayî di nusxeya Dihokê û Mîllî Kutupxaneyê de çê bûye. Di nav nusxeyên Mewlûdê de bi tevayî di nusxeya Dihokê de cihên xaneyan hatiye guhertin (bnr. Xaneya 39, 46, 211, 449). Guhertina cihên risteyan jî bi tevayî di nusxeya Mîllî Kutupxaneyê de çêbûye. (bnr. Xaneya 266,313). Carînan cihên peyvên jî hatiye guhertin (bnr. Xaneya 434)
- 9) Xaneyên selawatan ku li dawîya beşan hatine nivîsandin, di hemu nusxeyan de nînin û yê ku hebin jî ne weke hev in. Di nusxeya Muhemedê Muksî, di ya Mahmûdê Beyazîdî di ya Gundê Batê, di nusxeya Diyarbekirê, ya Mîllî Kutupxaneyê, ya Dihokê û Berlînê de xaneyên li ser anîna selawatan nînin. Di Haziq de ev xane hene lê ne weke hev in. Di nusxeya Muhemmed Abdullah, Abdullah Golî, Hewlêr, Ehmed û ya Ortahîsarê de ev xane li dawîya beşan dubare dibe û weke hev e. Lê di çend beşên nusxeyên Muhammed Abdullah û Ehmed de ev xane nîne. Di nusxeya Misrê de xaneya selawatan heye, li dawîya hemu beşan dubare dibe; lê naşibe tu nusxeyên din.
- 10) Beşa ku bi “Eşşelatu ‘aleyk esselamu ‘aleyk” dest pê dike û li ser Muhemmed (saw.) selawatan tîne, tenê di nusxeya Misrê, Berlînê, Ehmed, Muhemmed Abdullah, Hewlêr, Abdullah Golî de heye. Di van nusxeyan de jî hin riste ne weke hev in. Di nusxeya Berlînê de tenê bi sernivîs e. Me di beşa “Eşşelatu ‘aleyk esselamu ‘aleyk” de reqem nedan risteyan. Lewra nusxeyên ku ev beş tê de hene, ji 15 risteyan pêk tê û xane jê naderkevin. Ji aliyekî din ve jî ne li gorî kêşa mewlûdê ne. Ji ber ku ev beş di nusxeyên kevintirîn û hemû nusxeyan de nîne û yê ku ev beş tê de hebe jî riste û dora risteyan ne weke hev in, dibe ku ev beş di nusxeya resen de tunebe.
- 11) Beşa 13an ku bi “Merheba” dest pê dike di hemu nusxeyan de nîne. Yê ku tê de hebin jî hejmara xaneyan, wate û dora wan ne weke hev in. Xaneyên ku tenê di xusxeyekê de bin me, ew di tîbîniyê de nîşan da. Ji ber cudabûna van xaneyan mirov karî bibêje xaneyên ku bi “Merheba” dest pê dikin di nusxeya Bateyî de hebe jî mustensîxan li gorî xwe ev xane nivîsandine. Lewra di nusxeyên kevintirîn

weke nusxeya Muhemedê Muksî, nusxeya Mela Mahmûdê Beyazîdî û nusxeya Mîllî Kutupxaneyê de xaneyên ku bi “Merheba” dest pê dikin hejmara wan 8 û 7 e; lê dûvra hejmara wan di nusxeyên din de bêtir bûye. Ji ber vê yekê jî têheva hejmara xaneyên hin nusxeyan zêde bûye. Ji ber ku nusxeya herî kevin ya Muhemedê Muksî ye û beşa “Merheba” Feqî Mustefa bi ser ve zêde kiriye, em karin bibêjin ku di nusxeya resen de ev beş nîne. Nusxeya Gundê Batê bêdîrok e û beşa “Merheba” tê de nîne. Eger ku dîroka wê nusxeyê bê fêmkirin û ew dîrok ji 1790î kevintir be, wê pîrsgirêka beşa merheba çareser bibe.

- 12) Ji aliyê ziman ve bêtir bandora erebî li ser Mewlûda Bateyî heye. Çiqasî peyvên farisî bi kar anîbe jî, ev ne qasî bandora erebî ye. Lewra terkîb, hevok û peyvên erebî zehf in. Ji bilî çend peyvên tirkî pêve tu bandora tirkî nîne.

ÇAVKANÎ

Adak, Abdurrahman: Têbîniyên Dersên Paleografya û Zanista Helbesta Kurdî, Mêrdîn, 2012

Adak, Abdurrahman: Destpêka Edebiyata Kurdî ya Klasîk, Nûbihar, İstanbul, 2013

Amedî, Sadiq Bahaeddin: Mewlûda Melayê Bateyî, Wela, Baxdat, 1982

.....: Hozanvanêt Kurd, Kurrî Zanyariy Iraq, Baxdat, 1980

Amidî, Zeynelabidîn: Behcetü'l-Enam Bi Şerhî mewludî sahîbî'l-Meqam fî yewmu'l-Qiyam, Mekteba Seyda, Diyarbekir, 2011

Çağmar, M. Edip: Edebî Açidan Arapça Mevritler, İlahîyat, Ankara, 2004.

Bazîdî, Mela Mahmûd, Camieya Risaleyan û Hikayetan Bi Zimanê Kurmancî, amd. Ziya Avci, İstanbul, 2010.

Burkay, Kemal: Kürtler ve Kürdistan, Deng Yayınları, İstanbul 1997

Devellioğlu, Ferit: Osmanlıca-Türkçe Ansiklopedik Sözlük, Aydın Kitabevi Yayınları, Ankara, 1996

Doskî, Tehsîn İbrahîm û Muhsîn İbrahîm: Melayê Bateyî Jiyan û Berhem, Spîrêz, Hewlêr, 2005.

Durre, Abdurrehman: Dengê Kurdistanê Dîwan 1 Evîna Welat, Melsa Yayınları, İstanbul, 1992.

Ebdussamed, Ebdulbasid Muhammed: Mewlûdî'n-Nebî, Nûbihar, İstanbul, 2003

Êsî, M. Huseyn; Girdarî, M. Se'îd; Bêrkevanî, M. Muhammed: Wergera Qur'ana Pîroz Bi Zimanê Kurdî, Nûbihar, İstanbul, 2008

Farqînî, Mele Muhammed Garsî: Meala Fîrûz Şerha Qur'ana Pîroz, Nûbihar, İstanbul, 2003

Farqînî, Zana: Türkçe- Kürtçe sözlük, Enstûtiya Kurdî, İstanbul, 2000

Findikî, Seyîd Feyzullah: Mewlûda Şerîf Hate Safa Di Mewlûda Mustafa, Halk matbaacılık, Cizre, 2004

Heyderî, Şex Muhemmed Emîn: Mewlûda Nebî, Lîs, İstanbul, 2007

<http://www.kurandaara.com//7> Tîrmeh 2012

Hûnî, Mela Mehemed Elî: Mewlid, Weşanxaneyê Vateyî, İstanbul, 2004

İslamoğlu, Mustafa: Hayat Kitabı Kur'an, Düşün Yayıncılık, İstanbul, 2011

Kavas, Ahmet: "Afrikada Mevlid Uygulamaları", Diyanet İlmi Dergi, (hejmara taybet) r.561, Ankara, 2000.

Kızıl, Hayrettin: Diyarbakır ve Çevresinde Yazılmış Mevlitlerin Konularına Göre Tasnifi Denemesi, Şarkiyat ilmi araştırmalar dergisi, sayı VII, r.124, Nisan 2012

Kurdo, Qanatê: Tarîxa Edebiyata Kurdî, Özge Yayınları, Ankara, 1992

Kurşun, Mela Silêman: Mewlûda Pêxember, Beroj, İstanbul, 2010.

Mela Muhemmed Kurê Mela Ehmedê Xursî: Nezma Şêrîn Der Mewlîd û Sîreta Resûlê Emîn, Kızıltepe, 2008.

Mela Muhemmed Siraceddîn Kurê Ebdilhekîmê Xelîlî: Kitêba Durra Birincî Mewlûda Kurmancî Mewlîd-î Şerîf, amd. M.Siddik Ataç, Doğuş, Nusaybin, 2001

Mela Musa Celalî Bayezîdî: Feyzu'l-Qarîrî'l-Mebde' Şerhi'l-Mewlûdi'l-Kurdî,

Mela Nurullah el-Xeyûtî El-Gudiskî: Sehli'l-Mewrid fî Şerhî'l-Mewlîd, Sembol, İstanbul, 2010.

Nas, Ehmed: Fêkiyê Narencî Mewlûda Kurmancî, Cizîr, 1990.

Osmân, Bayburtlu: "Tevârîh-i Cedîd-i Mir'ât-ı Cihân", Süleymâniye Ktp. Mikrofilm Arş., nr. 478, vr. 250.

Osman, Muhammed Emîn: Dîwana Melan, Bexdat, 1986.

Paşa-zâde, Kemâl: "Tevârîh-i Âl-i Osmân", I. Defter, Millet Ktp. Ali Emîrî, Tarih, nr.: 30, vr. 9^a

Puexî, Mela Kamilê: Mevlidî Nebî, Transkriberdox, W. K. Merdimîn, Vate, h.19., zimistan-wisar, 2003

Sadinî, M. Xalid: Mela Huseynê Bateyî, Nûbihar, İstanbul, 2011

Seccadî, Elaeddîn: Mêjûy Edebî Kurdî, Çapxaney Marûf, Baxda, 1952

- Shakely, Ferhad: Modern Kürt Öykü Sanatı, wer. Rohat Alakom, Avesta, İstanbul, 1998.
- Şemrexî, Huseyn: Mewlûd, Melayê Bateyî, Nûbihar, İstanbul, 2011
- Tulum, Mertol: Tarihî Metin Çalışmalarında Usul, Deniz Kitapevi, İstanbul, 2000
- Turan Mustafa: Mewlûda Şerîf Ji Ewwel Heta Axir Rêberê Xelasî, Dua yayıncılık, İstanbul, 2011
- Xak, Mela Şewqî: Mewlûda Nebî, Elele Birlik, Nusaybin, 2003
- Xasî, Ehmedê: Mevlidê Kirdî, amd. Roşan Lezgîn, Nûbihar, Stenbol, 2013
- Xeznedar, Marûf: Mêjûy Edebî Kurdî, Aras, Erbil, 2010.
- Xunokî, Şêx Muşerref: Mewlûdu'n-Nebî, amd. M.Vefa Özcan û Hüseyin Yiğit, Sêrt, 2013.
- Weledê Hemze, Seyid Mela Evdirrehman: Mewlûda Fexrê Alemê, Mekteba Seyda, Diyarbakir, 2013.
- Yanmış , Mehmet: Diyarbakır'da Mevlid Geleneği ve Bazı İller ile Karşılaştırmalı Bir Analiz, Uludağ Üniversitesi İlahiyat Fakültesi Dergisi, h.1, r.116-117, Bursa, 2012
- Yûsuf, Avdilreqîb: Şairên Klasîk ên Kurd, wer. Elî Şêr, Weşanên Jîna Nû, Uppsala, 1988.
- Zeki Bey, Mehmed Emin: Meşahiri Kurd û Kurdistan, wer. M. Baban, M.Yağmur, S. Kutlay, Apec & Öz-ge yayınları, Spanga, 1998.
- Zeki Beg, Mehmed Emin: Tarîxa Kurd û Kurdîstan, wer. Ziya Avcı, Avesta, İstanbul, 2012
- Zêrevanî, Babê: "Mela Hisênê Bateyî-1", Nûbihar, j. 87, Zivîstan, İstanbul, 2002
-: "Mela Hisênê Bateyî-2", Nûbihar, j. 88, Bihar, İstanbul, 2002
- Zinar, Zeynelabidîn: Mewlûd, Fırat Yayınları, İstanbul, 1992

PÊVEK

FERHENG A MEWLÛDA MELAYÊ BATEYÎ

A

Afitab: roj, tav

Ahsem: bevila pehn û fireh.

Ala: al.

Al: sor

Ala: başî

Ala: yê ku dilewitîne

Alam: jan, derd û kul

An: va

Aşlab: pişt, piştan

Aşina: nas, dost

Awaz: deng, sewt

‘Adem: nebûn, tunebûn

‘Alîneseb: yê ku dol û dundeya wî berz

‘An: ji

B

Babê Şeybe: navê deriyekî “Mescidu’l-Ĥeram” ê ye.

Babet: wekhev, hemta

Barigah: cihê berz ku bi destûrê mirov karî bikevê.

Bedî‘: ecêb, ecibandî.

Beqer: Çêlek.

Bewl: mîz

Beyza: biriqandî, sipî

Bê‘eded: bêhejmar

Bênewa: bêçare

Berîn: bilinde

Berkê ‘eyş: îdara aboriyêyê ku aboriya malê li ser be.

Berze bûn: winda bûn
Beþha: navekî kevin yê Mekkehê.
Beþhaya Beþîr: navê newala Mekkehê
Bînt: keçik, qîz
Bîş: zêde
Bolûk: hîzb, beş û koma leşkeriyê
Bûsan: kemînan
Buþûn: zik, dunde
Buxûr: bixûr

C

Came: cil, kinc
Cebhe: alî
Cebîn: anî
Cebîneş: di cebha wî de, di aniya wî de.
Cedd: bapîr
Cemîl: xweşik, rind
Ceyb: dil, semt, berstûk
Ceyş: deng, artêş, tije
Cûd: merdî, comerdî.
Cuyibar: çem

Ç

Çakan: mezin
Çapik û çespan: bil ez û bez, ecele
Çetre: çadir, kon, sî, şev
Çunan: weha, wilo

D

Damen: daw, etek
Damî'e: şilbûna çavan
Dayîn: diya ku şîr dide
Dehen: dev

Dîde: çav
Dîger: yê din
Dilêr: biçêre
Dilêr: pehlîwan
Dilnewaz: ya ku dil mist dike, dilxweş dike, dilniwaz
Dim: rû, serçav
Dohtê çakanê: keçên mezinên Qureyşân û Ereban, keçên ku tesîrê dilan dikan
Duker: qelişandin
Duldul: navê qantira Hz Muhammed (saw) ku paşê bûye ya Hz Elî (as).
Dumre: birayê şîr yê Muhammed(saw)

E

Ebu'l-Qasim: navnasiyeke Muhammed (saw)
Enwer: pir binûr, zahf birohnî
Erbe'ûn: çil
Ergenûn: erxewan, xanimreng, cureyek çîçekên sor
Ermîşek: hevreşîm
Esqûf: dirêjî gir
Eswed: reş
Eşlab: dol. Yê ku ji dola mirov tîn.
Exbar: nûçe (Pirjimariya peyva “nûçe”yê)
Eyîsî: biriqî
Eywan: qesr, hêwan
Ez: Ji
‘Edawet: dijminatî
‘Ela: meznayî, şeref, li ser
‘Eqdê best: soza pevgirêdanê, mahr
‘Esel: hingiv
‘Eşa: gopal
‘Eta: bexş, qencî
‘Ewn: alîkar, alîkarî
‘Ewni'l-gerîbî: alîkarê xerîban
‘Ewret: deverên mirovan yê ku pêwiste bêne nuxumandin

F

Fem: dev

Ferwar: daxwaza alîkariyê, hewar

Fewc: kom

Fî'l-ħal: hemen, di cih de

Firdews: navê Cinnetekê

Fuzûn: zêde, pir

G

Ġai'b: ne xuyayî, windayî

Ġa'it: pîsiya mirovan, necaset

Ġemam: sî

Ġenem: pez

Geştî: keştî

Ġewţ: binav bûn, xerq bûn, noqîn

Ġeybiyan: yê nuxa nakin

Ġeza: xeze, şerê pîroz.

Ġufrân: efû kirin

Ġulam: xortê ku hê simbêlê wî nederketine, êsîr, bende

Ġulgûle: gurmîn, gumîn, guregur

Ġuşan: çukulik û şaxên daran

Ġuzzatan: yê ku çûne gazayê, yê ku çûne şer

H

Ĥasem: pozê pahn û fireh

Ĥaşelîllah: Xwedê neke, tu carî

Hateve: hate vê derê

Hatîf: tiştê ku li te vedigere, dengdan

Ĥatîm- Ĥatem: laqabê navdarekî Ereb ku pir merd e. Mohrkirî.

Hative: dîsa hat, çû û hat
Hemnişîn: yê ku bi hev re rûniştî
Hêr: vir
Heftîm: navê cihekî navbera meqama Îbrahîm (as) û Kabe
Hinarin: şandin, rê kirin
Hindî: hemû, gişt
Hîzar : dîwar an bena derdora bexçeyan.
Hubel: putê herî mezin yê li ser Kabeyê.
Huccac: pirhejmara heciyan
Hulle: Cilê ku ji du perçeyan pêk tê.

Î

Îbham: girtî û veşartî hiştin, ne eşkere kirin,
În: ew
Îna: êş û jan kişandin
În‘am: nîmet dayîn, kirina qencyê, xêr, bexş kirin
Înşeqqe‘l-qemer: heyva ku bû du şeq
Îrtîhal: koç, mirin
Îstebreq: cilê ji hev re şîmê qewîn çêdibe
Îxwan: bira

K

Kan: kahnî
Kasir: yê dişkîne, yê jê dike
Kat: şax
Kebîr: mezin
Keşîl: çav kil kirî
Kerrûbiyîn: milyaketên mezin, yê ku tenê bi îbadetê mijûl dibin.
Kewakib: stêrkan (kewkeb: stêrk)
Kewn û mekan: hebûn, kaînat

Kîjk e: kîjan e ?

Kîne-dûz: yê ku rik û kîna wî weke diriyan e.

Kodek: gedê, zarok

Koh: çiya

Kohê Bûqûbeys: çiyaye Bûqûbeys, li Mekke ye.

Kungir: qesr

Kusan: kesan

L

La texafû: ne tirse

Lağêr: zeîf

Lamekan: yê ku bêcih e, ne mihtacî derekê ye, Allah

Lat û 'Uza: beriya Pêxembertiya Hz Muhammed (saw), hin navên sanemên li Kabeyê.

Laîf: 1- yê ku qenciyan dike, Xwedê 2- nazik, xweşik

Layemût: yê ku namire, Allah

Layenâm: yê bêxew, Allah

Layezal: yê ku namire, wînda nabe, tişt pê nayê, Xwedê

Le'în: lanetbûyî

Le'leha: lêv, lêvan

Leng û lûk: kulek û qop

Lîqa: rû, hevdîtin

Lu'b: leystik, kêf

Luğet: peyv, bêje, ferheng, zimanê qewman

M

Ma zağê'l-başar: nerîna şaş nebû

Mader: dê, dayik

Mahitab: tava heyvê

Medhûn: çermê debax kirî, ceftkirî

Mefer: rev, bazdan

Megrib: rojava

Mehd: dergûş
Melîh: rind, baş, xweşik, sipehî
Men ente: tu kîyî ?
Menbe‘: kahnî
Merg: mirin
Meşriq: rojhilat
Mewc: pêl , damanî
Meymene: milê rastê, aliyê rastê
Mezar: gor
Mûbîn: aşkere, vekirî
Mubtela: bidert, bibela, nexweş
Muddeteş: xelasbûna wextê, dawiya demê
Mu‘eyyed : bidestek, parastî
Muhib: biheybet, sawdar, berz
Muqtedâ: yê ku mirov bi dû de diçe, yê ku mirov mînak distîne.
Mulhid: mirovê ku ji Heq vegeryaye, kafir
Mûlî: yê ku sond xwariye, yê dike ku gelekî bixwaze.
Mulûk: melikan, padîşahan
Muncelî: yê ku dibiriqîne, derketiye holê, xwiya dike.
Mun‘ekîs: berjêr kirî, sernîşiv kirî
Mûnqelîb: yê ku diqulipe, diguhere, dizîvire.
Munqesîm: tiştê ku bûye par, parvekirî
Muntezîr: yê ku mirov li hêviyê û li bende.
Mûqîn: bêşik, yê ku kathiyen zanî
Murđî‘e: ya ku şîr dide, dayika şîr
Murte‘îb: yê ku ditirse
Mustegâş: yê ku mirov jê alîkariyê dixwaze.
Muştemîl: yê ku hemû dipêçe, hemû dinixumîne
Muxalîf: dijber, yê ku cuda difikire, alîkar
Muxtefî: yê veşartî
Muxteşer: kin, bi kurtî
Muzallel: bidelil
Muznîb: gunehkar

N

Nagehan: ji nivkê ve

Na‘leyn: cotek nal, du nal

Nâm: nav

Nasix: yê ku kopî dike, nusxeya kitêbekê dinivîsîne.

Na‘zir: yê ku dinere

Nehed: danî (derekê)

Ne‘re’: qêrîn

Neşê m- neşê tin: nikarîn

Next: qelen

Nihal: dara biçûk

Nihan: nepenî, veşartî,

Nîm: nîv, parça

Nî‘me’l-emîn: çi emanetek xweş

Nîran: agir, dengê xirxirê

Nîsa: jin, pîrek

P

Pakîze: paqij

Pasiban: nobedar, notirwan

Paxil: ali, rex

Peder: bav

Pedîd: eşkere, xuya kirî, li ber çav

Penah: stare, destek.

Pêkve: tevayî, temamî

Perwerî: xwedî kirin

Pus: tuzak

Puser: kur, law, zarok

Pustan: pêsir, memik

Q

Qaht: xela

Qemer: heyv

Qendileb: lêv şekir

Qeşra Buşra: devereke li nik wilayeta Şamê

Qeswere: şêr, yê bihêz, yê ku bi temen ji mirov mezintir,

Qeygan: tije

Qurre: dilşad, biriqandina çavan

Qurş: gilover, daîre

R

Rabi': çaremîn

Rabîtin: rabin

Ram: yê ku itiat dike

Raşid: yê ku dinere

Reft: birê ajalan

Regem: demeke kurt

Rehzen: rêbir, eşqiya

Revde: kerî, ref

Revt: bazdan

Riştin: boyax kirin

Riçwan: milyaketê deriyê Cinnetê

Rîcal: mêr

Rohnik: hestirê çavan

Roz: roj

Rukbedar: yê li ber kaban

Rukn: bingeh, hêz, binyat an koşeya zexm ya tişteki

Rukûn: dilpêvebûn, meyl

Ruxsar: hunareki rû

S

Se‘adet : bextiyarî

Sabi‘ : heftemîn

Şabî: zarokê ku hê ji şîr nebûye.

Sabîq: ya berê

Sadis: şeşemîn

Şadr: 1-herî jor, herî baş 2- pêşî. 3- sing.

Şafwet: Saf û paqij.

Sakin: yên ku li derekê rudinên

Salar: serok

Salis: sêyem

Samin: heştemîn

Samîne: xort, qelew

Şan: kuçikan

Sanî: duyem

Saq: eslê tiştekî

Se‘d: pîroz, qidoş, bihêz

Sedya: memik

Şefa û Merwe: cihên Heccê

Sefak - sefik: bi şidda, yê ku xwînê dirijîne

Sehl: raxistin, paçik, perde

Sekran: serxweş, sermest

Sem‘im: guhê min

Sermedî: cawîdan

Sernigûn: ser ber, ji ber, ser nişûf

Sernuxûn: şermezar, fedîkar

Seyf: şûr

Sîwan: şemsiye.

Sû: hêl, alî

Şûf: hirî

Sundus: cilê ji hevreşîmê tenik çêdibe.

Surûr: bikêf, dilgeş, dilxweş

Ş

Şam: êvar

Şehd: hingiv

Şehriyar: padîşah, fermanîdar

Şehsuwar: yê ku li hespan xweş siwar tê

Şems: rok, tav

Şepal: xweşik, delal

Şermisar: şermezar, fedîkar

Şigerf: xweşik, delal.

Şîhab: çîrûsk

Şîr: şûr

Şu'le: çîrûsk

Şutur: dewe

T

Ta'accub: şaş mayîn

Tâbi' : yê ku bi dû yekî din de diçe, yê ku bi tişteki an kesekî ve girêdayî

Ta'et : berfermanî, bi ya kesekî kirin.

Tasi': nehemîn

Tatvil: dirêjkirin.

Tawîl: dirêj, dudirêj, qetara heywanan

Teham: serkeft, yê ku digihêje

Tehayyur: şaş mayîn, hayret kirin

Tehte'ş-şera: bin erdê

Têkil: dema berbangê

Tekye: piştgeh, cihê ku mirov pişt xwe didê yê.

Telbê: yê ku dixwaze

Temme'l-kelam: temambûn û xelasiya peyvê

Temr: xurme

Temşiyet: meşandin, kar meşandin, kar hêsan kirin.

Terehhum: dil rehîm, piyarî, dilovan

Teşîfî: tewand

Tewekkelna: me tewekkul kir, me xwe siparte Xwedê

Ṭewîl: zîvirandin

Ṭeyyîb: paqij, xweşik

Ṭîfl: zarok, gede

Ṭîybê ‘eyş: yê ku jiyana wî xweş e

Tîzi: zu, ecele

Tuhameê şerîf: Mekke

Turfetu’l-‘eynî: tiştên ku mirov bi çavan pê şaş dimîne

U

Ummu’l-Qura: Mekke

Uqtulû haze’l-gulame: vî bendeyî an vî xortî bikujin

Usqûf: alimê filleyan

‘Uşşaq: pirhejmara evîndaran

‘Uyûb: pirhejmara ‘eyban

W

Wajigûn: qulipî, ketî

Waşil: yê ku digihêje tişteki an yekî/yekî

Waşîq: yê ku ewle bûye, ji yekî bahwer dike

We’đ-đûha: despêka sûreya “Duha”, Xwedê li ser çaxê serê sibehê û nîvro sond dixwe.

Wedûd: yê ku hez dike tête hezkirin, Xwedê.

Wehdet: yekitî

Weheb: yê ku hîbe an bexş dike

We’l-leylî: despêka sûreya “Leyl”, Xwedê li ser şevê sond dixwe.

Weqiye: giraniya 400 dirhemî.

Weyhekê!: raweste, bisekine

Wuşta: Nav

Wuşûl: gihaştin

X

Xadem: xizmetkar

Xal: şanik, nuqte

Xalî: vala

Xamis: pêncemîn

Xecil: yê ku fedî kiriye, ji şermê soromoro bûyî.

Xemîr: hevîr

Xend: ken

Xene: Hine

Xer: ker

Xetmu'l-Murselîn: mohra resulan, pêxemberê dawî.

Xeyru'l-Enâm: xêrtirînê Nebiyan.

Xeyru'l-Wera: xêrtirînê muteqiyan, kesê ku xwe ji gunehan pir disitirîne. Muhammed
(saw)

Xeyru'n-Nasî: di nav mirovan de yê bi xêr, başê mirovan. Muhammed (saw)

Xîf û Mîna: navên du cihên li Mekkehê

Xinşer: tiliya biçûk, tiliya qelîç ya qereqûçkê

Xiraman: meşa binaz,

Xîşal: mişwar, tebîet

Xudûk: xemgîn, perîşan, kerixî

Xurrem: dilgeş, dilxweş, şad, dev bi ken

Xweşnewa: yê ku dengê wan xweş e, dengxweş

Y

Yed: dest

Yehûd: Cihû, Yahûdî

Yesar: aliyê çepê

Yexsîr: esîr, dîl

Yûmn: bihêz, bereket

Z

Zail: ya demborî, ya ku diqede

Zamîne: kefla jin

Zebîh : yê ku qurbanê şerjê dike, laqabê bavê Hz Îsmail û Hz Muhammed, heywanên ku tên jêkirin.

Zed: lêda

Zeheb: zêr

Zîba: bixeml, xweşik


Zîba xitab: xweşgo, xweşbêj, zarxweş

Zimzim: gurmîn, guregur

Zûd: zû



هدا کتاب مراد است
 بسم الله الرحمن الرحيم
 الحمد لله رب العالمین
 اے کریمہ مکتا خیر البشر
 اوستای مالک الملک عظیم
 دینی مہر کامل نعمت تمام
 اوستای بی نظیر و ذوالجلال
 رازقی بی دلت با و مار و مور
 کار سازی بند و سلطان خان
 اسما بی سنون و بی کریمید
 حقیق ازین ام زنه شاه کریم
 فی زمه سوز خطای تو نیستم
 یارب ایما بی و حوارین ام مدام
 در رحمت النبوی
 صلی الله علیه و سلم
 اے محمد صدق کلام
 اوستای دار و دایه مہ دینی صبر
 تابعی وی مقتدای نامور
 دایه مہ میراث قرآن کریم
 یعنی دامه احمد و دار السلام
 بی مثال بی مثال ری
 عالی سترانه لوی در سوز
 راجیم و رحمت لطیف صبر
 صورتی با خال خط و قریب
 اهدنا یا رب صراط المستقیم
 لی زنه احسان غفر الهم
 زبری الای محمد ص
 صلی الله علیه و سلم
 اوستای دار و دایه مہ دینی صبر
 تابعی وی مقتدای نامور
 دایه مہ میراث قرآن کریم
 یعنی دامه احمد و دار السلام
 بی مثال بی مثال ری
 عالی سترانه لوی در سوز
 راجیم و رحمت لطیف صبر
 صورتی با خال خط و قریب
 اهدنا یا رب صراط المستقیم
 لی زنه احسان غفر الهم
 زبری الای محمد ص
 صلی الله علیه و سلم



هَذَا مَوْلُودُ النَّبِيِّ صَلَّى اللَّهُ عَلَيْهِ وَسَلَّمَ بِلِسَانِ الْكَرْدِي
تُصَنِّفُ مَوْلَانَا مُحَمَّدًا بِأَيِّ رَحْمَةِ اللَّهِ عَلَيْهِ

بِسْمِ اللَّهِ الرَّحْمَنِ الرَّحِيمِ وَبِهِ تَقِيَّةٌ هـ

أَوْخْدَايَ دَايَمَهُ دِينِي مَبِينِ	حَمْدِي حَذُّ بُوخْدَايَ عَالَمِينَ
تَابِعِي وَيْ مُقْتَدَايَ نَاهُورِ	أَمْ كَرِيْمُهُ أَمَّا خَيْرُ الْبَشَرِ
دَايَمَهُ مَبِينِ أَتْ قَرَأْنَا كَرِيمِ	أَوْخْدَايَ مَالِكُ الْمَلِكِ عَظِيمِ
يَعْنِي دَايَمَهُ أَحْمَدُ وَدَارُ السَّلَامِ	دِينِ مَدَكِرْ كَامِلِ نِعْتِ نَامِ
يَمِينَالِي هَقَالِي زَوَاكِ	أَوْخْدَايَ بِي نَظَرِ ذَوُ الْجَلَالِ
عَالِي سِرَانِكُو بِي دَرْمَدُورِ	رَاغِبِي بِي دَسْتِ وَبَاوُفَارِ وَهَوَزِ
رَاغِبِي رَحْمَنِ لَطِيفِ مَهْرَبَانِ	كَارِسَارِي بِنْدَهُ وَسُلْطَانِ جَانِ
صُورَتِي بِأَخْلَاطِ خُطُوبِي أَفْرِيدِ	إِسْمَانِي بِي سِتُونِ وَيْ كَرِيدِ
أَهْدِي أَلَدِي مِرَاطِ الْمُسْتَقِيمِ	هَيْفِي دَارِي أَمْرَتَهُ شَاهِ كَرِيمِ
لِي دَرْتَهُ إِحْسَانِ غُفْرَانِ كَرِيمِ	فِي زِمَمِهِ سَوْجُ وَخَطَايِي دُرُوسْتِ

هذه كتاب مولانا
مشرف بن سید

حمد في حد بوخدي عاليه
ام كريمه امير خير البشر
او خدي عالي الملك عظيم
دينه كبريا مل بعت تمام
او خدي في نظيره ذو الجلال
او خدي في مقتدى ناسور
عاجح وى مقتدى ناسور
دينه ميراث تراانا كريم
يعق دمه احمد ذره لاسلام
في مثالي في صفاء رب قزل
مستطيرت وى
مخروصه لحيه طهر لانت
صورنا باخالو خط وى افرى
اهديا يارب صراط المستقيم
لوتيه احسان غفرنا كرم
في ثوبه سحره صفايتي ستم
صفي دنيي فزنته شاره كريم
الاوتى اعلاء و خورم اقم مقام
في الالهى محمد و سلم

او خدای بی نظیری ذوالجلال
را نرفی بیدست و پا و مار و مور
کار سازی بنده و سلطان جان
اسمائی بی ستون وی کردید
هیچ دارین امر ز ته شاهی حکیم
بی مثال و بی همتا و بی زوال
عالمی سرانگونی در صدور
راحم و رحمن لطیف مهربان
صورتی با خال و خط وی آفرید
اهدایار بصراط المستقیم

بسم الله الرحمن الرحيم

حمد بی حد بو خدای عالین او خدای دایم دین مبین
 ام کریمه امنا خیر البشر نابی وی مقتصدای نامور
 او خدای مالک الملك العظیم دایم مبراث و قرآنا، کریم
 دین مه کر کامل ونعمه تمام یعنی دامه احمد و دار السلام
 او خدای بی نظیر و ذو الجلال بی مثال و بی هفال و بی زوال
 رازقی بی دست و یاؤمار و مور علمی سرآ نه کوئی در صدور
 کار سازی بنده و سلطان جان راحم و رحمن لطیف و مهربان
 آسمانی بی ستمون وی کر بید صورتی باخال و خطوی آفرید
 هیق دارین ام ژنه شاهی کریم اهدنا یا رب صراط المستقیم
 فی ژمه سوچ و خطا، تین، ستم لی ژنه احسان و غفران و کرم
 یارب ایمانی دخوا زین (ام) مدام زیر آلاهی محمد و السلام

صوا علیه و سلموا تسلیما

حتى تسالوا الجنة، نعمها

شربى الاى محمد والسلاام

بوق شوقك هون بون القلم

اى محمد صد هزالك اقترين

ديده ويناهيا فى امتى

بولنه كالك پناه پشته بون

تاهين طيرنوخون بون بجر

هر عالم قالك روح رول

كوشيقن زهرم كن مقام

ماستپو الشقى سيع على

مصطفى باوفاى بافترج

كيت وي كرت خدا دك طابا

يارب ايمان خور ايتن امم

كودق هون پشته رجاء

برون بادا هر زمان انجين

اوشيق داروى هر علقى

كسته كود مشتقات هون

صل يارب على خير البشر

اوجيب هينا هفت اسماء

خالكباى احد اويت الحرام

صل يارب على خير الورى

فخر ابراهيم عليم اصيل نوح

ما دمت اذ دمت كود شدة

بسم الله الرحمن الرحيم

اوخداي دايمة ديتي بدين

تابع وي مقتداي نامور

دايه مبراشقا ناكورم

يعنى دامه احد دار السلاام

چيه ناله هفتا لاله نوال

علي بتر نكوت درصده

راجم رحى لطيف مهران

صورتى باخال خطوى اقرب

اهد نايادب طوط المستقيم

لي شرتة احسانا غفران كرم

يادب



خدي محمد بوخداي عالمين

ام كرينه امتا خير البشر

اوخداي مالاك ملاك عظيم

ديغمه كوكا مل بخت تمام

اوخداي نفلوا الجلال

داريقه دكشت يا ومارحود

كارسا زنده سلطان جان

اسمان جي ستون وي كويد

هيجي دايين ام نرتة شفاي كرم

خي شمسوچ خطايتن ستم

صورت باخال وخط وی آفرید	استان بی شتون وی کردید
اهدانا یارب صراط المستقیم	همی دارین امر ته شاه گوید
بی رته احسان و غفلان و کرم	بی رته سوچ و خطا بین و ستم
بزر آلا یا محمد و السلام	یارب ایمان و حوزین آمد نام
 گود فین هون رنارین نجاه بعشق و شوقان هون بهین آسکوه 	
آنی محمد صد مثل زان آفرین	نرتو یادا هر زمان و آن و چین
دیده و بیناها بی استی	آنی شفیع داروی هر علی
بو کهنکاران پناه و پشت و عون	دسته گیر و مستغاث هر و دگون
تاهین طبر و یخو بن برنج	صلی یارب علی خیر البشر
هر دو عالمه قالب آفر و روح و روان	آو حبیب رهنا هفت آستان
لوتشیرین زمزم و در کن و مقام	خارجای احمد آو بیت الحرام
ماتسیر الشمس فی السبع العلی	صلی یارب علی خیر الوری
مضطفا ی باوقای بافتوح	نحر ازاهیه و اتمانعه و نوح

هوذا بی محمد و السلام

بسم الله الرحمن الرحیم

حمد بی حد بوخدا ی عالمین
آفر کریمه امت خیر البشر
آوخدا ی مالک ملک عظیم
دین منه کر کامل و نعمت ثمار
آوخدا ی بی نظیر و ذوالجلال
ذائق بی دست و پا و ما رومور
کار ساز بنده و مسلط جهان

آوخدا ی دایه منه دین مبین
تابع وی معصدا ی نامور
دایه منه مبرانا قرآن کریم
یعنی دایه احمد و ذوالسلاطه
بی مثال و بی هثال و بی روال
غالب سرائه گوئی در صند و
ذاجر و رحمن لطیف و مهربان

مولای سعادت حضرت پیر

بِسْمِ اللَّهِ الرَّحْمَنِ الرَّحِيمِ

محمد بی حد بو خدای عالمین
 آم کر پنه اتنا خیر البشر
 او خدای مالک ملک العظیم
 دین مه کر کامل و نعمت قدام
 او خدای بی نظیر و ذوالجلال
 رازق بی دست و پادشاه و موز
 کارساز بنده و سلطان جان

او خدای دایه مه دین مبین
 تابع وی مقتدای نامور
 دایه مه میراث قرنا کریم
 یعنی دایه اخلاص دارالاستاد
 بی مثال و بی مثال و بی زوال
 عالم سزانه گوئی در صدور
 راجح و رخن لطیف و مهربان

اسمان بی شون وی کریدند
 همیشی دارن آم رفته شاد کریم
 فی رفته سوخ و خطایان و ستم
 یارب ایمان دوزن آم مذام

گرد فیتن هون زنار بن نجاة
 بعشق و شوقان هون پیرین الصلوة

بزنو نادا هر زمان و آن و چین
 انی شفیع دارونی هر علی
 دسته کبر و مستغاث هر دوگون
 صل یارب علی خیر البشر
 او جیب رهینا هفت آسمان
 خاکبای کهد او بیت الحرام
 صل یارب علی خیر الوری
 غر ابراهیم و اسماعیل و قوح

ای محمد صد هزاران افرین
 دیده و پناهیا فی امتی
 بو گنه کاران پناه و پیت و عون
 تاهین طبرو بخوبین بر شجر
 هر دو طالع قالب او روح و روان
 کوشین زنده و رکن و مقام
 ماقبیر الشمس فی السبع الملی
 مضططای باوقای بافتوح

صورت باخا و سخط و ی آفرید اهدنا یا رب صراط المستقیم لی زنه احسان و عفران و کرم بریر آلا یا محمد و التسلام	ایمان بی ستون وی کر بدید هفتی دارین امر زنه شاه کر فید فی زنه سوخ و سخطین و سیم یا رب ایمان و سخاوتین امر مدام
کر د قبتین هون زنه زین نجاة یسوق و سوقل هون بپیرین الصلوة	کر د قبتین هون زنه زین نجاة یسوق و سوقل هون بپیرین الصلوة
ای محمد صد هزاران آفرین دنده و بینا هیا فی اعنی نوگه کاران پناه و لیست و عون تاهن طبر و بخورین بر بیکر هر دو عالم قالد آور و و روان او تر یقین زمره و و سکن و مقام فائزیم الشمس فی السبع الملی مصطفای باوقای بافوق	بر تو با زهر زمان و آن و حین ای شفیع داروی هر عیالی دسه گیر و مستغنا هر دو کون صل یا رب علی خیر البشر او جیب رهنا هفت ایمان خاکی ای احمد او بیت المرام صل یا رب علی خیر النوری خیر از ایهیم و اتباعیل و بوح

مولد نبی الرحمة والا سلا بسم الله الرحمن الرحیم	حمد بی حد بو خدای عالمین امر کریمه احنا خیر البشر او خدای مالک مملکت عظیم دین مکه کره کامل و بخت تمام او خدای بی نظیر و دجلال زاری بی دست و پا و ما و مور کار سازنده و سلطان جهان
او خدای دایه مکه دین مبین تابع وی مقتدای نا موز دایه مکه هیزانا قران کریم یغنی دایه احمد و دار السلام بی مثال وی هفتال وی زوال عالم سیرانه کوئی در صندور راجح و رخص لطیف و مهتریان	او خدای دایه مکه دین مبین تابع وی مقتدای نا موز دایه مکه هیزانا قران کریم یغنی دایه احمد و دار السلام بی مثال وی هفتال وی زوال عالم سیرانه کوئی در صندور راجح و رخص لطیف و مهتریان

هوذا النبي صلى الله عليه وسلم

بسم الله الرحمن الرحيم

خداي غايب
امر كريمة امير خير البشر
اوخداي مالك ملك عظيم
دين من كن كامل ونعمت تمام
اوخداي بي نظير و ذوالجلال
زارق بي دست و پا و ما و مور
كار ساز بنه و سلطان جان

اوخداي دايه مه دين مبين
تايع وي مقتدي ناموز
دايه مه ميراثا قرآن كريم
يعني دايه احمد و ارا السلام
بي مثال و بي هفال و بي زوال
عاله سرائه گوئي در صدد
زاجر و رحمن لطيف و مهربان

ایمان بی شئون و بی کرد بدید
هیچ داین امر زنه شاه کریم
بی رفته سوج و خطابت و سیم
یارب ایمان و خوارین آمدن

گر فیتن هون و زنا بر نجات
بیش و شوق هون بیزن الصلوة

صورت باخال و خط و بی آفرید
اهدنا یا رب صراط المستقیم
بی رفته احسان و غفران و کرم
زیر آلا یا محمد و السلام



تو یا دا هر زمان و آن و حین
ای شفیع دار و بی هر علی
دسته گیر و مستغاث هر دو کون
صل یا رب علی خیر البشر
اوحیب رهینا هفت آسمان
خاکبای احمد او بیت المرام
میل یارب علی خیر الوری
خیر انراهم و انما عیل و نوح

ای محمد صد هزلان آفرین
دیده و بیناها بی امتی
بوگه کاران پناه و پشت و عون
تا هین طبر و بخورین بر تن
هر دو عالمه قالب آروغ و روان
لوشین زمر و و کن و مقام
ماتیر الشمس فی السبع العلی
مضطفا ی باوقای بافوح

مَوْلَاكَ سَيِّدِي
صَلَّى اللَّهُ عَلَيْهِ وَسَلَّمَ

مَوْلَفُهُ

خَوَاجَه حَسَنُ الْأَرَطُوشِي

رَحِمَهُ اللَّهُ وَجَزَاهُ خَيْرًا كَثِيرًا

وَإِذَا قُنَا مِنْ حُبِّهِ وَعَشِقَهُ إِمَامُ

هه‌سولودانیی مەلای الله تعالی علیه وسلم

بسم الله الرحمن الرحیم

حمد بچە مەلای مەلای عەلای عەلای
او مەلای دایە دینی مەلای

امروزیه امتا خیر البشر
نابیی وی مەلای مەلای

او مەلای مەلای مەلای عەلای
دایە مەلای مەلای مەلای

[illegible]

T. C.

Mardin Artuklu Üniversitesi

Türkiye’de Yaşayan Diller Enstitüsü

Kürt Dili ve Edebiyatı Anabilim Dalı

Yüksek Lisans Tezi

MOLLA HÜSEYİN BATEYÎ’NİN MEVLİDİ

(Metin ve İnceleme)

ZİVER İLHAN

10711010

Tez Danışmanı

DOÇ DR. ABDURRAHMAN ADAK

Mardin 2013

T. C.

Mardin Artuklu Üniversitesi

Türkiye’de Yaşayan Diller Enstitüsü

Kürt Dili ve Edebiyatı Anabilim Dalı

Yüksek Lisans Tezi

MOLLA HÜSEYİN BATEYÎ’NİN MEVLİDİ

(Metin ve İnceleme)

ZİVER İLHAN

10711010

Tez Danışmanı

DOÇ DR. ABDURRAHMAN ADAK

Mardin 2013